NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN - HEJMAR 1 BUHARA 2021



- BINPÊKIRINÊN DEWLETA TIRK LI EFRÎNÊ
- DÎROKA TEVGERA SIYASî YA KURD LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ
- WATEYÊN PERGALA EWLEHIYA NIŞTIMANÎ LI BAKUR Û ROJHILATÊ SURIYÊ
- KOÇBERÎ

KOVAREK DEMSALÎ JI NAENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATÊJÎK VE TÊ DERXISTIN HEJMAR -1 BUHARA 2021

Sernivîser: **Ednan Mistefa**

Edîtorê nivîserê: **Taha Xelîl**

Desteya nivîser:

**Muhammed Kemal - Hejar Şakir - Rakan Şêxî**

Sêwiran: **Azad Mihemed - Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastiye**

**Hejmar 1 Buhar-2021**

## NAVEROK


**Binpêkirinên dewleta Tirk li Efrînê ............................................................. 6**

**Dîroka Tevgera Siyasî Ya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê .................................. 35**

**ÊLÊN DÊREZORÊ ............................................................................... 63**

**Koçberî ............................................................................................. 78**

**Wateyên Pergala Ewlekariya Niştimanî Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ................ 113**

## Gotina hejmarê

**Xwendevanên me yên hêja:**

Em weşana duyan ya kovara " **Lêkolînên Stratejîk**" ya jimara(1)`ê pêşkêşî we dikin.

Jixw mijarên vê jimarê berdewamkirina mijarê jimara berê ne.

Beşa duyan ya nivîsara bi navê "**Binpêkirinên Dewleta Tirk li Efrênê**", van mijaran radixe ber çav: Tobarankirina saziyên xizmetguzariyê weke nexweşxanan, firne, hawarhatinê, kerwanên alîkariyê, ..., her wiha armancgirtina şûnwar û dibistanan.

Lêkolîna " **Dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Sûriya**", rewşa tevgera siyasî bi damezrandina partiyên nû, yekkirina hin partiyan û perçekirina partiyên kevin ta salên 2010`an de, şeirove dike.

Sedem, karîger û encama koçberiya Kurdî; bi taybet koçberiya jin û ciwanên kurd û pêşniyarên ji bo girêdana ciwanan bi xaka welêt ve, ev tev de di beşa duyan ya lêkolîna "**Koçberî**" ya di vê jimarê de derbas dibin.

Weke berdewamkirina lêkolîna bi navê "**Êlên Dêrazorê**", ev beş li ser êlên Dêrazorê û şaxên wan radiweste, her wiha taybetmendiyên wan yên weke ol, bawerî û ayînê olî diyar dike.

Di lêkolîna " **Ewlekarîya Niştimanî** " ya vê beşê, jêderên ku ewlekariya niştimanî tevlihev dikin şirove dike, her wiha rehendên ewlekariya niştimanî weke aborî, civakî, tenduristî û berevanî, diyar dike.

**Sernivîser**

## Binpêkirinên dewleta Tirk li Efrînê

(Beşê 2/ dawî)

**Topbarakirina dezgehên xizmetguzariyê û karwanên alîkariyan da ku sivîlan û berxwedanvanan bitirsînin:**

Dewleta Tirk ji bo ku sivîlan birçî bike û wan bitirsîne, siyaseta dorpêçkirin û hileweşandina plankirî ji dibistan, istgehên av û kehrebê, firin, nexweşxane, embarên xwerin û demanan, istgehên ardû, karwanên alîkariyan û karwanên penaberan, pêk anî. Yanê siyaseta " serîtewandin an jî birçîbûn"ê bi kar anî. Ev siyaset bû sedem ji kêmbûna dijwar ya xwarin û dermanan re. NRLS`ê- beşê Efrînê hin firnên ku hatine topbarankirin û êdî nema dikarin kar bikin, belge kirin. hin ji wan firnan ev in: firna Raco ku yek ji firnên sereke bû li Raco. Ev firin ji ber topbarankirinê bi giştî şewitî. Di encamê de bi hezaran sifîlên gundên derdora Raco bê nan man. Ev ji bilî ziyanên mezin ên gihaştin firinê. Ev ziyan bi qasî 50000 dolarî bû yanê 24 000 000 lîreya Sûrî, ji ber teqîna qazanên sûtemenî yên ku motorên firinê pêdixin, ev ji bilî hilweşîna avahiyê bi awayekî nêzgiştî. Ji firnên ku hatin topbarankirin, Firna navçeya Cindêrês. Ev firin bi giştî hat hilweşandin. Ev firin ji firnên sereke bû yên ku Cindêrês û gundên derdorê bi nan dikirin. Firna gundê Şêxorizê yê girêdayî navçeya Bilbilê, ku ziyanên dijwar bi qasî 50000 dolarî, lê hatin kirin. Avahî jî bi giştî hilweşiya. Her wiha Firna gundê Celemê yê girêdayî navçeya Cindêrês. Ev firin bi giştî hilweşiya û ziyanên lê hatin kirin bi qasî 20000 dolarî bûn. Ji firnên ku ziyanên mezin lê htin kirin, firna girêdayî navenda navçeya Bilbile. Avahiya firnê rastî gelek ziyanan hat û nîvê alavên wê hilweşiyan. Firna gundê kotana jî ziyanên wê di avahiya wê de bûn. her wiha ji firnên ji ber sedema topbarankirina tund a Tirkiyê, nema kar kirin, ev firin in: Meydan Ekbes, Meydana Firina Şêx Mihemed, Qestel, Kotana, Dêr Sewan, Gorika, Firna Welîd li navçeya Cendêrês, Senarê û Qota) her wiha firnên li gundê Badîna ji ber tundiya şer û rewşa aloz, rawestiyan. Berpirsiyarê firnan li dezgeha temwînê ya girêdayî Rêveberiya Xweser li Efrînê " birêz Bengîn" di axaftina xwe de, bal kişand ser rewşa firnan a niha. Da xuyakirin ku ev bi hemû hêza xwe hewl

didin da ku nan bi awayekî asayî peyda bikin bêyî ku nirxê wî buha bibe yan jî heyberên ji bo çêkirina wî qut bibin.

Hejmara 25 ji xala B ji xala 2 ji benda 8`an a Sîstema Roma ya Bingehîn, wisa dibêje: " birçîkirina sivîlan weke rêbazekî ji rêbazên şer, di rêya qutkirina heyberên ku bê wan jiyan nabe (di van de derxistina astengiyan li pêşiya gihaştina alîkarian li gorî hevpeymana Cinêfê)" yek ji kiryarên ku zagona navnetewî weke tewaneke şer lê dinêre û li serê siza dike.

NRLS`ê- Beşê Efrînê dokumanterek li ser dibistanên ku ji hêla Tirkiyê û grûpên terorîst ên girêdayî wê ve hatine topbarankirin, amade kiriye. Hin ji van dibistanan di dema dewamkirina xwendekaran de, hatin topbarankirin, lewma hin xwendekar birîndar bûn. Hin dibistan bi giştî; hin jî beşek ji wan hilweşiya. Bi vî awayê li jêr hatine belgekirin:

| **Hejmara giştî ya dibistanên Efrînê û derdora wê** | **Hejmara dibistanên hatine topbarankirin** | **Dibistanên hatine belgekirin** | **Hejmara xwendekarên şehîd ketin** | **Hejmara nêzîk ya xwendekarên jixwendiê dûrketine** |
|---|---|---|---|---|
| **318** | **32** | **29** | **13** | **50000** |

Dibistanên ku ji hêla Tirkiyê û grûpên terorîst yên girêdayî wê ve ji 20.01.2018 ta 12.02. 2018`an, hatine topbarankirin, ev in:

| **Navçe** | **Navê gund** | **Navê dibistana hatiye topbarankirin** | **Asta xwendinê** | **Rêjiya ziyanan** |
|---|---|---|---|---|
| Raco | Raco | Ş. Demhat | Navîbn û amadeyî | |
| Raco | Raco | Ş.Hac Mûsa | Seretayî | negiştî |
| Raco | Raco | Ş.Rojhilat | Seretayî | negiştî |
| Raco | Şadiya | Ş. Dijla | Seretayî | negiştî |
| Raco | Qeda | Ş. Ristem | Seretayî | negiştî |
| Raco | Elbêska | Ş. Avêsta | Seretayî | giştî |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Raco | Edma | Ş. Ferîd | Seretayî | negiştî |
| Şera | Şeltaj | Ş. Rêdûr | Seretayî | negiştî |
| Şera | Êkî dam | Ş. Ehmed Efrîn | Seretayî | negiştî |
| Şera | Qestel Cido | Ş. Bahoz | Seretayî | negiştî |
| Şera | Bavîn | Ş. Siyamend | Seretayî | negiştî |
| Şera | Meydankê | Ş. | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Beybake | Ş. Sefqan | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Qerne | Ş. Xoşnav | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Zeire | Ş. Merxaz | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Şêxore | Ş. Evîndar | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Elî Kare | Ş. Botan | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Qestel xedriy | Ş. Eviyan | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Ebêdan | Ş. Cuma | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Kirdo | Ş. Kubar | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Şerqiya | Ş. Jînda | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Cariya | Ş. Rêzan | Seretayî | negiştî |
| Bilbil | Bilbil | Ş. Yûsif | Seretayî | negiştî |
| Cendêris | Eşkan xerbî | Ş. | Seretayî | negiştî |
| Cendêris | Celma | Ş. | Seretayî | giştî |
| Cendêris | Navenda Bajêr | Ş. Ronahî | Navîn û amedayî | giştî |
| Cendêris | Excele | Ş. | Seretayî | giştî |
| Şeye | Ceqla westanî | Ş. Gulnaz | Navîn û Seretayî | negiştî |
| Raco | Navenda bajarê Raco | Dibistaneke girêdayî UN e | Ev dibistan navendek ji belavkirina pêdiviyên dubistanan re bû. | negiştî |

Her wiha Rêxistina Mafê Mirovan li Cezîrê1 hilweşîna 45 dibistanan belge kir. Di encamê de 318 dibistan, peymangeh û zanîngeh, hatin girtin. Lewna nêzî 50 hezar zarokî bê xwendin man. Berî niha me qala topbarankirina istgehên avê û ji bilî wan kiribû...

**Topbarankirina erebeyên hewarhatinê, cihên şûnwarî û perestgehan:**

Rêxistina Mafê Mirovan li Cezîrê2 topbarankirina nexweşxaneya Efrînê, sê navendên tendirustî û hejmarek endamên tendirustiyê di Heyva Sor a Kurdî û Xeça sor de ji hêla Tirkan ve, belge kir. Her wiha erebeya Heyva Sor a Kurdî, erebeya Rêxistina Rojava ya hewarhatinê, karwana Xaça Sor û erebeya hin rojnemevanan ku sê ji wan birîndar kirin, hatin topbarankirin.

Hejmara sêyem ji xala B ji xala 2 ji benda 8`an a sîstema Roma ya bingehîn wisa dibêje: " bi qestî êrîşa li dijî karmend, avahî, heyber, yekîne û siwareyên di karekî ji karên alîkariyên mirovahî yan jî parastina aşitiyê de li gorî peymana Neteweyên Yekbûyî kar dikin, hêjane ku li gorî zagona navnetewî ya rikberiyên çekdarî, weke sivîl û cihên sivîlî werin parastin: Hejmara 9 dibêje: " ji qestî ve topbarankirin an jî êrîşkirina li ser avahiyên ol, perwerde, huner, zanyarî, alîkarî, şûnwarên dîrokî, nexweşxane û cihên ku nexweş û birîndar lê kom dibin, bi merca ku ev cih ne leşkerî bin" Her wiha Hejmara 24 wiha dibêje: " ji qestî ve êrîş û topbarankirina avahî, heyber, yekîniyên tendirustiyê, erebe û mirovên ku dirûşimine taybet û naskirî di peymanên Cinêf de li gorî zagona navnetewî, bikar tînin." Binpêkirinine metirsîdar in ji zagon û kevneşopiyên ku di rikberiyên çekdar yên navnetewî de li ser wan hatiye lihevkirin. Her wiha benda 21 ji peymana Cinêf a çarem sala 1949an wisa dibêje: " divê rêzgirtin û parastin ji van prosesan re hebe: guhestina nexweş, sivîl, kal û jinan, dema ku bi siware, tirên an jî keşteyan bo nexweşxaneyan werin guhestin (eger ew nexweşxane li gorî mercên di benda 18 an de hatine diyarkirin, bin û Bi dirûşma ku di benda 38an de ji peymana Cinêfê 12 ê Gulana 1949, hatibin cudakirin da ku rewşa birîndar û nexweşên hêzên çekdar di şer de, baştir bibe)

[1] rapora serlêdana Rêxistina Mafê Mirovan ji kantona Efrînê re: http://www.kmmrojava.com/2018/03/03

[2] Heman jêder.

Cihên şûnwarî jî ji topbarankirina Tirkiyê rizgar nebû. Hêvî Mistefa hevseroka Rêveberiya Xweser li Efrînê ji alavên ragihandinê re diyar kir ku cihê Til Îndar ê şûnwarî ku dîroka wî vedigere 500 BZ hat hilweşandin. Ev cih di rêxistina UNESCO de weke cihekî şûnwarî bi nav bûye. Di dîroka 26.01. 2018`an de NRLS`ê- beşê Efrînê topbarankirina balafirên Tirkiyê ji cihê Til Îndar ê şûnwarî re ku vedgere serdema Niyolotîk, belge kir; tevî ku ev cih dûrî deverên şer e û tu hêzên leşkerî li wir nîn bûn. Nêzî %40 ji vî girê şûnwarî ziyan gihaştinê û peykerên şûmwarî û kevirên bingeha wê ta 100 m firiyan. Ji cihên şûnwarî yên ku hatin topbarankirin: Qubeya Nebî Hûrî li bakurê bajarê Efrînê, cihên şûnwarî yên nêzî gundê Îska, Girê Raco yê şûnwarî, Girê cendîris yê başûrê navçeya Cendîris û girê Dêr Belût başûrî bajarê Efrînê li gundê Dêr Belût. Ev tev jî belge ne kevirîne û parastina dîroka Kurdî li herêmê dikin.

Riwangeha Sûriyê ya Mafê Mirovan3 tekez kir ku kilîsa Raî li Efrînê ji hêla sîxurên Tirkiyê ve hat dizîn. Di navbera grûpa sultan Murad û artêşa Şerqiyê de şer li ser kilîsê û parvekirina tiştên tê de, çêbû. Her wiha navenda Kasolîkî4 ya li Libnanê ya girêdayî komîteya Esqefiya, ji ragihandinê ya girêdayî encumana beteriyark û esqîfên li Libinanê re, tekez kir ku gora Mar Man û kilîsa Cûlyanos a ku gor tê de ye, hatin topbarankirin. Ev kilîse kevintirîn kilîseye li cîhanê, di sedsala çaran berî zayînê, hatiye avakirin. Berî wê jî cihê şûnwarî Berad başûrê Efrînê, hat topbarankirin. Ev cih di UNESCO ji 2011 weke cihekî şûnwarî hatiye tomarkirin. UNESCO tekez dike ku " hêzên Tirkiyê di dema êrîşa wê di ser Efrînê de, cihên şûnwarî jî li Efrînê hilweşandin. Ji wan perestgeha Eyn dare û cihê Nebî Hûrî (Qoriş) û girê Cendîris ê şûnwarî..."

Her wiha Êzîdî jî rastî êrîşên Tirkiyê û grûpên terorîst hatin. Berî niha di 2013an de, gundên êzîdiyan li Serê Kaniyê li herêma Cezîrê ji hêla terorîstên ku Tirkiyê alîkariya wan dike ve (Cebhet Elnusre û milîsên Artêşa Azad ên paşverû) rastî şewitandin û diziyê hatin. Wan grûpan bi behaneya ku Êzîdî gawir in, êrîşî gundên Êzîdiyan li van deveran jî kir: Qestel,

---

[3] şerekî tund di navera girûpên girêdayî Enqere. http://www.syriahr.com/2018/05/31

[4] Balafirên Tirkiyê gora Mar Maron başûrî Efrînê hilweşand. http://webcache.googleusercontent.com/

[4] şerekî tund di navera girûpên girêdayî Enqere. http://www.syriahr.com/2018/05/31

Elaqîna û Baflûna li Efrînê. Lewma piraniya êzîdiyan neçar man ku penaber û koçber bibin. Her wiha hemû xanî û dikanên êzîdiyan ji hêla van grûpan ve hatin dizîn û hilweşandin. Hişmendiya jenosîd a ku der heqê Êzîdiyan li Şengalê pêk hat, ev hişmendî li Efrînê jî hazir bû.

**Îşkencekirina dîlan, destrêjiya li terman, wênegirtina dîlan di rewşine ne baş de û kuştinên meydanî:**

Li ser peywendiyên civakî û youtubê hin vîdeyoyên ku kiryarên ne sincî û hovane yên ku grûpên çekdar yên girêdayî Tirkiyê, pê rabûne, belav bûn. Hin ji wan destdirêjiyên wan li termê endameke berxwedanê bi navê Barîn Kobanê, diyar dikin. Her wiha destdrêjiya li termê yekê ji endamê QSDê, hatiye belgekirin[5]. Ev yek di daxuyaniyeke şermezarkirinê ji hêla QSD`ê ve hat tekezkirin. Her wiha Rêxistina Mafê Mirovan li Cezîrê[6] kiryarên weke van kiryarên derbasbûyî belge kirin û di raporeke xwe de wisa dibêje:**"... destdirêjiya li rûmeta mirovan û kiryarên qirêj der heqê dîlan de. Du rewşên destdirêjiyê li termê du dîlên çekdar, kuştina dîlekî sivîl û destdirêjiya li yekî din, hat belgekirin. Ev jî li gorî benda heştemîn – xala duyemîn di Sîstema Roma Ya Bingehîn a Dadgeha Tewnên Navnetewî, tewaneke şer e û divê li serê were sizakirin..."** Her wiha hin dîmenên din jî hebûn di wan de îşkence û kiryarên qirêj der heqê sivîl û çekdaran de, diyar dibin û hin dîmen hene sivîlan bi zora çekan neçar dikin da ku pêşwaziya hêzên dagirker bikin. Ev ji bilî kuştinên meydanî û kiryarên din ên dighêjin asta tewanên şer.

Hejmara 6 ji xala B ji xala 2 ji benda 8`a Sîstema Roma Ya Bingehîn wisa dibêje: **" kuştin an jî birîndarkirina çekdarekî ku xwe bi riza xwe radest kiribe (çekê xwe avêtibe yan jî tu alaveke berevaniyê li ba nemabe) "** hejmara 21 jî wisa dibêje: **"destdirêjiya li rûmeta mirov bi taybet kiryarên qirêj û kiryarên ku rûmetê binpê dikin"** kiryarin metirsîdar in der heqê zagon û kevneşopiyên ku di rikberiyên navnetewî yên çekdar de, li ser wan hatiye lihevkirin. A ku vê yekê bêhtir tekez dike xala C di heman bendê de ye: **"Eger rikberiyeke çekdarî ne navnetewî çêbû, destdirêjiya**

---

[5] rapotra Komîteya Mafparêz derbarê kiryar û destdirêjiyên di heqê sivîlan de di operesyona Tirkiyê di ser Efrîn û Şehbayê de. http://www.kmmrojava.com/2018/02/08

[6] Rapra serlêdana Rêxistina Mafê Mirovan li Cezîrê bo Efrînê. http://www.kmmrojava.com/2018/03/03

**zor ji benda 3 ya di her çar peymanên Cinêfê de ye ku ev peyman di 12ê Gulana 1949an de tomar bûye. Ew jî dibêje ku çi kiryarek li dijî kesên ku bi awayekî rasterast tevlî şer nebûne di nav de hêzên çekdar yên ku çekên xwe avêtine û yên ku ji ber nexweşiyê, birîndarbûnê û girtinê... nema dikarin şer bikin. Her wiha**

**Bikaranîna tundiyê li dijî jiyan û kesan, bi taybet kuştin bi hemû rengên xwe, destdirêjiya li ser laş, kiryarên qirêj û îkencekirin.**

**Binpêkirina rûmeta mirovan, bi taybet kiryarên qirêj yên ku rûmetê binpê dikin.**

**Dîlgirtin.**

**Derxistina biryaran û kuştina bê biryareke fermî ji dadgehine ku bi awayekî fermî hatibin sazkirin û hemû misogeriyên dadwerî yan ku dest ji wan nayê berdan, sipartibine xwe"**

**Bikaranîna hêza leşkerî bi awayekî zêde di riya balafir, top û rokêtan... li dijî hêzeke ne hevseng:**

Li vir bandora siyaseta Mîkyavîlî di Erdogan de bikaranîna wî ji hêzê re li dijî niştecihên Efrînê, diyar dibe. Mîkyavîlî du rêbazan pêşniyar dike ji bo ku tu xwe ji kesekî xelas bike; yan xwepêçêkirin û qencîpêkirin ya kuştina wî kesî. Tekez dike ku tiştek di mirov de heye alîkariyê bi mirov re dike da ku vî rêbazî pêk bîne; di beşa sêyem de ji pirtûka wî Mîr, dibêje: **"...ew e ku her tim dixwazin tola xwe ji dijminên xwe ji ber ziyanên pûç û vala, hilînin. Lê nikarin tola xwe ji kesên ku ziyanên mezin gihandine wan hilînin. Lewma rêbazê herî baş da ku tu ziyanê bighînî kesekî ew e ku hemû qehra xwe di serê wî de derxe bi awayekî ku êdî nikaribe tola xwe hilîne..."**

Di heftiya pêşîn ji êrîşa bi ser Efrînê de, Rêveberiya Giştî ya QSD`ê daxuyaniyek ji rayagiştî re derxist, tê de encamên heftiya yekem ji êrîşê hatin diyarkirin: Hejmara topên li ser herêmê hatin barandin 699 top bû, êrîşên hewayî 191 êrîş bû û êrîşek bi hilîkopterê bû, balafirên çavdêriyê 24 saetan bênavber digeriyan, 136 pevçûnên rasterast çêbûn. Baweriya zêde ya li cem dijmin, gelek ziyan gihandinê, ta hejmara kuştiyan gihaşt 308 leşkerî, di nav wan de 4 serleşker jî hebûn û serleşkerî alaya Semerqend bi

navê Ehmed Fayiz. Termê çar çekdaran kete destê hêzên berxwedanê. Her wiha hêzên berxwedanê gelek çek û belgeyên leşkerî jî bi dest xistin. Her wiha çar erebeyên zirxî ji cureya Dupişk ku pîşesazkirina wan xwecihî bû, çar erebeyên zirxî yên leşkerguhêz, erebeyeke SUV, trektorek, du tang, tirêkişek û erebeyek BMB, hatin hilweşandin. Hejmara şehîdên berxwedanê gihaşt 43 çekdarî di nav wan de 8 YPJ bûn. her wiha 134 sivîl birîndar bûn û 59 sivîl şehîd bûn.

Artêşa Tirkiyê hewl da hemû cureyên çekên xwe yên giran di Efrînê de bi kar bîne; da ku wan kontrol û bangeşe bike. tu der li Efrînê nema ku nehat topbarankirin ta karwanên sivîl, penaber û sivîlên alîgirê niştecihên herêmê, hatin topbarankirin. Hejmara 4 ji xala B ji xala 2 ji benda 8 an a Sîstema Roma ya Bingehîn wisa dibêje: **" Ji qestî ve êrîşkirin tevî ku were zanîn ku ev êrîş dê gelek kesan bikuje û gelek sivîlan birîndar bike, ziyanên sivîlî çêke, ziyanên berfereh, domdar û bibandor li ser xwezayê û di dawî de tu destkeftên leşkerî yên rasteras û berçav nîn bin"** destdirêjiyeke metirsîdar e ji zagon û kevneşopiyên ku di rikberiyên navnetewî de li ser wan hatiye lihevkirin û di çarçoveya zagonên neguher yên navnetewî de.

Mînak: Di rapora rêxistina Human Rights watch di 28. 01. 2018 [7]an de der barê komkujiya ku li gundê Gopile ku berî niha em li serê rawestiyane, li vî gundî Tirkiyê di êrîşeke hewayî bi çar topan hin konên li gund ên ku malbata Keno lê dijiya, topbaran kir. Di ecamê de 11 kes ji vê malbatê hatin kuştin; biçûkê wan 4 heyvî bû. Di vê raporê de wisa hat gotin**: "...Kino û kurê wî got: 3 ji 4 rokêtan bi ser konan de ketin. Di navbera rokêtekê û rokêteke din de, 5 m bû; ya pêncan jî bi ser siwareya malbatê de ket. Wan got ku tu çalakiyên leşkerî yan jî armancên leşkerî li derdorê nîn bûn. çalakiyên sivîlî derveyî konan diyar bû û tu armancên leşkerî nîn bûn, tu tiş, tu tişt. Me digot êrîş armancên xwe şaş nakin, tekez e ku wan pez û zarokên li derve dilîzin, dîtine, lê em matmayî man, hemû niştecih matmayî man, ji ber ku "ev zarok in". Dr. Ciwan Mihemen ji nexweşxaneya Efrînê got ku karmendên tenduristiyê serdana cihê topbarankirî piştî kêlîkekê ji êrîşê kirin, dîtin ku kevir li wir heliya ne,**

[7] Sûriyê: sivîlên ji ber êrîşên Tirkiyê yên ku dibe ne rwa bin hatine kuştin. https://www.hrw.org/ar/news/2018/02/23/315341

**derbe gelekî bihêz bû. kevir bûbûn ax û kon û nhin xanî bûbûn kavil. Me nizanîbû ên hatine kuştin kî ne! Me nikarîbû em tiştê mayî binasin ji ber ku her tişt perçe bûbû. Me nasnameya kesekî tenê nas kir di riya cilên wî û hin nîşaneyan re. Lingek li vir bû û destek li wêderaha bû; tu tiştekî saxlem ji terman nemabû. Got li gorî zanîna min u armancên leşkerî li cihê êrîşê nîn bûn.**

Human Rights watch **hin wêne ku di 1. 12. 2017an de bi payikan girtibûn, vegerandin û nekêmî 5 konên domdar ku weke konên sivîlan bû, dîtin. Lê hin wêne bi payikan di sibiha 29. 1. 2018 hatin girtin, di wan de ew kon hatine hilweşandin û kortik li şûna wan çêbûbûn. Kûrahiya wan kortikan diyar dike ku ne kêmî 4 rokêtan li wî cihî ketine. Her wiha Hiyomin Raytis û Wotiş hin wêneyên ku hewardarên Heyva Sor Ya Kurdî radestî wan kiribûn, vegerandin û hevsengî di navbera wan wêneyan û wêneyên ku 29. 1. 2018 ji payikan hatine girtin, çêkir û ji dem û cihê wan wêneyan piştrast bû. di wan wênweyan de avahiyên hilweşandî, siware û alavine çandiniyê li der dorê belavbûyî ne, her wiha hin tiştên kesayetî jî hene, mîna bermaya duçerxeyeke biçûk. Wêneyên fotografîk û wêneyên payikî tekez dikin ku ev kon cihekî sivîlî bû û tu cih yan tiştên leşkerî li wir nîn bûn. ev yek gotinên dîtevanan tekez dike.**

Her wiha NRLS`ê- beşê Efrînê bikaranîna Tirkiyê ji gaza kîmyawî re li dijî sivîlên gundê Erendê yê girêdayî navçeya Şîyê, belge kir. Di 16`ê Reşemiya 2018`an de balafirên Tirkiyê gaza kîmyawî li gundê Erendê yê girêdayî navçeya Şîyê li dijî sivîlan, bi kar anî. Di encamê de hejmarek sivîl ji vî gundî bi gaza Sarîn birîndar bûn. Li ser rewşa sivîlên ku ji ber gazê ziyan gihaştine wan, Dr. Mihemed Heyder diyar kir ku di dîroka 16. 02. 2018`an de nêzî demjimêr 8`ê êvarê şeş rewşên hewarî gihaştin nexweşxaneyê. Rewşa wan ya hewarî ji aliyê dijwariyê ve, cuda bû; çar ji wan rewşa wan navîn bû û du rewşa wan zehmet bû. ji rewşa wan ve xuya bû ku bi gaza kîmawî ketine ji ber ku çavên wan sor bûbûn û hêstir dikirin, çermê wan sor bûbû, bêhna wan diçikiya û zengelora wan dişewitî. Nexweşxaneyê di dema guncav de alîkariya wan kir; niha jî rewşa wan asa ye. Navê sivîlên ku rastî êrîşa gaza kîmyawî hatine ev e: Ebdilrehman Şalîk

29 sal, Mehmûd Reşîd Hesûn 33 sal, Wedah Mistefa Xelîl 35 sal, Ehmed Mihemed Hemo 38 sal, Ednan Şalîko 35 sal û Mihemed Arif Heqî 43 sal.

Hejmara 17 ji xala B ji xala 2 ji benda 8`an: **" Bikaranîna jehr û çekên jehr"** qedexe dike. Her wiha hejmara 18: **" Bikaranîna gazên bêhinçikandinê, jehr û hemû gaz, ron û alavên ku weke wan in"** qedexe ne.

NRLS`ê- beşê Efrînê belge kir ku sivîl Şirî Elî Hecîko 57 salî ji gundê Hec Xelîl ê girêdayî navçeya Raco bi birînên giran û dijwar birîndar bûye. Ji şewitandinên ku di laşê wî de tên xuyakirin, diyar e ku ev topa bi ser wan de ketiye na asayî bû. Ji ber ku birînê wî bala mirov dikşandin. Ji ber ku carê top diteqe û dibe parçe, lê li vir cuda bû. Ev jî diyar dike ku heyberin din tevlî van rokêtan kiribûn di dema topbarankirina gund de. Dr. Xelîl Sebrî ji nexweşxaneya Efrînê da xuyakirin ku **"... Artêşa Tirkiyê hemû çekan di topbarankirina sivîl û xaniyên wan de li hemû gund û navçeyên girêdayî Efrînê, bi kar tîne; ta çekên ku navnetewî qedexekirî ne jî, bi kar tîne. Di dema dawî de topbarankirina wê çekên kîmawî jî derbas kirin û êdî heyberine awarte di topan de bi kar tîne. Di 26. 2. 2018an de, nexweşxaneyê Şikrî Elî Hecîko pêşwazî kir. Ev kes ji ber topbarankirina Tirkiyê ji gundê Hec Xalîl ê girêdayî navçeya Raco, di rû û laşê xwe de bi şewitandine awarte birîndar bûbû... nexweşxane niha êdî hew dikare sivîlên birîndar û rewşên birînên giran bihewîne; ev ji bilî tunebûna hin dermanan û kêmbûna hinên din..."**

Her wiha Navendê topbarankirina topên Tirkiyê ji karwanên ku ji Cezîrê, Firat, Dêrezor, Reqa, Minbic, Tebqa û Helebê ji bo alîgiriya niştecihên Efrînê bikin hatibûn, belge kir. Di dîroka 22.02.2018`an de di demjimêr 7`ê êvarê de ji roja Pêncşemê, topên Tirkiyê karwaneke siwareyên sivîlî bi zêdeyî 40 topî, topbaran kirin. Di encamê de gelek birîndar bûn û sivîlek şehîd ket; hin birîndar guhestine Nubil û Zehra, hin helebê û hinên din jî nexweşxaneya Efrînê. Vê êrîşê di dema gihaştina karwanan li dergeha ku berbenda rêjîm û ya asayîşên Rêveberiya Xweser ji hev cuda dike (li gundê Ziyaretê yê girêdayî navçeya Şêrewa), dest pê kir. Navê hin birîndaran ev e: Wensa Umer ji herêma Cezîrê- Qamişlo 58 salî, Ekrem Bedran Biro ji Herêma Cezîrê- Derbasiyê 21 sal, Xeyrî Coqî ji Şengalê 23 sal, Renda Hisên Celal Kantona Cezîrê ji Til Temir 20 sal, Mihemed Xalid Yaqûb,

herêma Cezîrê- Qamişlo 60 sal, Abidên Mamî Hesen Qamişlo 63 sal, Mihyedîn Hesen Mihemed 47 sal Qamişlo, Xalid Tewfîq Elî 45 sal Serê kaniyê û Salim Xelef Elxileyif 28 sal ji gundê Cezret Mîlac li Dêrezorê ji ber birînê serî û ûrê wî, şehîd bû.

NRLS`ê- Şaxê Efrînê toparankirineke din ji hêla artêşa Tirkiyê û sîxurên wê ve li dijî sivîlan, belge kir. Vê carê li gundê Kaxirê yê girêdayî navçeya Mabata. Hêzên Tirkiyê ji ber teknîka wê ya saloxgerî baş dizanî ku li vî gundî hejmara sivîlan ji ber xwelêgirtina penaberan, du qet bûye. Tevî wê jî demjimêr 3 sibehê gund bi top û balafirên bêajokar topbaran kir. Di encamê de 5 sivîl birîndar bûn û yekî jiyana xwe ji dest da. Navên wan jî ev in: Ehmed Mihemed Silêman 52 sal, Rêber Henan Îmo 35 sal, Mehmûd Ebdo Îmo 46 sal, Ehmed Cemîl Qasim 39 sal, Cemîl Mihemed Weqas 46 sal û Ciwan Sadiq Izet 30 sal jiyana xwe li nexweşxaneya Efrînê piştî çend demjimêran ji dest da.

**Neçarkirina sivîlan da ku weke sîxuran kar bikin di riya çekdarkirina penaber û çekdarên penaber li gorî girêbestên ramyarî:**

Dewleta Tirkiyê mezintirîn hejmara terorîstan li ser asta Rojhilata Navîn weke sîxuran bi kar anî. Di nav wan de bi hezaran Sûrî û xwediyê nasnameyên Erebî û Asyewî yên cuda bûn. Her wiha rewşa penaberên ku di kempeyên Tirkiyê de ne jî bi kar anî da ku wan weke sîxuran bi kar bîne. Gelek ji wan li ser alavên ragihandinê yên alîgirên Erdogan derketin û êrîşa Erdogan li ser xelkên welatê xwe rewa dikirin. Bikaranîna sîxuran li dijî gelên din, berovajî zagonên navnetewî ye. hejmara 15 ji xala B ji xala 2 ji benda 8`an a sîstema Roma wisa dibêje: **" neçarkirina penaberên aliyê dijmin da ku şerê welatê xwe bikin tevî ku berî şer di bin xizmeta dewleta êrîşker de bûn jî"** destdirêjiyeke metirsîdar e ji zagon û kevneşopiyên ku di rikberiyên navnetewî de li ser wan hatiye lihevkirin Di çarşoveya zagonên neguher yên navnetewî de.

Têkiliya bi kesê sîxur[8] re ne weke têkiliya bi çekdar an jî dîlên cengê re ye. Weke tewanbarekî têkilî pê re tê kirin. Benda 47 ji protokola yekem a li

[8] Sîxur ew kes e ku beşdarî şrê çekdar dibe beramberî pereyan. Tu regez, nirx û zagonên ku berevaniya wan bike yan bandorê lê bikin nînin. Li gorî zagonan weke leşker an jî dîlê cengê nayê pejirandin. Kiryarên wî dijberî regezên dewletên şaristanî ne û tewan in û li ser wan tê sezakirin. Tevî wilo jî sîxur gelekî niha di şerê navnetewî navberî de tên bikaranîn.

peymanên Cinêfê zêde bûne yên ku girêdayî parastina qurbanên dijberiyên çekdar ên navnetewî, wisa li ser sîxuran gotiye[9]:

**Kesê sîxur weke çekdar û dîlê şer nayê hesibandin.**

**Kesê sîxur ew kes e ku:**

1. **Bi awayekî taybet ji aliyê xwecihî yan jî derveyî ve tê biçekirin da ku di dijberiyeke çekdar de şer bike.**
2. **Bi awayekî rastî û rasterast beşdarî şer dibe.**
3. **A ku berê wî dide şer berjewendiyên wî yên taybet in. Pere ji hêla aliyekî ku şer dike yan jî cîgirê wî alî ve digêjinê; qasîbûna wan pereyan gelekî ji qasîbûna pereyên ku dighêje karmendên ku heman karî dikin, bêhtir e.**
4. **Ev sîxur ne di bin serpereştiya tu alî de ne û ne jî niştecihên herêmeke girêdayî herdu aliyên şer in.**
5. **Ne ji endamên hêzên çekdar ên herdu aliyên şer in.**
6. **Ne şandeyên dewleteke ku di şer de nebeşdar e û ne endam in di hêza wî ya çekdar de."**

**Bikaranîna ola Islamî:**

Destpêka êrîşa li ser Efrînê rêveberiya karûbarên olî ya Tirkiyê hemû îmamên mizgeftan neçar kirin da ku lavlav û geşedanê ji artêşa Tirkiyê re bikin û Sûreta Fetih berî yan jî piştî nimêja Eşayê roja Şemiyê û nimêja fecrê roja Yekşemê, were xwendin. Lê di heman demê de gelek melayên mizgeftên Kurdan li Amedê, Hekariya û Orfa ev yek nepejirandin.

Li gorî ajansa Anadol[10] a nêzî saloxgerên Tirkiyê: Nêzî 90 hezar mizgeftî lavlav ji bo artêşa Tirkiyê kiriye da ku bi ser bikeve, tu dibêjî belkî artêşa Tirkiyê dê li hemberî zirhêzekê, şer bike. Li gorî vê ajansê rêveberiya Karûbarên Olî daxuyaniyek li ser malpera xwe belav kiriye û tê de wisa hatiye: **" Rêveberê Karûbarê Olî "Elî Erbaş" ji hemû mizgeftan re**

---

Vê dawiyê curene nû ji sîxurbûnê re derketin û gelek beşgehên leşkerî û ewlehî yên taybet bi vî karî radibin. Lewma pêwîst e civaka navnetewî ji vî tiştî hayl be... Sîxur di zagona navnetewî ya mirovaî kurtenivîs- znîngeha Bira Mentorî, Qestentîniyê 1, Cezair 6112 hejmar 46- Dîsember 2016.

[9] Sîxur- https://www.icrc.org/ara/resources/documents/misc/5ntccf.htm

[10] https://www.aa.com.tr/ar

**şandiye da ku lavlavê ji artêşa Tirkiyê re bikin û Sûreta Elfetih berî yan jî piştî nimêja eşayê roja şemiyê û nimêja fecrê roja Yekşemê, bixwînin da ku serkeftin bibe para artêşa Tirkiyê ya ku şerê teroran li Efrînê dike!"** Ev tişta ku Rêveberiya Karûbarên Olî li Tirkiyê kir, berovajî tiştên ku di destûra Tirkiyê ya ku di 2011an de hatiye sererastkirin ne[11]. Di vê destûrê de di benda 24`an de wisa hatiye gotin: **"... nabe ku tu kes olê, hestên olî û pîroziyan bi tu awayî ji bo berjewendiyên kesayetî û siyasî, bi kar bîne. Her wiha çiqas kêm be jî, nebe sîstema siyasî, aborî, civakî û zagonî li ser pişta olê ava bibe."** Her wiha di benda 136 de hat: **"...Rêveberiya Karûbarên Olî ya girêdayî Rêveberiya giştî li gorî zagona jê re hatiye veqetandin û li gorî regezên zanînperestiyê, bi karê xwe radibe. Divê xwe ji helwestên siyasî dûr bixe û hewl bide ku alîkarî û yekîtiya niştumanî pêk bîne."**

Her wiha ev yek berovajî ola Islamiye û di bin xizmeta desthilatdariya sitemkar de ye ku olê li gorî berjewendiyên xwe yên desthilatdarî û terorîst, bi kar tîne. Gerek e ev yek ji kesên ku pîrozmahiyên olî binpê dikin re, were hinartin. Li gorî nerîna olî, kesên ku êrîş li ser wan hat kirin, misilman bûn, lewma vê yekê hişt ku nerazîbûn li ba gelek Misilmana çêbe û ji nû ve li baweriyên xwe binihêrin. Ji roja roj ve ol li dijî Kurdan tê bikaranîn û ol ji bo qirkirina Kurdên Êzîdî û Kurdên başûrê Kurdistanê, hat bikaranîn

Hemû Kurd her sal opresyona Enfalê ya xwînî 1988`an bi bîr tînin. Ev operesyon ji hêla rêjîma Iraqê ve li dijî kurdan pêk hat û di encamê de bi sed hezaran kurd hatin kûştin û bi milyonan hatin qewirandin. Ev operesyon, operesyoneke jenosîdî û plankirî bû. Niha jî li Efrînê careke din ol ji bo êrîşa hat bikaranîn, navê `Şaxê Zeytûnê` lê hat kirin û sûreta Elfetih hat xwendin. Li gorî serokê Yekîtiya Oldaran li Herêma Cezîrê, birêz Mihemed Xerezî[12], bikaranîna navê zeytûnê ji rastiyê dûr e, ji ber ku zeytûn

[11] Destûra Tirkiyê ya ku di 1982yan de derketiye tevî sererastkirinên wê ta 2011an. Wergerandina Saziya Navnetewî ya dîmokeratîk û hilbijartinan. Pêşxistina projeya destûrên hevseng. Ev belge li gorî constituteproject.org hat amadekirin û derxistin. Di riya bikaranîna naveroka ku ji hêla Saziya Navnetewî ya dîmokeratîk û hilbijartinan ve hetiye pêşkêşkirin. Her wiha ji naverokên belgeya projeyên destûrên hevseng e.

[12] Yekîtiya Oldaran li herêma Cezîrê, saziyeke sivîlî Islamî ye di 5.4. 2014an de hatiye damezirandin. Ji olzanînên herêmê yên xwedî mezheb û nijadên cuda, pêk tê. Ev sazî

xwedî cihekî pîroz e. Birêz Mihemed Xerezî vê yekê bi vî awayî rave dike: **" Zordarî di bingeha xwe de, nirxan û sembolên wan diguhere; stemkarî li ba zordaran dadweriye, berxwedan li ba wan teror e û bi vî awayî...Bi vê hişmendiyê navê êrîşa li ser Efrînê xistin `Şaxê Zeytûnê`. Zeytûn di çandên kevin de sembola berhemdarî, dan û aşitiyê ye. Di kongra Parîsê 1949`an de kevokeke ku Şaxê zeytûnê di devê wê de bû weke sembolekê ji aşitiyê re hat hilbijartin. Zeytûn û dara wê zêdeyî şeş caran di Qurana pîroz de hatiye nivîsandin; a herî bedew di Sûreta Elnûr de ayeta 35an e. Hin jêderên olî dibêjin ku dema Nûh tevî bawermend û lawirên pê re di keşteyê de bûn û derdora wan tev av bû, kevok dişand da ku derdorê jê re kontrol bike. carekê kevok şand û dema ku vegeriya çiqlekî zeytûnê di devê wê de bû û ji wê hingê ve kevok û Şaxê zeytûnê bûne sembola aşitiyê..."**

Ev jî berovajî operesyona Erdogan bi ser herêma Efrînê ya Ewleh de ye. Ji ber ku Erdogan bi vê operesonê aşitî neanî lê belê hilweşandin û şer anî, astengiyên sivîlan bêhtir kirin, destdirêjiyên metirsîdar li mafê mirovan kirin û bandoreke neyînî li xweza, lawir û daran kir. Ji bo têgiha Cîhadê jî, ev têgih têgiheke olî ye, tê wateya hewldana da ku rastî ji kesê ku vê rastiyê nizane re bi gotina xweş û hizirê were pêşkêşkirin. Ji ayetên ku vê yekê diyar dikin wateya gotina Xwedan: **" Bi ya gawiran neke û bi quranê cihada wan cihadeke mezin bike."** ayeteke din qala şer dike û wisa wateya wê ye: **"...Ji bo xwedê şerê kesê ku şerê we dikin bikin û stemkariyê nekin..."** Li gorî vê ayetê berxwedan rewa ye ji ber ku di ber niştecih û namûsê de ye.

Bi vî awayî Erdogan, Ixwan Elmuslimîn û milîsên radîkal, nûnertiya Islamê nakin ji ber ku Islam weke şoreşeke civakî û olî li dijî koletiya mirov ji birayê xwe yê mirov re, rabû. Bê guma AKPê û Ixwan Elmuslimîn ji aliyê îdeolojî ve girêdayî Islama Siyasî ne û tu caran em nikarin AKPê ji Ixwan Elmuslimîn cuda bikin. Ixwan Elmuslimîn piştî kuştina damezrînerê wê Hesen Elbena ji dibistaneke olî ber bi islama siyasî ve het guhertin û armanca wan bû gihaştina li desthilatdariyên bi çi awayî be. Li Misrê, Cezair û dawî li Sûriyê buhayekî pir giran dan. Di şerê bi ser Efrînê de di

---

nûkirina bersiva olî û banglêkirina li hizir û rêbazê bak, digire xwe. Hewil dide bingeha jiyana hevbeş û alîkariya di nevbera hemû pêkhateyan de xurt bike...

rêya kombûna leşkerî ya bi navê Feyleq Elşam, xwedî roleke sereke bûn. di Avdara 2014`an de damezirandina vê grûpê hat ragihandin. Ev grûp ji 19 komikên ji Heleb, Îdlib, Humis û Hemayê pêk tê, tev jî Ixwan in.

Li vir careke din em ê dahurandina Ramangerê Navnetewî Ebdela Ocelan li ser bikaranîna olê li dijî Kurdan, bi bîr bînin:[13] **Ji rêûresma deshilatdar a Îslamî ya bûrjûwayê nehatiye ku ji nêzîkatiya Tirkê Spî bibihure heta ji wê paşketîtir e. Li dijî hebûna çandî ya Kurd tevî rêbazên laîk modernîst, rêûresma Îslamî jî bikar aniye û di bin navê senteza Tirk-Îslamê de milliyetgirî hê dijwartir kiriye û pêk aniye. Nexasim kengî di tesfiyeyê de Tirkkirina laîk kêm ma, motîfên Tirk-Îslamê kirin dewreyê. Di serî de terîqetên Neqşî û Qadirî, bi tevahî amûrên dînî di vê mijarê de weke amûrên tinekirina çandê hatine bikaranîn. Serokatiya Karûbarên Diyanetê Ya Fermî bi Komarê re hat avakirin û ji wê rojê ve di xizmeta laîkgiran de hatiye xebitandin. Nexasim girêdana Kurdan bi çanda dîn îstîsmar kirine û bi giranî dîn weke şêwazekî komplowarî bi kar anîn. Naveroka xisletên terîqetên xwedî rêûresmeke berxwedêr, hatin pûçkirin û ew ne li gorî armancên damezrandinê, berevajî van armancan bi kar anîn. Têkoşîna milliyetgiriya Tirkê Spî (rojane bi awayekî berbiçav CHP, MHP û yên weke wan) li dijî çanda jiyana azad û berxwedana PKK'ê bêkêr bû, lewma li şûna wê yan bi wê re, li gorî polîtîkayên dewleta netewe (tevî ku bi prensîbên Komara Atatirk re li hev nakin) pêkhatinên Îslamgiriya Tirk temsîl dikin (di serî de AKP, partî û ekolên mîna Millî Goruşê û yên weke wê) bêyî ku fikaran bikin bi kar anîne. Dema ku mijar bûye hebûna çanda Kurd, gelek partî û ekolên Îslamgir bi awayekî biçin 'Seferên Xaçperestan' tevgeriyane û ev şêwaz weke pêdiviyeke 'yekîtiya millî û yekparebûnê' hesibandine..."**

Hemû tevgerên Islama siyasî nûnertiya Islamê nakin. Tev xwedî hişmendiyeke zordarî û giştgirî ne lê xwe bi kirasekî pîrozî vedişêrin; an divê hemû li Islamê weke wan binhêrin an jî dê ji wan re bibin dijmin û xwîn û malê wî li xwe helal bikin. Van tevgeran wêneyê Islama ku nirxên

[13] Manifisto, Şaristaniya Dîmokrat. Pirtûka pêncemîn. Pirsgirêka Kurdî û çareseriya netewa dîmokratîk. Berevaniya di ber Kurdên ku ketine di navbera herdû diranên qirkirina çandî. Rûpela. Ebdela Ocelan,. Wergerandina Zaxo Şiyar. Çapa duyem. Rûpela 179

hezkirin, dadwerî û aşitiyê belav dike, reş kir û Islam di nerîna gelekan de bûye jêdera tundiyê, belavkirina çanda nehizkirinê, nepejirandina kesên din û kuştina wan. Ev tev ji ber kiryarên van tevgeran bû. Komika Ixwan Elmuslimîn û hin tevgerên sofî hatin damezirandin da ku li hemberî bandora komûnîstê rawestin. Lê li ser nepejirandina kesê din û tundiya ku kuştinê rewa dike, ava bûn. ji vê grûpê kesayetine ku serkêşiya rêxistnên radîkal û tundrew kirine, derketin; her wekî Eymen Elzewahirî yek ji serokên Ixwanan li Misrê û Usama bin Ladin yek ji rêberên Ixwanan li Erebistanê. Rêxistinên terorîst ên herî tundrew (weke DAIŞê) encama van hizran in, ji ber ku hizir û kiryarên wan wekhev in.

**Piştî êrîşê:**

Piştî desteseriya hêzên Tirkiyê û komikên terorîst ên girêdayî wê li ser Efrînê, operasiyona qewirandin, guherîna demografîk û siyaseta tirkkirinê li herêmê xurtir bû. Ev yek dide xuyakirin ku dewleta Tirk dixwaze herêma Efrînê li gorî peymana Milî û projeya çeksazkirina rojhilat a ku Atatirk li dijî Kurdan bi kar aniye, tevlî dewleta Tirk bike. Di vê qonaxê de tevî rêbaz û kiryarên berî û di dema êrîşê de dihatin bikaranîn, rêbazekî nû ji bo pêkanîna jenosîd li dijî Kurdan tê bikaranîn. Ew jî di rêya tirsadina sivîlan da ku birevin û li şûna wan grûpên terorîst û radîkal û malbatên wan ên ku ji Xûta Rojhilat û Qelemon, bi cih bibin. Her wiha deverên din ên ku girêbest di navbera rêjîm û hevalbendên wê û Tirkiyê de çêbûn. Li ser van girêbestan di peymanên damezirandina herêmên agirbestê de di civînên Asatana û Sotşî de, hat lihevkirin. Armanc jê xurtkirina moralên van grûbên têkçûyî bû piştî ku nema dikarîbûn tu armancên xwe pêk bînin. Bû sedema herîfandina bingeha jêrîn û mirina bi hezaran sivîl bi destê wan û rêjîmê. Armanca Tirkiyê ji vê yekê zelal e, ew jî neçarkirina grubên dagirker da ku her tim bi tirsa bin û xwe bi cihê ku bi dest xistine ve, bigirin. Ji ber ku piştî tiştên ku anîne serê niştecihên resen, jixwe bi tirs in. Ev e sedema gurkirina qewirandina sivîlan. Destpêkê dagirkeran di kempan de bi cih dikin, dûvre wan dixin xaniyan. Piştre tên birêxistinkirin, biçekkirin û samanên niştecihan didin wan. Kesê ku ji sivîlan mane jî wan neçar dikin da ku samanên xwe bifroşin û birevin. Eger hinekan dev ji malên xwe berneda wan asteng dikin an jî wan digirin û binçav dikin bi bihaneya girêdana wan bi berxwedanê ve; carinan keçên wan direvînin û bi gefa kuştinê ditirsînin. Di dawiyê de jî yekî

dikujin da ku yên din bitirsin û neçar bibin ku xanî û samanên xwe li gorî nirxê ku desthilatdariya dagirker diyar dike, bifroşin. Li gorî nêrevaniya hin sivîlan, Tirkiya dixwaze guherîna demografîk pêk bîne. Ev jî dide xuyakirin ku projeyeke nû heye dixwaze Kurdan ji xaka wan dûr bixe. Ev yek jî li gorî cureyê duyem ê dagirkeriyê ku Mîkyavîlî di pirtûka xwe ya bi navê Mîr - beşa sêyem de, qala wê kiriye. Di vî beşî de qala dagirkirina herêmekê dike ku ji aliyê çand, ziman, sinc û zagonan ve ji te cudatir e. Bi vî awayî desteseriya vê herêmê zehmet e. Kesê dagirker li vir pêwîstiya wî bi şans û karê berdewam heye da ku karibe desteseriya xwe berdewam bikin. Baştirîn rêbaz ji bo vê yekê li gorî Mîkyavîlî, bicihkirina dagirkeran di nav niştecihên resen de ye. Nimûneyekê li ser vê yekê dide, dema desteseriya Tirkiyê li ser Yûnanê.

Mîkyavîlî li ser sûdwergirtina ji vê siyasetê tekez dike di riya agahdarbûna li ser planên ku di navbera sîxurên wî û serwerên xwecihî de çêdibin û bi awayekî lezgînî li hemberî van planan radiweste berî ku geneliya wan bibe sedem ji şoreşekê re. Di heman demê de tirsa wî di dilê niştecihên xwecihî de, dimîne. Mîkyavîlî li ser avakirina kempan tekez dike. Ew jî di rêya standina samanên niştecihan ji wan û dana wan ji dagirkeran re. Jixwe tu tirs nîne madem kesê ku samanê wî jê hatin standin, lewaz e. Ev kes nabin cihê metirsiyê û nikarin niştecihên din gur bikin ji ber ku tirs ketiye dilê wan de ku samanên wan jî ji wan werin standin. Ev stratejî li ser bingeha mayîna niştecihên resen di tirsê de, ava dibe. Di heman demê de avakirina kempan ji bo çêbûna hembêzeke gelêrî ku alîkariya dagirkeriyê dike û niştecihên resen ji hev dixe re, pêwîst e. Her wiha kempe ji aliyê diravî ve kêmtir e ji avakirina bargehên leşkerî. Siyaseta qewirandin û guherîna demografîk girêdana civakî û nasnameya Sûrî ya niştumanî dixe bin metirsiyan de. Ji ber ku krîzê kûrtir dike û welat û civakê jev dixe, rê li ber berjewendiyan û berdewamiya kirîzê vedike da ku hêzên navnetewî, xwecihî û herêmî hisabên di navbera xwe de çareser bikin. Ji rêbazên ku hatin bikaranîn ev in:

Qewirandina niştecihên mayî û bichkirina biyaniyan li şûna wan. Riwangiha Sûriyê ya Mafê Mirovan li ser vê yekê wisa dibêje[14]: **"...Riwangeha Sûriyê**

[14] pişi tî qewrandina wan li bakurê Sûriyê li gorî girêbestine guherîna dîmografî yên nû... astengî û rewşên xirab ên ku penaberên gundewarên Hema û Humsê di kampan de dijîn.

**ya Mafê Mirovan gihaştina beşê herî mezin ê penaberan bo Efrînê, belge kir. Ew jî piştî ku bi sedê hezaran niştecihên wê ji ber operasiyona Şaxê Zeytûnê koçber bûn û di xanî û baxçeyên wan de bi dehê hezaran kes bi cih bûn an jî di kempeyên ku li gundewarên başûrê rojavayî Efrînê ava bûne, bi cih bûn. Beşekî din ku li gundewarên Helebê yên bakurê rojhilat û li Îdlibê li cihê xwe man ji ber ku hinan ji wan bicihkirina xwe ji hêla Tirkiyê û grûpên çekdar ve, nepejirand. Her wiha derbasbûna di malninan de ku xwediyên wê jê hatine qewirandin, nepejirndin. Riwangiha Sûriyê Ya Mafê Mirovan di van rojên derbasbûyî de, bicihkirina Tirkiyê ji penaberên Qelemon û Xûta Rojhlat di Efrînê de belge kir. Ev yek jî piştî ku bi sedê hezaran niştecihên herêmê qewirandin piştî operasyona Şaxê Zeytûnê ya ku di 20. 1.2018an ta 18.3.2018an ji hêla Tirkiyê û grûpên çekdar ên Islamîû Sûrî ve, dest pê kir. Vê operasyonê îro (yekşemê) şeş heftî di desteseriya wê li ser Efrînê, qedandin. Ew jî piştî topbaraneke hewayî û bejahî ya tund ku li pey xwe nêzî 300 şehîdê sivî û sedên birîndaran hiştin. Ev ji bilî hilweşandina samanên sivîlan, saziyên giştî û binyada bajar û gundên Efrînê. Her wiha Riwangeha Sûriyê tomarkirina agahiyên kesên ku derbasî Efrînê dibin bi taybet kesên ku ji Xûta Rojhilat penaber bûne, belge kir. Emzeya telî û çavan ji niştecihên herêmê re tê çêkirin û hemû agahiyên wan tên tomarkirin. Her wiha kiryarên seknandin û kontrolkirinê der heqê niştecihên ku penaber nebûne tên meşandin. Ev sekinandin û kontrlkirin di dema guhastina wan de di nav berbendan re, ji wan re tê çêkirin."**

Riwangehê di raporeke xwe ya din de[15] tekez kir ku zêdeyî %40 ji kesên ku li Efrînê hatin bicihkirin, malbatên çekdarên ku li Xûta şer dikirin û beşa herî mezin ji wan ji malbatên çekdarên Feyleq Elrehman û piştre Ceyş Elislam in. Lê hejmara malbatên çekdarên tevgera Ehrar Elşam ne zêdeyî 50 malbatî ye.

http://www.syriahr.com/2018/05/27

[15] Bicihkirina penaberên Xûta li Efînê berdewam e ta ku gihaştiye 2500 kesî ta niha, di nav wan de zêdeyî 40% ji malbatên çekdaran in.
http://www.syriahr.com/2018/05/11

**Girtina sivîlan a bêser û ber, destdayîna li ser samanan û qedexekirina vegera penaberan:**

Piraniya tewanên ku Tirkiyê û hêzên girêdayê wê pê rabûn, ne di çarçoveya operasyona leşkerî de bûn, lê belê tolhildan û pêkanîna hizrên tewanbariyê bûn ku ev kiryar ji hêla Encumana fetwê ya girêdayî Encumana Islamî Ya Sûrî ya ku sîxur e ji dewleta Tirkiyê û Rêveberiya Kar û Barê Olî re li Tirkiyê. Ya ku rêbazê tolhildanê di kiryarên leşkerî yên ku li Sûriyê pêk tên tekez dike, daxuyaniya serokê komîteya navnetewî ya Xaça Sor a navnetewî[16] piştî serlêdana wî ji Sûriyê re di Avdara 2018`an de. Hin ji tiştên ku di vê daxuyaniyê de hatin: **"... Serlêdana min ji sûriyê re nerîna ku dibêje şerê li herêmê gihaştiye asteke pir metirsîdar, li ba min tekez dike. Şerê tolhildanî bi tundî berdewam e bêyî ku tu girîngiyê bide bandorên wê yên xirab li ser sivîlan. Xûta Rojhilat mînaka nû ye ya ku asta astengiya sivîlan diyar dike. her wiha Efrîn, Mûsil, Senia û Teiz. Gelek caran tê xuyakirn ku armanc ji vî şerî xirakirin e, ji ber ku regezên mirovahî yên bingehîn li bin guhê dîwar dixin..."** Mînak: piştî derbasbûna van hêzan li bajar û gundan, xanî, xak û samanên malbatên bi niştimaniya xwe navdar in, desteser kirin û dizîn. Saloxgerên Tirkiyê bi alîkariya sîxurên xwe yên girêdayî ENKS`ê karîbû agahiyan li ser malbatên niştimanî yên ku di Rêveberiya Xwesr de(di saziyên sivîlî, xizmetguzarî, perwerdahî, ewlehî û leşkerî) kar dikirin, bistînin. Her wiha handana berdewamiya şer hat kirin da ku rê li ber vegera niştecihan were girtin û alîkariya guherîna demografîk were kirin. Gelek caran ji ber parvekirina talanê, şer di navbera van grûban bi xwe de çêdibe. Riwangeha Sûriyê gelek pevçûnên çekdar di navbera van hêzan de li ser parvekirina talanan û herêman, belge kirin. gelek caran hev û din li ser firotina Xûta Rojhilat, xayîn derdixin.

Piştî pênc heftiyan ji desteseriya hêzên Tirkiyê û grûpên girêdayî wê li ser Efrînê, Riwangeha Sûriyê raporek bi navê[17] **" piştî pênc heftiyan ji desteseriya li ser Efrînê... hêzên Şaxê Zeytûnê kiryarên diziya sivîl û**

[16] daxuyaniya serokê komîteya navnetewî ya Xaça Sor piştî serlêdana wî ji Sûriyê re: https://www.icrc.org/ar/document/statement-icrc-president-peter-maurer-following-his-visit-syria

[17] " piştî pênc heftiyan ji desteseriya li ser Efrînê... hêzên Şiqla Zeytûnê kiryarên diziya sivîl û samanên wan û girtin û berdana wan beramberî perayn, berdewam dike"

**samanên wan û girtin û berdana wan beramberî pereyan, berdewam dike"**

Da xuyakirin ku van hêzan sivîlên navçeya Şera bi behaneya girêdana wan bi PKK û PYDê ve, qewirandin. Her wiha gelek kênc û mêr hatin girtin û îşkencekirin bi tawanên derew û piştre ew beramberî pereyan serbest berdidan. Çarenûsa gelekan ji wan jî ta niha winda ye. Her wiha kiryarên êrîşkirin û kontrolkirina bi ser gund û bajaran de, berdewam e. Girtina sivîlan li ba van grûpên çekdar li gorî Riwangehê, bûye mîna bazirganiyê ku beranberî wan milyonên pereyan dixwazin. Di raporeke din a Riwangeha Sûriyê de wisa hat gotin[18]: **"...çalakvanên Riwangeha Sûriyê ya Mafê mirovan li beşê rojava yê gundewarên Efrînê yê ku li beşa bakurê rojavayî parêzgeha Helebê dikeve, geriyan. Ev herêm ji Avdara 2018an de di bin kontrola Tirkiyê, grûpên oposizyonê yên çekdar û yên islamî yên ku di operasyona Şaxê Zeytûnê de şer dikin de ye. Tişa yekem ya ku li bajarokê Cendîris ê ku piraniya wî xira bûbû, dîtin ew bû ku li ser hin avahiyên vî bajarî hatiye nivîsandin ku ev avahî bi tevahî bûye para grûpên çekdar ên ku di Şaxê zeytûnê de kar dikin. Û çênabe xwediyên wan vegerin wan. Her wiha çênabe tu kes ji bilî grûpa ku destê xwe daniye ser, bikeviyê de. Her wiha xanî û baxçeyên sivîlan kirin cihên leşkerî û ewlehî, tê de çekdar bi cih bûne. Gundê Kefer Sefer kirin cihekî leşkerî girtî ku ji bilî leşkeran çênabe tu kes bikeviyê, tê de cihên hêzên alîgirên Tirkiyê û cihên hêzên Tirkiyê, heye. Di heman demê de û di heman gerê de çalakvanên Riwangihê bi dehan siware li ser wan riyan û gundan dîtin ku bi tiştên diziyê barkirî bûn. Ev tev jî di bin bihaneyeke tenê de (ev xanî yên hêzên kurdî ne yan jî yên kesine alîgirê hêzên Kurdî ne)**. **Her wiha berbend bi kiryarên kontirolkirina sivîlan bi awayekî tund, radibin; ta ku carinan dighêje santajkirina wan. Di heman demê de ev berbend rê li ber derbasbûna kesên ku ne ji Efrînê ne, hêsan dike. Ev kiryar û destdirêjiyên van hêzên berdewam in û di heman demê de girtina rê li ber niştecihên Efrînê ji hêla hêzên Tirkiyê û grûpên çekdar ên girêdayî wê ve,**

[18] Berbend niştecihan kontirol dikin û xanî zevîû avahiyan destese dikin...diziya bênavber, rê li ber vegera niştecihan girtin û gelek gund bi tevahî kirin cihên leşkerî.
http://www.syriahr.com/2018/04/25

**berdewam e. Ev zêdeyî 20 rojan e ku bi sedan malbat li ser berbenda Kîmar û berbendên rojhilatî Efrînê, li benda derbasbûna xwe ne. Lê Tirkiyê û grûpên çekdar rê li ber derbasbûna wan venakin bêyî ku tu sedem ji nederbasbûna wan re hebe. Di heman demê de bicîkirina penaberên Xûta Rojhilat û Qelemona rojhilat,berdewam e. Riwangehê astengiyên ku gel li ser van berbendan ji ber kêmbûna xwarin, derman û ne peydabûna cihekî ku wan bihewîne dikşînin, belge kir. Di heman demê de rewşa sedê hezaran penaberên herêma Efrînê li gundewarên bakur ên Helebê, aloztir dibe û her roj xirabtir dibe. Her wiha alîkariyên rêxistinên mirovahî û hewarhatinî, kêmtir dibin. Van rêxistinan tevî Neteweyên Yekbûyî Encumana Payebilind a Mafê Mirovan, pişta xwe dane hewarên niştecihên Efrînê yên ku hîna li beşê bakur ji gundewarên Helebê ne..."**

Niştecihên herêmên di bin destê hêzên dagirkeriya Tirkiyê de ji ber dorpêçkirina ewlehî ya tund di rêya belavkirina berbendan, kontrolkirina qirêj, girtinên bêsûc, revandin û îşkencekirinê, astengiyan dikşînin. Niştecih tev di tirsa xwe de ne ku werin girtin, revandin, kuştin... Di raporeke rêxistina Human Rights watch de wisa hat:[19]**" Grûpên çekdar yên artêşa azad ku Tirkiya alîgirya wan dike, samanên sivîlên kurd li Efrînê-bakurê Sûriyê desteser kirin, dizîn û hilweşandin. Li şûna niştecihan malbatên çekdarên oposizyonê bi cih kirin. Samanên sivîlan hilweşandin û dizîn bêyî ku qerebûyê li wan vegerîne. Biryanka Motabarsî (rêvebera demkî ya beşê hewarhatinê di Hiyomin Raytis wotiş de, got: Divê Artêşa Azad saman û xaniyên kesên ku neçar bûne birevin, xira neke û lê bi cih nebe. Ji dêvla ku sivîlên lewaz piparêzin, ev grûp destdirêjiyê li wan dikin."**

Her wiha Lema Feqîh (cîgira berdevka beşa Rojhilata Navîn di Human Rights watch de) got: [20]**" Tevî ku rewşa hemû penaberên ku ji Efrînê bazdane, pir aloz e lê bi taybet kesên ku di herêmên ku di bin destê rêjîmê de mane û samanên wan tên dizîn, di bin metirsiyan de ne.**

[19] Sûriya: desteseriya girûpên ku Tirkiya alîgiriya wan dike, li ser samanên Efrînê: https://www.hrw.org/ar/news/2018/06/14/318985

[20] desthilatdariya Sûriyê rê li ber revîn û gihaştina alîkariyan bo niştecihên Efrînê digire: https://www.hrw.org/ar/news/2018/04/08/316683

**Gerek e hêzên Tirkiyê û grûpên girêdayî wê kiryarên dizî û hilweşandina berfereh a samanên sivîlên Efrînê rawestînin. Her wiha gerek e hêzên rêjîmê rê li ber kesê dixwaze bireve, negire."** Her wiha di raporê de wisa jî hat: **"...Hin karmendên tendirustiyê yên ku bi Hiyomin Raytis re reviyane qala rewişine pir aloz dikin li herêmên di bin destê rêjîmê de û hin gundên Efrînê yên di bin destên hêzên Tirkiyê û grûpên girêdayî wê de ne. Gelekan ji wan qala van tiştan dikir: razana di nav zeviyên vekirî de, kêmbûna dermanan û nepeydabûna ava paqij. Di 29.3. 2018an de Neteweyên Yekbûyî got ku pêdiviyên van penaberan pir kêm in û tekez kir ku alîkarî ji wan re ji bo ku sax bimînin, pir pêwîst in**

Hin çalakvan dibînin ku armanc ji qewirandinê ew e ku herêmine taybet vala bikin û afirandina kirîzeke niştecihî pêk bînin da ku bal li ser tiştên ku diqewimin here, bi rewşa xwedîkirinê ya zehmet mijûl bibin û Rêveberiya Xweser di hemû çalakiyên xwe yên dublomasî de tenê bala wê li ser penaber û alîkariya wan be. Her wiha dema ku herêm ji niştecihên xwe vala bibe dê desteseriya li se herêmê misogertir be û dê rizgarkirina wê derengtir bimîne. Hêzên Tirkiyê di riya avakirina hevaltiyekê bi niştecihan re, xwe weke hembêzeke ewlehiyê dide xuyakirin di riya vekirina dergehê gilî û gazinan li pêşiya niştecihên ku astengiyan ji kiryarên rêxistinên terorîst dikşînin. Ev yek baş diyar e di xwepêşandana ku sivîlên girêdayî ENKSê li meydana Azadî di 3. 7. 2018an de pê rabûn[21] û tê de ji hêza Tirkiyê xwestin ku sînorekî ji kiryarên milîsên tundrew û grûpên Artêşa Azad re, dayne. Ew jî piştî ku çalakvanek ji wan hat girtin ji hêla van grûpan ve (li gorî Riwangiha Sûriyê[22]. Jixwe tê zanîn ku ENKS`ê tu alîkarî neda sivîl û berxwedanê di dema êrîşê de lê belê bûn alavek ji rewakirina êrîşê re. Her wiha Tirkiyê dixwaze pere, ziman û pertalên Tirkî, bisepîne. Hin biranşên fêrkirina zimanê Tirkî derbasî dibistanan kir û nivîsandina Tirkî li navnîşanên saziyan zêde kir.

---

[21] di xwepêşandanekê de ji ber destdirêjî û kiryarên bênavber, revandin, girtin...du xwepêşandan li Efrînê li dijî girûpên çekdar û daxwazkirina ji Tirkiyê da ku van kiryaran rawestîne. http://www.syriahr.com/2018/06/03

[22]de ji ber destdirêjî û kiryarên bênavber, revandin, girtin...du di xwepêşandanekê [22] xwepêşandan li Efrînê li dijî girûpên çekdar û daxwazkirina ji Tirkiyê da ku van kiryaran rawestîne. http://www.syriahr.com/2018/06/03

Gelek rapor ji hêla rêxistinên mafparêzî yên navnetewî û xwecihî derketin, tevan jî tekez kir ku kesên ku ji herêmên din penaber bûne li Efrînê tên bicihkirin û vegera niştecihan tê qedexekirin û siyaseta guherîna demografî berdewam e. Jixwe tê zanîn ku hinek penaberan dagirkerî nepejirand û neketin xaniyên sivîlan de. Ew kes an vegeriyan cihê xwe yan jî çûn cihên din[23]. Riwangehê[24] li ser mijara qedexekirina vegerîna penaberan wisa got: **"...qedexekirina vegera sivîlan pê re tirs ji vegerê hebû, nemaze piştî ku gelek kesên ku Tirkiyê rê li ber vegera wan vekir, hatin girtin. Di heman demê de bi sedan sivîl bi şûn de vegeriyan piştî ku Tirkiyê nehiştin derbasbin û vegerin xanî û gundên xwe yên ku ketine bi destê grûpên çekdar û hêza Tirkiyê de..."**

Gelek kiryar û destdirêjiyên ku herêma Efrînê rastî wan hat û tê, di raporeke Maf de[25] (saziya mafên mirovan li Sûriyê) hatin belgekirin. Ev rapor li ser kiryar û binpêkirinên zor ên ku hêzên Tirkiyê û grûpên çekdar ji dema dagirkirina Efrînê di 20. 01. 2018`an ta dawiya Avdara heman salê pê rabûne, radiweste.

Ev kiryar dijberî regezên Bînhîro yên navnetewî ne[26]. Ev regez zagona navnetewî diyar dike û li ser vegerandina xanî û samanên niştecihan piştî vegera wan li cihê wan, tekez dike û wisa dibêje: **" Ji mafê her penaberekî û koçberekî ye ku xanî û zeviyên xwe yên ku bi zorê jê hatine standin, vegerîne."** Ji bo naskirina van regezan û çiqasiya dijberiya wan bi kiryarên hêzên Tirkiyê û grûpên çekdar re, pêwîst e em dawiya vî beşî van regezan, rêz bikin.

Eger rêxistinên mafî yên têkildarî vê mijarê nikaribin wargirên li Efrînê bi cih bûne, vegerînin cihên wan ên resen, dê bijardeya vegerandina wan bi zorê li pêşiya berxwedanê bimîne. Ji ber ku tev çekdar in û endamên milîsên çekdar ên radîkal û xwedî hişmendiyeke ku tenê bi hêzê serwext dibe ne. Ev jî dê bihêle ev kes hewara xwe bighînin dewleta Tirk. Wê hingê jî dê

[23] Bicihkirina penaberên Xûta li Efrînê berdewam e û gihaştiye 2500 kesî di nav wan de 40% ji malbatên çekdaran in. http://www.syriahr.com/2018/05/11

[24] Tirkiya rê li ber vegera penaberên Efrînê digire. http://www.syriahr.com/2018/05/11

[25] http://www.hro-maf.org/?p=2245

[26] Regezên Neteweyên Yekbûyî- Bînhîro. http://www.unhcr.org/en-us/protection/idps/50f94d849/principles-housing-property-restitution-refugees-displaced-persons-pinheiro.html

Tirkiya berjewendiyên nû bi wan pêk bîne. Lewma dibe ku demeke dirêj pêwîst be ta ku penaber vegerin xanî, gund û bajarên xwe. Eger civaka navnetewî bixwaze rahêje berpirsiyarî û erkê xwe der barê gelê Sûriyê de, pêwîst e hewl bide ku krîza Sûriyê bi awayekî demokratîk û aşitî, çareser bike û destûreke nû ji welat re dayne ku tê de mafê hemû Sûriyan were parastin.

Civaka navnetewî astengiyên ku niştecihên herêmê di bin dagirkeriya Tirk de û li kempan dikşînin, dibîne, lê xwe nedîtî dike. Eger raporên belgekirî bi berdewamî jê re neyên şandin, ew tu tiştî nake. Dibe ku sedema vê yekê bîroqratiya ku di saziyên navnetewî de belavbûyî be. Her wiha ev rapor pêwîst in ji bo dilê gelên cîhanê bi van penaberan bişewite û ew jî zextê li saziyên mafparêzî û desthilatdarî bikin da ku bi hewara gelê Efrînê û gelên din ên ku di krîza Sûriyê de asteng bûne ve, werin. Pêşniyara damezirandina hêzeke navnetewî aşitîparêz da ku niştecihên herêmê û hêzên Tirk û grûpên çekdar ji hev cuda bike, pêşniyareke baş e. Her wiha ev hêz çavdêriyê li ser herêmê bike bi awayekî ku vegera penaberan û sivik kirina astengiyên wan, misoger bike. Ev jî weke pêngava yekem di rizgarkirina herêmê de ye. Lê pirsgirêk ew e ku kesê zarok, jin û kalan dikuje, tu caran van pêşniyaran û tu pêşniyarên din ên ku dê aşitiyê û dadweriyê bi xwe re bînin, napejirîne.

Li gorî Rêxistina Rojava ya mafê mirovan, tu dezgehên mafî yên navnetewî li herêmê nînin. Rêxistina Rojava hemû hewldanên xwe dikin da ku raporên wan bighêjin rêxistinên navnetewî yên berpirsyar. Lê mixabin tu helwest li ser erdê nînin. Nêzî 950 gilîyên niştecihan li dijî dewleta Tirk hatine belgekirin da ku van gilîyan bighînin Dadweriya Mafê Mirovan û Tewanên Navnetewî di rêya 17 dozan re. Ev doz ji hêla Rêxistina Rojava ve hatin amadekirin da ku bi wan, giliyê Tirkiyê bikin. Rêxistinê tekez kir ku ew gelek astengiyan dikşîne dema ku ew dixwaze xwe bighîne sivîlên di herêmê de mane ji ber ku Tirkiya gelek astengiyan li pêşiya derbasbûna çalakvanên bêalî datîne. Lewma belgekirina destdirêjiyan, zehmet e. Gelek gilî dighêjin Rêxistinê. Ev gilî qala îşkence û destdirêjiyên ku sivîl rastî tên, dikin. Her wiha destdirêjînên din li herêmên Şehba jî tên şopandin da ku werin belgekirin. Her wiha rêyên din jî hene ji bo destdirêjiyên der heqê niştecihan

de pêk tên, werin belgekirin û navê xwediyê xaniyan ên ku hatine qewirandin û kesên ku ketine xaniyên wan de, tê nivîsandin.

Ramangerê Navnetewî Ebdela Ocalan karîbû nêrîn û helwesta Tirkiyê der heqê Kurdan, pêşkêş bike:[27] "...Di dema desthilatdariya hegemonîk a nû de rejîma şerê taybet ê bi armanca tesfiyekirina hebûna Kurd û azadiya wî, wê bêhtir were bi hêzkirin û dewamkirin. Jixwe AKP'ê li ser vî bingehî di şexsê artêşê de bi xwediyên desthilatdariya berê yên rêjîmê re li hev kir ango di bingehê vê lihevkirinê de domandina tesfiyekirina hebûna Kurd (rastiya ontolojîk) û azadiya wî (serwextî û rêxistinî) û qirkirina çanda wî heye. Lewma bi awayekî din desthilatdarî radestî AKP'ê nedikirin. Di sala 1925'an de jî milliyetgiriya Siyonîst û neteweparêziya Tirk li ser bingehê înkara hebûna Kurd û bi şîddetê tepisandina hêzên isyanê li hev kiribûn. AKP'ê ne bi tenê ev lihevkirin qebûl kiriye, di heman demê de bi argumanên Îslamî bi hêz kiriye û dewam kiriye. Kurtûkurmancî, nuqteya hevbeş a ku hersê ekolên sereke yên milliyetgir ango milliyetgiriya Siyonîst û neteweparêziya Tirk, milliyetgiriya Tirk û milliyetgiriya Tirk-Îslamê li ser li hev kirine ji aliyê çandî ve qirkirina Kurdan e. Hersê ekolan herçiqasî di tevahiya mijarên din de li dijî hev darbeyên xwînrij kiribin û li dijî hev têkoşiyabin jî li dijî rastiya Kurd timî xwedî helwesteke hevpar in. Diyardeya jêre 'qanûna hesin' a rejîma faşîst tê gotin ev e. Çi hêza ku vê qanûnê nas neke di nava sîstemê de mafê jiyanê û siyasetkirinê nadinê...[148]"

## Regezên Bînhîro yên navnetewî:

*Economic and Social Council - E/CN.4/Sub.2/2005/17- 28 June 2005 - UNITED NATIONS*

*COMMISSION ON HUMAN RIGHTS,Sub-Commission on the Promotion and Protection of Human Rights. Fifty-sixth session. Item 4 of the provisional agenda*

*ECONOMIC, SOCIAL AND CULTURAL RIGHTS*

[27] Manifisto, Şaristaniya Dîmokrat. Pirtûka pêncemîn. Pirsgirêka Kurdî û çareseriya netewa dîmokratîk. Berevaniya di ber Kurdên ku ketine di navbera herdû diranên qirkirina çandî. Rûpela. Ebdela Ocelan,. Wergerandina Zaxo Şiyar. Çapa duyem. Rûpela 179

*Housing and property restitution in the context of the return of refugees and internally displaced persons*

*Final report of the Special Rapporteur, Paulo Sérgio Pinheiro*

*Principles on housing and property restitution for refugees and displaced persons*

*Pêvek: regezên vegerandina xanî û samanên kesên ku di hundirîn de, penaberbûyî ne.*

***Beşa duyem: Mafê vegerandina xanî û samanan û qerebûkirin:***

*2. Mafê vegerandina xanî û samanan û qerebûkirin.*

*2.1-Hemû penaber û koçber xwedî mafê vegerandina xanî, xak û samanên xwe ne yên ku bi awayekî bizorê û nezagonî ji wan hatine standin. Eger ev xanî, xak û saman çeksazkirin ji wan re pêwîst be yan jî vegerandina wan qet çênebe, pêwîst e berdêl di riya dadweriyeke bêalî re, ji wan re were standin.*

*2.2-Divê dewlet girîngiyê pêşî bidin mafê vegerandinê. Ev ji rêbazê dadweriyê yê herî baş e ji bo penaberbûnê û hêmaneke sereke ji hêmanên dadweriya lihevkirinê ye. Mafê vegerandinê mafekî sereke ye. Eger penaber û koçberê bixwaze vegere ya nexwaze jî, mafê wan heye ku xanî, xak û samanên xwe vegerînin û qerebûyê jî bistînin.*

*Beşa sêyem: Regezên giştî.*

*3-Mafê parastina ji newekheviyê.*

*3.1-Mafê her kesekî heye ku ji newekheviya li ser bingeha nijadî, reng, zayend, ziman, ol, nerîna siyasî, koka neteweyî û civakî, saman, astengiyên laşî, zayîn û ji bilî wan, were parastin.*

*3.2- Dewlet qedexekirina newekheviyê li gorî rasteqîn û zagonê ji ber sedemên li jor, misoger dike. Her kes tevî penaber û bêxwedian jî, li pêşiya zagonê wekhev in.*

*4- Mafê wekheviyê di navbera mêr û jinê de.*

*5-Mafê ji penaberbûnê, parastin.*

*5.1- Her kesek mafê wî heye ku ji qewirandina ji xanî, xak û cihê niştecihbûna xwe, were parastin.*

*5.2- Pêwîst e dewlet mijara parastina ji qewirandinê bixin zagonsaziyên xwe yên xwecihî de, bi awayekî ku bi zagona navnetewî ya mafên mirovan re û zagona mirovahî ya navnetewî û pîvanên girêdayî vê mijarê re, heman be. Ev parastin divê hemû kesên di hundirê sînorên wê yên zagonî de ne, bihewîne.*

*5.3- Çênabe dewlet kesan biqewirîne, xanî û zeviyan hilweşîne, dest deyne ser saman û xakê da ku di riya vê destdayînê re wan siza bike yan jî vê destdayînê weke rêbazekî şer bi kar bîne.*

*5.4- Gerek e dewlet pêngavên pêwîst bidin da ku tu kes rastî qewirandinê ji hêla dewletê yan jî ji hêla alîne din ve ku ew alî ne xwedî nasnava dewletê ye lê xwedî bandor e, neyê. Her wiha gerek e dewlet nehêlin ku kesayet, beşgeh û statûyên din ên di bin serweriya wê ya zagonî de ne, bibin sedem ji penaberbûnê re.*

*6- Mafê taybetbûnê û rêzgirtina taybetmendiyên malan.*

*6.1- Ji mafê her mirovekî ye (nêr/mê) ku tu kes bê sedem tevlî kar û barê wî yê taybet û xaniyê wî nebe.*

*6.2- Gerek e dewlet zagonian derxin ku rê li ber tevlîbûna bê sedem di kar û barê taybet yê mirovan û xaniyên wan de, bigirin.*

*7- Mafê ewlehiyê di bikaranîna samanan de.*

*7.1- Ji mafê her mirovî ye ku bi ewlehî samanên xwe bi kar bîne..*

*7.2- Çênabe ku dewlet dest deynin ser samanan bêyî ku berjewendiyeke gişî hebe. Her wiha pêwîst e ev destdayîn li gorî zagon û regezên navnetewî yên giştî be. Pêwîst e berjewendiya civakê di sînorekî teng de were pêkanîn, yanê gerek e ev destdayîn tenê demkî be û bi awayekî aşitî ev saman werin bikaranîn.*

*8- Mafê niştecihbûna gunjav.*

*8.1- Ji mafê her mirovekî ye ku cihê niştecihbûna wî guncav be.*

*8.2- Gerek e dewlet kar û barên pêwîst bikin da ku astengiyên penaber û koçberên ku di xanîne biçûk de ne ku ew xanî têra wan nakin, sivik bikin.*

*9- mafê çûn û hatina azad.*

*9.1- Ji mafê her mirovî ye çi jin be çi jî mêr be ku bi azadî tev bigere û cihê niştecihbûna xwe hilbijêre. Çênabe tu kes were neçarkirin, her wiha çênabe kesek di hundirê herêmekê yan rûberekê de bi zorê yan jî bi awayekî*

*nezagonî, were hiştin. Di heman demê de çênabe tu kest bi zorê ji herêma xwe were dûrxistin.*

*Beşa Çarem: Mafê vegera bi riza xwe û bi rûmet û ewlehî.*

*10. Mafê vegera ji ber xwe ve û bi rûmet û ewlehî.*

*10.1- Ji mafê her penaber û koçberekî ye ku ji ber xwe ve vegerin xanî, xak û cihên niştevihbûna xwe bi rûmet û ewlehî. Ev veger divê li ser bingeheke azad û li gorî hilbijartina kesayetî be. Her wiha pêwîst e kesê penaber an koçber hemû agahiyên li ser herêma ku dê biçinê, zanibe; di nav de mijarên ewlehiya diravî, laşî û zagonî ya li welat û cihên jidayîkbûnê jî.*

*Beşa pêncem: Zagon, siyaset, kar û bar û şêwazên cîbicîkirina sazîtiyê.*

*13- Derfeta gihaştina li dozên vegerandinê, hebe.*

*13.12- Gerek e her dewletek parastina sivîlên ku doza qerebûyê dikin, ji siza û zordariyê bikin.*

*17-Niştecihên neresen.*

*17.2- Gerek e dewlet parastina niştecihên nresen ji çewsandin û kiryarên nezagonî di dema qewirandinê de, bike. di demên neçarbûna valakirina xanî, xak û samanan ji ber hin sedeman, pêwîst e valakirin li gorî zagon û pîvanên mafê mirovan ên nevnetewî, pêk were. Bi awayekî ku misogeriya dadweriyeke rast ji wan re were dayîn. Her wiha peydakirina çzreserîne zagonî di nav de derfeta bidestxistina berdêleke zagonî jî hebe.*

*17.2- Gerek e misogeriyên zagonî yên ku dewlet dide van niştecihên neresen, ne berovajî mafê xwediyê xanî, xak û samanan ên resen be. Gerek e xanî, xak û samanên wan bi awayekî dadwerî û di dema guncav de li wan werin vegerandin.*

*17.3- Eger valakirina cihekî ji niştecihên neresen neçar be û dewlet nikare pêk neyîne, gerek e ev dewlet tiştekî ji bo wan kesan bike da ku cihekî berdê ji cihê ku jê derketine ji wan re bi awayekî demkî peyda bike da ku vegera penaber û koçberan li xanî, xak û samanên xwe hêsan be û di dema guncav de be. Tevî wilo jî û eger cihekî berdêl ji van kesan re peyda nebe jî, gerek e pêkanîna biryara vegera niştecihên resen li xanî û xaka xwe dereng nemîne.*

*17.4- Di rewşên firotina xanî, xak û samanan ji hêla niştecihên neresen ve bo kesekî sêyem, gerek e dewlet kesê sêyem berdêla ziyanên gihaşinê pêşkêş bike ji ber ku pêşkî ji penaber re ye. Lê dîse derxistina biryarekê bi*

*nekirîna samanên ku xwediyên wan penaber in, dibe ku rê li ber kirîna van samanan bigire.*

*19- Qedexekirina zagonên zordarîkirin û newekhevkirinê.*

*Beşa şeşem: Rola civaka navnetewî, her wiha rola rêxistinên navnetewî.*

*22- Erkê civaka navnetewî û berpirsyariya wê.*

*22.1- Gerek e civaka navnetewî alîkarî û parastina mafê vegerandina xanî, xak û samanan bike, her wiha vegera ji ber xwe ve ya ewleh û birûmet.*

*22.2-...Li gorî zagon û pîvanên navnetewî yên mafê mirovan, valakirina cihekî ji niştecihên wê bi zorê, qedexekirin.*

*22.5- Gerek e di operasyonên aşitiyê yên navnetewî de di dema pêkanîna wan ji karê li ser milê wan re, rewşeke ewleh û hedar ji vegerandina xanî û xakê re bi awayekî guncav, peyda bikin û siyaset û projeyan bi awayekî serkeftî pêk bînin.*

*22.6- Gerek e ji operasyonên aşitiya navnetewî were xwestin ku ew alîgiriya parastina mafê vegerandina xanî, xak û samanan, bikin. Ev yek jî di riya biryarên vegerandinê re. Gerek e endamên Encumana Ewlehiyê hewl bidin ku vê rolê bixin di nav operasyonên aşitiyê de.*

# Dîroka Tevgera Siyasî Ya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê

## (Beşa 2)

### Konferansa 1970'î bo yekirina her du baskên El-Partî

**Pêngava yekkirinê ya yekemîn di navbera "Çep", "Rast" û "serbixwe" yan de di konferansa 1970'î:**

Di 11'ê adara 1970'î de, pêşengtiya şoreşê li başurê Kurdistanê bi hikûmeta Ehmed Hesen El-Bekir re li hev kir, ew lihevkirin navê Peymana 11'ê Adarê hate lêkirin. Gelê kurd li hemû parçeyên Kurdistan û bi taybet li Rojava bi kêfxweşiyeke mezin ev peyman pêşwazî kir û Mele Mistefa Berzanî bû sembol û serokê efsanewî ji gelê kurd re. Hêjayî gotinê ye ku ew peymana yekemîn bû ku tê de hebûna gelê kurd û mafên wan di parçeyeke Kurdistanê de piştî hilweşandina Komara Mehabad, hate pejirandin. Di vê demê de, Pêşengtiya şoreşê û Mele Berzanî êdî ji bo rewşa siyasî vala bûn. Lewre jî Mele Berzanî hemû aliyên siyasî vexwendin bo lidarxistina kongreyeke neteweyî li başurê Kurdistanê taybet bi kurdên Sûriyê, bi armanca nîqaşkirin û çareserkirina nakokî û pirsgirêkên di navbera wan de, danîna pergala partiyeke siyasî ku hemû aliyan binimîne û damezrandina rêxistineke yekbûyî. Piştre wî vexwendname şande her du aliyên Çep û Rast û aliyeke sêyemîn ku bi navê Kombûna Bêlayan dihat naskirin û bi navê "serbixwe"yan jî dihat naskirin; ew jî berê endamên El-Partî bûn, lê ji nakokiyên Çep û Rast alînegir man û ji ber wan nakokiyan dûrî xebatên siyasî bûn û pejirandin ku li mal bimînin, piraniya wan feodalên kurd bûn.

Bi rastî, hemûyan Çep, Rast, aliyê sêyemîn û "alînegir"an vexwendina Berzanî ji bo amadebûna kongreya ku di havîna 1970'î de li gundê "Nawberdan" li başurê Kurdistanê hate lidarxistin, pejirand. Ew kongre 5 rojên lidûhev dewam kir, di roja dawî de, Mele Berzanî ji haziran re got: "Ne Çep û ne Rast xema me ye, niha ez dikim partiyeke siyasî ya yekgirtî û bi rêveberiyeke demkî ava bikim. Ew rêveberî dê partiyê 6 mehan bi rê ve bibe, piştre jî hûn ê kongreyeke damezrîner li dar bixin. Niha min 12 kes pejirand ji bo ku rêveberiya vê qonaxê bikin, ew kes jî ev in: Diham

Mîro/serokê reveberiya demkî, Şêx Mihemed Îsa, Selîm Haco, Sedîq ji Efrîn, Derwîş Mele Silêman, Yûsif Dîbo, Ismet Seyda, Behcet Mele Mihemed, Ristem Mele Mehemûd, Temir Mistefa, Îbrahîm Salih Sebrî û ya dozdemîn me navê wî nas nekir, lê dibe ku Şefîq Cebo bû".

Ew kes ji bo birêvebirina pêşengtiya qonaxî ya demkî ya partiya yekgirtî hatin erkdarkirin. Lê "ba li bêdera yekîtiyê nehat", berevajeyî vê yekê, piştî du mehan ji vegera wan li Rojava, li şûna ku partiyeke yekbûyî ava bikin, ew pêşengtî parçe bû û bû sê partî. Divê bê gotin ku çar kes li gorî daxwaza Mele Mistefa Berzanî li başurê Kurdistanê man (mîna hebsa malê) ji ber ku ew hatin tawanbarkirin bi astengkirina yekbûna partiyê û bûne sedemên nakokiyan, ew kes jî ev bûn: Selah Bedredîn, Ebdulhemîd Derwîş, Reşîd Hemo û Cegerxwîn.

Qonaxa duyemîn ji parçebûnê di salên heftêyî de:

Piştî ku endamên partiyê vegeriyan Rojavayê Kurdistanê, li şûna ku tevgera kurdî di bin yek alî de bibe yek partî, mixabin ew parçeyî sê partiyên ku ji yek partî (ya ku bi awayekî fermî di sala 1957'an de hate damezrandin) bûn; ew her sê partî ev in:

1-Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî).

2-Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî li Sûriyê.

3-Partiya Demokratîk a Kurdî "li Sûriyê" (Rast/Ebdulhemîd Derwîş).

Di lêgerînên me li ser sedemên biserneketina yekîtiya partiyê, hin rêberên kevn yên wê demê, yek ji wan Mihemed Salih Ebdo (ew jî endamekî rêveber di Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê de bû), da xuyakirin ku dema Berzanî ew gav ji bo yekîtiya partiyê avêt, ew li gorî projeyeke plankirî û tevdîrekirî ku bi navê Projeya Wiliyam Rojeres (wezîrê karê derve ya Emerîka wê çaxê) dimeşiya, ji bo ku belavbûna hizira çepî û ya komunîst li Rojava bisekinînin. Ji ber di wê salê de di 1971'an de, Enwer El-Sadat bû serokê Misrê, li Tirkiyê derbeyeke leşkerî pêk hat, her wiha şahê Îranê Şah Rida Behlewî hevkarê Emerîka bû wê çaxê û divê Tevgera Sererastkirinê jî neyê jibîrkirin ji ber ku ew weke derbeyek li hemberî Şepêla Çep di hundirê Partiya Baas de li Sûriyê bû. Xuya bû ku ew Projeya

Rojeres, ku aramanca wê têkbirina tevgerên çep û sosiyalîst, li gorî dilê Berzanî bû û bi piştgiriya Emerîka û şahê Îranê bû.

Vêca, Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) bû rêxistina sereke ya ku Berzanî îtiraf pê dikir û her du partiyên din weke partiyine ne rewa dihatin dîtin.

Rewşa tevgera siyasî wiha berdewam kir, yanî di rewşeke nakok û nelihevkirî heya binketina Şoreşa Mele Berzanî li başurê Kurdistanê di 6'ê adara 1975'an de, piştî Peymana El-Cezairê ya ku di navbera cîgerê serokê Îraqê Sedam Hûsên û şahê Îranê çêbû, bi riya hikûmeta Cezairê û serokê wê ya îroyîn Bûteflîqa ya ku wê demê serokê karê derve yê Cezairê bû.

Di sala 1973'an de, hikûmeta Sûriya di bin serweriya Hafiz El-Esad de projeyeke nijadperest di herêma kurdî (ya ku niha bi navê Kantona Cizîrê tê naskirin) meşand. Ew proje li ser xeta tixûbî ji Serê Kaniyê heyanî Eyin Dîwerê bi firehbûna 15 km û bêhtir, hate pêk anîn. Ew proje bi Projeya Kembera Erebî jî dihat naskirin, encamên wê heya niha hene bi rengê mêtingehên ereban ku hikûmeta Baas wan ji Reqa û Hewza Firatê anîn û bi armanca guhertina demografiya Herêma Cizîrê ew li wir bi cih kir. Hemû kurd û partiyên kurdî li dijî vê projeyê derketin. Ji ber ku Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) ku ji hinava pêşengtiya demkî di pêngava yekîtiya ku di sala 1970'î de çêbû derket, ew mîratgirê rewayî ya tevgera siyasî ya kurdî li Rojava bû ku Mele Berzanî piştgiriya wê dikir, lewre jî wê partiyê civîneke awarte li bajarê Helebê di sala 1973'an de li dar xist, ji bo ku bergirî û tedbîran bigirie da ku ew proje neyê pêkanîn, ji ber vê jî ev biryar dan:

1- Bi navê kurdan, belavkirin û weşandina belevok û pankartan li hemû aliyên Sûriya û bi taybet li Şamê li dijî pêkanîna Projeya Kembera Erebî.

2-Hinartina şandeyekê li gel Mele Berzanî da ku bi hev bişêwirin û nîqaş bikin bo rêgirtina li pêşiya pêkanîna vê projeyê di herêmên kurdî de.

3-Lidarxistina xwepêşandan û protestoyan li Beyrûtê li pêşiya baylozgeh û sefaretên navneteweyî ji bo şermezarkirina Projeya Kembera Erebî û keşifkirin û hetikandina wê projeyê li pêşiya raya giştî ya navneteweyî.

Li aliyê din, rêjîma Sûrî jî kampaniyeke binçavkirinê ji berpirsên El-Partî re pêk anî û gelek endamên wê girtin mîna: Xalid Mişayix, Diham Mîro, Emîn Golîn, her wiha gelek kesayetên din ji rêberên El-Partî girtin.

Ji ber kampaniya binçavkirinê ku gelek endamên El-Partî tê de hatibûn girtin, xala sêyemîn ji vê peymanê ya ku dibêje divê xwepêşandan li Lubnanê bêne lidarxistin, pêk nehat.

Lê xala duyemîn pêk hat piştî çûna şandeya ku ji Mihemed Şêx Baqî, Ilyas Remo û hineke din pêk dihat, li gel Mele Berzanî û hevdîtina wî. Lê di wê demê de, rewşa Berzanî û şoreşa kurdî pir dijwar bû, ji ber hikûmeta Îraqê xalên Hevpeymana 11'ê Adarê der barê xweseriyê de pêk neanî. Lewre jî Berzanî wan şîret kir ku dijî wê projeyê tênekoşin û bi hikûmeta Sûrî û Hafiz Esad re bi rengekî dostanî û aştiyane li hev bikin û bi wan re peyamek şand ji Mûse El-Sedir re (sekreterê giştî ya Hizbalah a Lubnanî wê demê) û jê xwest ku bi Hafiz Essad re biaxive da ku Projeya Kembera Erebî di herêma kurdî de bisekinîne. Name bi zimanekî nerm û dîplomatîk bû û gihaşte asta recayê jî.

Li gorî gotinê Cemal Şêx Baqî der barê bersiva Mele Berzanî li ser Projeya Kembera Erebî ji şandiyê re, Berzanî wiha got: " Em li Kurdistana Îraqê ne, tevî ku zêdetirî 100 hezar pêşmergeyên me hene û çiyayên me asê ne jî, lê projeya erebkirinê li Kerkûkê berdewam e û em nikarin rê li pêşiya wê bigirin. Hûn jî li rojavayê Kurdistanê, erdên we deşt in û tankeke artêşa Sûrî dikare bi hêsanî derbasî herêma we bibe û wê ji Dêrîkê heya Serê Kaniyê bi carekê de hilweşîne bêyî ku sûtemeniya (benzîn) wê biqede, ji ber vê jî tişta herî rast ku hûn bi hikûmeta xwe re li hev bikin". "Ji ber vê yekê, hizira berxwedanê dijî vê projeyê ji we re pir dijwar e. Divê hûn xwe ji vê hizirê dûr bixin û çareseriyên aştiyane bipejirînin, da ku hûn li hemberî vê projeyê bisekinin". Li gorî vê nerînê û piştî vegera şandeya El-Partî bo Rojava û veguhestina nameya jêdera kurdî li başurê Kurdistanê Mele Mistefa Berzanî ji endamên El-Partî li Rojava, wan ew nerîn erê nekir û dabeşî du nerînan bûn:

Ilyas Remo (Ilyas Remko) Hûrîk, Mistefa û Zekeriya, wan pêşniyara Berzanî qebûl nekir û daxwaz kir li dijî projeyê derkevin.

Şêx Mihemed Baqî, Hemîd Sîno, Xelîl Ebdî (Xelîl Soro), Mehmûd Hac sebrî, wan pêşniyara Berzanî erê kir.

Li vir, nakokî di navbera pêşengtiya El-Partî de derket. Piştî ku ew nakokî mezin bûn dîsa berê xwe da jêdera xwe li başurê Kurdistanê ji bo ku wan nakokiyan çareser bike. Li wir, Ilyas Remo, ji ber nerîna xwe, ji hêla Berzanî ve hate tawanbarkirin ku ew sîxurê hikûmeta Îraqê ye û ew neçar kir ku dev ji El-Partî berde û bi rastî jî istîfaya xwe ji El-Partî da. Tevî istîfaya Ilyas Remo ji El-Partî jî, nakokiyên di navbera El-Partî de nehatin çareserkirin û her çû dewam kir. Piştre hate xuyakirin, li gorî nerîna Cemal Şêx Baqî, ku Ilyas Remo ji ber piştgiriya malbata Haco û bi taybet Mecîd Haco jê re, wî ew helwest nîşan da. Her wiha helwesta Berzanî jî ku berxwedanî dijî Projeya Kembera Erebî red kir, bi armanca hêrsnekirina hikûmeta Sûrî bû nemaze ku di wê demê de dijbertiyeke mezin di navbera her du şepêlên Baas ya Sûrî û ya Îraqî de çêbû. Ji ber vê yekê Berzanî dixwest kaxeza kurdî li Sûriyê li gorî berjewendiyên xwe yên siyasî bi kar bîne û di riya wê re, li ser pişta doza kurdî li Sûriyê, nêzîkî hikûmeta Hafiz Essad bibe.

Piştî têkçûna Şoreşa Berzanî, pêşengên El-Partî li Sûriyê bi pêşengtiya Mihemed Şêx Baqî pêşniyar kir ku di 15'ê hezîrana 1975'an de konferansek li Şamê bê lidarxistin. Ilyas Remo û malbata Haco tê de ne hazir bûn. Di wê konferansê de biryar hate dayîn bi qutkirina hemû têkilî bi başurê Kurdistanê re, tekezkirin li ser serxwebûna biryarên El-Partî di hundirê Sûriya de, çareserkirina hemû kêşe û pirsgirêkên bi hikûmeta Sûriya re dûrî şêwrîn û têkiliya tu kesî û divê pirsgirêka wan li Şamê bê çareserkirin ne li Erbîl an li Kerkûkê her wiha guhertina navê El-Partî bo Partiya Demokratîk a Kurdî-Sûriya yanî daçeka "li" hate rakirin, ji ber ku dida xuyakirin ku kurd kêmneteweye ne miletek li ser ax, erdnîgarî û dîroka xwe dijîn; lewre jî tîpa "li" hate rakirin ji bo ku bê xuyakirin ku kurd parçeyeke resen e û li ser axa xwe ya dîrokî di Sûriya de dijîn. Di encama hilweşandina şoreşa li başurê Kurdistanê, gelek parçebûn di Partiya Demokratîk a Kurdistanî çêbû, ku encamên wê bandor li tevgera kurdî li Sûriyê jî kir. Partî li Îraqê dabeşî sê parçeyan bû:

Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Îraqê (komîteya amadekar) bi pêşengtiya Elî Şengalî.

Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Îraqê (komîteya damezrîner) bi pêşengtiya Dr.Mehmûd Osman.

Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Îraqê (rêveberiya demkî) bi pêşengtiya Mesûd Berzanî û Samî Ebdulrehman, ku kongreyek li Londonê di sala 1976'an de li dar xist.

Di heman salê de, Haco, Samî Ebdulrehman li bakurê Kurdistanê li Cizîra Botan "Şirnax" dibîne û peyamekê ji Samî Ebdulrehmen û Mesûd Berzanî re tîne. Di peyamê de tê gotin ku baska Mecîd Haco ew partiya rewa ye ku ji hêla PDK'ê û Berzanî ve piştgirî û itîraf pê tê kirin. Mecîd Haco bi sedan kopî ji vê peyamê çap dike û li gelê kurd û kadirên partiyê belav dike. Lewre jî, gelek kadir û bingehên partîtî xwe ji Şepîla Mihemed Şêx Baqî vedikşînin û tevî Mecîd Haco û Ilyas Remo dibin.

Bi vî rengî partî parçe bû û Ilyas Remo bû sekreterê Partiya Demokratîk a Kurdî –Sûriya û bi vê yekê bû partiya rewa û piştgirtî ji hêla malbata Berzanî ve. Partî parçeyî du partiyên siyasî bû:

Partiya Demokratîk a Kurdî-Sûriya (baskê Ilyas Remo).

Partiya Demokratîk a Kurdî – Sûriya (baskê Mihemed Şêx Baqî)

Ji wê dîrokê û heya îro ew perçebûn dewam e, bi awayekî ku êdî mirov nema dikane navê wan partiyan ezber bike. Di encama destwerdanên dervayî carinan û carinan jî destwerdanên Ewlehiya Sûrî, ew parçebûn û dabeşbûn di refên tevgera siyasî ya kurdî de çêbûn.

Lê baska birêz Telebanî "Yekîtiya Niştîmanî ya kurdistanî" li Şamê dadimezrîne bi pêşengtî û pîrozkirina hikûmeta Sûriyê di nîviya salên heftêyî de. Şepêla Ebdulhemîd Hac Derwîş a ku navê wê bû Partiya Demokratîk a Pêşverû -Sûriya bi şepêl û hevbendiya Telebanî re hemaheng bû.

Her wiha Partiya Demokratîk a Kurdî (baska Ilyas Remo "malbata Haco") bi şepêla Partiya Demokratîk a Kurdistanî bi pêşengtiya birêz Mesûd Berzanî re hemaheng bû.

Selah Bedredîn bû sekreterê Partiya Çep a Kurdî – Sûriya û hemaheng bi tewereya tevgera Felestînî di qada Lubnanî de û bi tewreya "Eniya Elred bilzat" ya ku ji van eniyan pêk tê, kir:

Eniya Demokratîk a Rizgarkirina Felestîn bi pêşengtiya Nayif Xewatima.

Eniya Gelerî ya Rizgarkirina Felestînê bi pêşengtiya George Hebeş, ew enî piştgiriya wê ji hêla sedam Hûsên û Baasa Îraqê ve ya dijberê gelê kurd li başurê Kurdistanê û Îraqê, dihat kirin.

Di 1'ê çileya 1975'an de, partiya Çep a kurdî kongreyek li Beyrûtê li dar xist bi serperişetiya Eniya Gelerî ya Rizgarkirina Felestînê bi serokatiya George Hebeş. Ew jî piştî nakokiyên di navbera Selah Bedredîn û pêşengên partiyê ku bi sedema dijbertiya Selah Bedredîn ji şoreşa kurdî li Îraqê re û helwestên wî yên neyînî li hemberî şoreşê heta têkçûna wê. Di wê kongreyê de koma Ismet Seyda û Yûsif Dîbo kiryar û reftarên Selah Bedredîn û hevkariya wî bi saloxgêrên Îraqê beramberî bertîlên Baasa Îraqê, eşkere kir, di riya sîxurekî ji kurdên Îraqê bi navê " Ebdulcebar". Piştî eşkerekirina razan ji hêla Ismet Seyda û Yûsûf Dîbo ve ji hemû endamên pêşeng ên ku di kongreyê de hazir bûn, Selah Bedredîn hate qewitandin bi tawanbariya xiyaneta mezin û sîxurî ji rêjîma Îraqê re. Piştre hemû endamên pêşneg di Partiya Çep a Kurdî de li ser belgenameya qewtandina Selah Bedredîn bi tawanbariya xiyaneyta mezin, îmze kir. Yekemîn kes li hemberî wê belgenameyê îmze kir Misteafa Cuma bû, yê ku piştre ji îmzeya xwe vegeriya û got:

"Ez weke ku nîv razayî bûm û bêhemdî xwe bûm dema ku min biryara qewtandina Selah Bedredîn erê kir". Piştî wê, sedema vegera Mistefa Cuma ji biryara îmzeyê hate naskirin, Mistefa Cuma ditirsiya ku li ser destê Selah Bedredîn li Beyrûtê bê kuştin ji ber ku ew jî wê demê li Beyrûtê rûdinişt.

piştre, Ismet Seyda bû sekreterê Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê, ji sala 1975'an heyanî ku jiyana xwe ji dest da di sala 1989'an de.

Di sala 1982'yan de, dema destwerdana Îsraîl li başurê Lubnanê, Selah Bedredîn bi dizî derbasî Sûriya bû û li Şamê rûnişt; derbasbûna wî li Şamê bû xaleke ji gotûbêjên mezin di hawîrdora partîtî de bû sedema derbasbûna wî jî girêdayî hevkariya wî bi rêjîma Îraqê ya dijberê rêjîma Sûrî bû.

Piştî koça dawî ya Ismet Seyda, Yûsûf Dîbo bû sekreterê partiyê di sala 1989'an de heyanî sala 1997'an, piştî wê jî Mihemed Mûsa bû sekreterê partiyê û heyanî roja îro.

Di sala 1993'an, Xêredîn Murad ji Partiya Çep cuda bû û partiyeke nû damezrand û bû serokê wê partiyê.

Piştî ew parçebûnên ku di nav refên wan partiyan de çêbûn, êdî her partiyek navek li xwe kir û navnîşanek ji xwe re çêkir, bo ku partiya xwe ji partiyeke din cuda bike, ji ber vê yekê jî tevgera siyasî li Sûriyê kete tevliheviya navên wekhev û zêdekirina navê sekreterê bo ku cewhera her partiyekê bê naskirin.

Dîroka Tevgera Siyasî ya Kurdî di navbera 1980-2010'an de:

Serweriya Sûrî (Hikûmeta Partiya Baas) sûd ji nakokiyên di nava refên tevgera siyasî ya kurdî de ku di nîviyê duyem ji sedsalan bîstan de pêk dihatin, digirt. Lewre jî hemû projeyên xwe yên awarte û yên erebkirinê li herêma kurdî mîna "projeya serjimariya awarte û kişandina regeznameya sûrî ji deh hezarên kurdan, projeya Kembera Erebî li Herêma Cizîrê" pêk dianîn. Her wiha komek zagonên neteweperest der barê ziman û çanda kurdî de derxist û siyaseta bêparmayîn û xizaniyê li herêmên kurdî meşand. Partiyên tevgera siyasî ya kurdî di wê demê de wisa man û bi rewşa hundirîn a partiyên Kurdistanî li başurê Kurdistanê bandor bibûn û mabûn dîlên nakokiyên kesane yên ku di navbera serokên wê de derdiketin. Her wiha hin rêberên mîna Selah Bedredîn û kesên din siyaseta parskirina madî ji hin rêjîmên ku Kurdistanê hikum dikir dewam kir û man ajan di destê wan rêjîman de.

**Çepa Kurdî:**

Di 15'ê sibata 1980'î de, hevpeymanek di navbera sê rêxistinên kurdî li Sûriyê de çêbû: Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê (bi rêbertiya Hamîd Hac Derwîş), Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (bi rêbertiya Şêx Mihemed Baqî û Şêx Mihemed Îsa) û Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê (bi rêbertiya Îsmet Sîda). Ew her sê rêxistin bi têkiliyên xwe yên xurt bi Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanî li Îraqê bi serokatiya Celal Telebanî re, dihatin naskirin.

Ji van her sê partiyan tenê Partiya Çep a Kurdî bi hizira Markisî-Lênînî ve pêbend bûn; Partiya Çep dixwest rêbertiya wê hevbendiya sêalî bike li gorî prensîpên komînîst di hevbendî û eniyan de. Lê li gorî ku hate xuyakirin, Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê li cem alîgirê

hevbeş (Celal Telebanî) xwedî cihekî giran bû û ji ber sedemên din jî, diyar bû ji milet û bingehên rêxistinî re ku Ebdulhemîd Hac Derwîş ji nav hemûyan de kesê herî aktîv û çalak e. Ev tişt jî endam û hin berpirsên Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê bihêrs kir û sekreterê wê yê giştî Îsmet Seyda tawanbar kir ku ew di bin destê Telebanî de ye û nikariya rêbertiya Partiya Çep bike. Lewre jî şepêleke dijber ji rêbertiyê re di hundirê vê rêxistinê de hate damezrandin bi rêbertiya Sebxetalah Hêzanî yê ku ji Amûdê bû û dermansaz Ebdî Nasan ji Kobanî piştgiriya wî dikir.

Lê Sebxetalah Hêzanî (û kesên li dora wî) nekarîbû hemû endamên rîbertiyê li dor xwe kom bike. Her wiha didît ku rêbertî hîn tênegihiştiye hizira Markisî-Lênînî û divê ku partî dest bi kursên xwendinê bike ji bo ku partîzan karibin tê de hizira Markisî-Lênînî baş bixwînin; piştî bidawîkirina perwerdeyê jî divê dest bi karê siyasî bikin.

Sebxetalah Hêzanî, xeta partiyê (ku ew bi xwe di pêşengtiya wê d ye) tawanbar kir ku ji alîkî ve bi hikûmetê re hevkar û alîgir e, ji alîkî din ve jî bi Telebanî re alîkar e. Her wiha wî gelek pêşniyar pêş xistin bo bidestxistina daxwazên kurdan ên neteweyî li Sûriyê û guhertina şêweyên têkoşînê yên kevnare ku bêsûdbûna wan hatin xuyakirin. Lewre jî, Sebxetalah Hêzanî bi hemû rêxistinên kurdî û yên din re têkil bû da ku sekreterê giştî yê partiyê bihetikîne.

Di dawiya kampaniya xwe ya propagandayî de û piştî ku Hêzanî hejmarek baş ji endamên bingehîn ên partiyê qenzenc kir, ji hin xalên sereke ku di kampaniya parçebûnê de ragihandin, vergeriya. Her wiha di civîneke berfireh ji endamên partiyê re da xuyakirin ku dayîna kursên perwerdehî planeke ne pratîk e û pêkanîna wê tê wateya rawestandina xebatên rêxistinî. Hêzanî bersiva xwazkerekî ku daxwaza çesipandina armancên neteweyî kir da û got ku hemû endam berê ji hêla hikûmetê û serokatiya kevn ve hatine nasîn û heke li ser van daxwazan bêne tekez kirin dê hikûmet wan bigire û biavêje zindanê.

Di dawî de, hemû endamên cudabûyî kongreyek bi navê Kongreya Şeşemîn a Partiyê ji 29'ê îlonê heya 1'ê cotmeha 1982'an de li dar xist û naveke nû li rêxistinê kir “ Partiya Kedkarên Kurd li Sûriyê" û Sebxetalah bû sekreterê giştî yê wê partiyê û dest bi weşandina rojnameya xwe ya

navendî “Dengê Kedkaran" û kovarek bi navê “Rê", kir. Mirov dikare bibêje ku ji hêla îdeoolojî ve tu guhertin çênebûn û daxwazên wan wek xwe man.

Selah Bedredîn di navbera parsekirina siyasî û hêviya wî di pêşengtiya Çepa Kurdî de.

Beriya derbasbûna Selah Bedredîn li Sûriyê- bi hevkariya Mistefa Cuma- û di dema mayîna wî li Sûriyê jî, hewl da hin hogirên xwe li derdora xwe kom bike bi armanca damezrandina partiyeke nû bi navê Partiya Gelerî ya Kurdî li Sûriyê di navbera salên 1980-1982'yan de.

Di destpêka salên 90`de, Partiya Kedkaran bi projeya “Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî" re bibû yek û Partiya Çep/baskê Ismet Seyda riya xwe dewam kir. Piştî mirina Ismet Seyda di sala 1989'an de, Yusuf Dîbo bû serokê partiyê û di sala 1993'yan de Partiya Çep dabeşî du partiyan bû: ya yekem bi pêşengtiya Mihemed Mûsa Mihemed û ya duyem jî bi pêşengtiya Xêredîn Murad bû.

Serokatiya Bedredîn ji “Partiya Yekîtiya Gelerî" re heyanî sala 2003'yan dewam kir. Piştî wê, istîfaya xwe da ji ber partî gihaşte astekê ji îflasa siyasî, nemaze piştî cudabûna endamên di asta bilind de ji partiyê mîna Hesen Salih, Fûad Elîko, Ebdulbaqî Yûsif û Sa'idedîn Mele yên ku di 1990'î de partiyek bi heman navê damezrand. Piştî wê jî tevlî projeya “Partiya Yekîtiya Demokratîk 'Yekîtî' " bûn. Îcar, Bedredîn dev ji partiyê berda ji bo ku alîkariya Mistefa Cuma bike, yê ku di cihe de rastiya partiya xwe ya lawaz nas kir. Lewre jî di 21'ê gulana 2005'an de projeya yekbûna “Partiya Yekîtî ya Gelerî” bi “Partiya Çep/baskê Xêredîn Murad” re di bin navê “Partiya Azadî ya Kurdî li Sûriyê" û di bin pêşengtiya Xêredîn Murad de, erê kir.

Di encamên peywendiyên Selah Bedredîn yên berfireh bi Rêxistina Felestînî û saloxgêrên Sûrî û Îraqê re, Partiya Demokratîk a Kurdistanî-Îraq bi rêbertiya Mesûd Berzanî şand pey wî û kir şêwirmendê xwe; ji bo ku sûd ji peywendiyên wî bigire û wî dûrî hûrgiliyên tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê bike. Ji ber ku Bereznî her tim hewl dida El-Partî li rojavayê Kurdistanê ji xwe re bike destê rastê bo ku ajendayên xwe pêk bîne.

Selah Bedredîn bawer dikir ku encamên damezrandina Partiya Azadî dê di xizmeta wî de bin û dê xwe di hundirê tevgera siyas de bi cih bike. Lewre

jî ji destpêkê ve piştgiriya vê projeyê kir. Lê Xêredîn Murad karîbû di demeke kin de gelek alîgirên Yekîtiya Gelerî dûrî rêxistinên partîtî bike nemaze li Ewropa. Piştî kampaniya Xêredîn Murad a dijî endamên Yekîtiya Gelerî li Dervayî Welat, rojnameya navendî ya partiyê weşanên xwe yên ku bi hejmarekî mezin li başurê Kurdistanê dihatin çapkirin, sekinand. Her wiha nivîsên Selah Bedredîn yên ku di rûpela yekemîn de dihatin weşandin jî, sekinîn.

Bi rastî nakokiyên di hundirê Partiya Azadî de di navbera alîgirên Çep bi serokatiya Xêredîn Murad û Yekîtiya Gelerî bi serokatiya Mistefa Cuma di çarçoveya hewldanên wan bo ku hejmareke mezin ji desteyên partiyê bi dest bixin de bû, beriya lidarxistina kongreya yekbûnê ku her du alî li hev kir di gulana 2006' an de bihata lidarxistin,.

Di kongreya yekemîn ya partiyê de ya ku di 17-19 gulana 2006'an de hate lidarxistin, hilbijartineke dirûvî ji bo serokatiya partiyê hate çêkirin, di wir de Xêredîn Murad hate hilbijartin û bû serokê partiyê, encamên hilbijartinê bi vî rengî bûn:

Xêredîn Murad 75 deng.

Mistefa Cûma 30 deng.

Beşar Emîn 10 deng.

Di encama kampaniya Xêredîn Murad a dijî alîgirên “Yekîtiya Gelerî” û tevlîheviyên ku di hundirê şepêla çep a partiyê de çêkir, veguhestina rûniştina wî bo Nerwêc û dijderketina hin rêxistinên mîna“Rêxistina Xwendekarên Partiyê” di Zanîngeha Şamê de, di encamên vê yekê de çalakiyên partiyê yên hundirîn sekinîn û partî dabeşî gelek koman bû.

Selah Bedredîn dîsa hewl da xwe wek yek ji stûnên tevgera siyasî ya kurdî berz bike û projeyek bi navê “Koalîsyona Yekîtiya Hêzên 5'ê Tebaxê" yan jî “Koalîsyona Yekîtiya Çep a Kurdî” çêkir. Lê ew proje tu piştgirî ji hêzên ku li ser Şepêla Çep dihesibandin mîna Partiya Yekîtî, Partiya Azadî û Şepêla Pêşerojê, nedît. Lewre jî ew hewldana Selah Bedredîn careke din bi bin ket.

Di destpêka salên 80`ê ji sedsala bîstan de, “Partiya Sosiyalîst a Kurdî li Sûriyê” di sala 2002'yan de bi serokatiya Salih Gedo hate damezrandin. Ew

partî bi “Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî” re bû yek bi serokatiya Ebdulhamîd Derwîş. Lê ji ber ku Derwîş di girtina biryaran de tu girîngî nedida wan, di cih de Salih Gedo û hevalên wî xwe vekişandin. Gedo weke siyasetmedarekî serbixwe dixebitî heya lidarxistina kongreya sala 2008'an ya “Partiya Çepa Kurdî li Sûriyê” ku tê de tevlîbûna Salih Gedo û hevalên wî li partiyê hate ragihandin û Gedo bû cîgerê Mihemed Mûsa sekreterê partiyê.

Di dawiya sala 2008'an de, Mihemed Mûsa ji ber çalakiyên partiyê hate girtin û 3 mehan hikum xwar, lê ew nekete zindanê ji ber her sê mehên di lêpirsînê de ji dema hikum jê re hate hesbandin. Tevî wê jî careke din di 9'ê tebaxa 2009'an de ew hate binçavkirin û 21 rojan di zindanê de ma heta ku di 31'ê tebaxa 2009'an de hate berdan.

**Rasta Kurdî**

Di salên 1978-1982'yan de, Heleb aloziyeke siyasî ji aliyê rast û çep ve jiyan dikir. Ew bajar piştî Hema bû navenda duyemîn a radîkalên îslamî. Di wê demê de, “Hevgirtina Karê Kumînîst” di nav refên xwendekarên Zanîngeha Helebê de kar dikir û rêxistinên Nasirî nemaze Yekîtiya Sosyalîst ya ku Dr. Cemal Etasî serkêşiya wê dikir, bi armanca vegerandina cihê xwe ya çalak a di salên şêstî de, ji nû ve çalak dibûn. Her wiha endam û rêxistinên alîgirên Îraqê hewl didan sûd ji rewşa bajêr a lihevketî bigirin bo ku bikin navenda duyem ji propagandayên xwe re piştî Dêra Zorê, bi armanca vegerandina şan û rûmeta “Partiya Gel" a di salên çilî de, da ku Sûriya têxin bin serweriya Îraqê de.

Weke tê zanîn, piraniya partiyên kurdî rêxistinên xwe yên partîtî di nav refên xwendekar û karkerên kurd li Helebê de hebûn. Nemaze ji ber ku herêmeke kurdî ya mezin (Efrîn) girêdayî vî bajarî ye û tiştekî normal e ku xwendekrên kurd ên partîzan bi pêşveçûnên îdeolojî û siyasî ku li wî bajarî diqewimin, bandor bibin. Dibe ku ew jî yek ji sedemên ku parçebûna “Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê” hêsan kir ku bû du parçe (Kemal û Alî) di sala 1981'an de.

Der barê “Partiya Demokratîk a Pêşverû li Sûriyê” de (Ebdulhemîd Derwîş), rêxistina wê li Helebê di sala 1980'î de hin name û raoprên siyasî şandin ji pêşengtiyê re.Tê de xuya kir ku hin endamên wê ji xwendekarên

Zanîngeha Helebê daxwaza pêbendî bi Markisî kiriye. Hin kes di pêşengtiyê de gotin ku ew mijar hetanî lidarxistina kongreyê taloq kir.

Di dema amadekariyên ji kongreya sala 1982'an de, Rêxistina Helebê dijbertiyeke xuyayî dijî pêşengtiyê kir û biryarnameyên partiyê yên ku Reşîd Hemo (rêberê herî temen mezin û xwedan hêzdarî li bal sekreterê giştî) derxistin, red kirin. Di encamê de, bersiva rêbertiyê pir tund bû û piraniya (belkî hemû jî) endamên Rêxistina Helebê qewitandin.

Li gorî gotinên endamên qewitandî, nakokiyên wan siyasî û îdeolojî bûn ji ber ku wan dixwest zextê li ser partiyê bikin da ku bi Markisî ve pêbend be û daxwaza mafê çarenûsiya gelê kurd li Suriya bike (ne mafên demokratîk ên kêmneteweya kurdî ku pêşengtî daxwaza wan dikir). Lê pêşengtî digot ku sedemên nakokiyê rêxistinî ne. Her wiha angaştên îdeolojîk ên ku endamên qewtandî qalê dikir tenê bihane bûn ji dijbertiya wan ji rêbazên rêxistinî û rêziknameya partiyê re.

Çawa be, “Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî” gelek endamên xwe ji dest berda di dema ku pêwîstiya wê bi wan hebû, nemaze ku ew partî diviyabû Rêxistina Helebê careke din bi temamî bi dest xistibana. Der barê endamên qewtandî de jî, wan hewl da xwe di qalibekî nû de bi rêxistin bikin, lê ew bi ser neketin ji ber tunebûna yekîtiyeke îdeolojîk an jî planeke siyasî hevbeş di navbera wan de. Li vir, hinek ji rêxistinê derketin bo ku xwe ji karê siyasî vehesînin û ev derfet ji wan re guncav bû, û hin jî ji Reşîd Hemo hez nedikir lê bi xeta rêbertiyê re li hev dikir. Lê hineke din derfeta guhertina rêbazên partiyê û şoreşkirina rêxistinê didîtin, hineke din jî pêwîstiya avakirna rêxistineke Markisî-Lininî didîtin ku ji têkoşîna gelê kurd li Sûriyê re guncav be bo bidestxistina mafê çarenûsiyê. Di dawiyê de, ew kom belav bû û êdî tu girêdan di navbera wan de nema ji nîviya sala 1984'an ve.

Di salên notî ji sedsala bîstan de, hin nakokî di hundirê Partiya Pêşverû de çêbû û komeke muxalif dijî sekreterê partiyê ava bû. Lê nakokî di navbera wê kombûnê de derket û dabeşî du parçeyan bû. Yek navê wê bû “Partiya Demokratîk a Niştîmanî li Sûriyê” bi pêşengtiya Tahir Sifûk û ya din jî navê wê weke xwe ma “Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî” bi

pêşengtiya Ezîz Dawî, yê ku di sala 2008'an de navê wê guhert bo “Partiya Wekhevî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê”.

Der barê Partiya Pêşverû baskê Ebdulhemîd Derwîş de, di salên 2008 û 2009'an de helwesta wê pir lawaz bû piştî ku ji hêla nivîskar û serbixweyan ve hate rexnekirin. Ew yek jî piştî hetikîna gendeliya diravî ya ku di bîroya partiyê li Silêmaniyê de pêk hat “Hetîketiya bîroya Pêşverû li Silmaniyê -ya ku Elî Şemdîn ew bi rê ve dibir- bi dizîna pereyên xwendekarên kurd ên sûrî yên ku li Silêmaniyê dixwendin” û hetîketiya hinartina Ebdulhamîd Derwîş ji nameyeke gefî ji Ewlehiya Sûrî bo serokên Kurdistana Îraqê re. Her wiha ew bû sedema parçûna hevbendiyê û dijî serhildana 2004'an derket. Dîsa jî ew dijî rojnemevan û çepemeniya kurdî derket, piştî ku nivîskar Mihemed Cuma gotareke rexneyî û reformî di 7'ê gulana 2007'an de di bin navê (Rastiya Rakirina Parçebûnê Di Hevbendiyê De) di sîteyên kurdî de û ji nav wan jî sîteya fermî ya Partiya Demokratîk a Kurdî (El-Partî) baska eniyê, weşand. Ebdulhemîd Derwîş dît ku ew gotar weke ku nîvîskar sînorên xwe derbas kirin nemaze piştî ku El-Partî di malpera xwe ya fermî de weşand. Di cih de, Derwîş daxuyaniyek ji Ebdulhekîm Beşar xwest bo ku jê re vê bûyerê zelal bike. Beşar bersiva wî da û got ev tişt bê haya wî bû û ferman da ku daxuyaniyek bê belavkirin û lêbûrînek li ser sîteya fermî ya El-Partî bê weşandin di 14'ê gulana 2009'an de. Piştî kişandina gotara Mihemed Cuma ji sîteyê, roja din di 15'ê gulanê de, Ebdulhemîd Derwîş û partiya xwe kampaniyeke tund dijî nivîskarên ku nivîs û gotarên rexneyî, reformî û muxalif diweşînin, li dar xist. Lewre jî “Rojnameya Demokrasî” di gotara xwe ya destpêkê ya bi navê “Bila Em Dijî Kampaniya Tund Ya Reşkirinê Derkevin” hemû partî û sîteyên ragihandinê yên kurdî vexwendin bo hevkarî û hevrêziyê bikin, da ku dijî hemû dengên dijber û nivîskarên serbixwe derkevin. Her wiha rojname ew weke tawanbar wesif kir û ew tawanbar kir ku armanca wan tunekirina siyasî ji pêşengên wan re ye.

El-Partî parçebûn di her kongreyekê de

Di sala 1980'î Kemal Ehmed Axa (karmendekî di Nîvîsgeha Tomarkirina Xanûberan (tapo) li Qamişlo bû) bû sekreterê giştî ya Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî). Di cotmeha 1981'an de, hilbijartinên parlemanterî yên duyemîn di serdema Hafiz Esad de dest pê kir. Partiya Demokratîk a kurdî li Sûriyê bi pêşengtiya “Kemal Ehmed Axa” daxuyaniyek belav kir û tê

de kurd vexwendin bo ku beşdarî hilbijartinên parlemanterî bibin û mafên xwe di hilbijartinan de pêk bînin. Lê yek ji endamên bîroya siyasî ya vê partiyê “Mihiyadîn Şêx Alî” - ku di rêxistina partiyê de li Efrînê xwedî hêzeke mezin bû - belavokeke dijberî pêşengtiya partiyê belav kir. Tê de daxwaz kir ku hilbijartinên ku di atmosfereke demokratîk de nehatine amadekirin û ne jî pêk tên, bêne boykutkirin. Her wiha gelek kurd ên ku nasnameya sûrî ji wan hatibû vekişandin dê bi çi nasnemeyê dengê xwe bidin? Şêx Alî belavoka xwe ya dijberî biryara pêşengtiyê bi vî rengî belav kir û di encamê de partî bi awayekî pratîkî parçe bû.

Lê serokê giştî yê partiyê “Kemal Ehmed Axa" Samî Ebdulrehman (yê ku ji Partiya Demokratîk a Kurdistanî - Îraq bi pêşengtiya Mesûd Berzanî, veqetiya), tawanbar kir ku ew piştgiriya Şêx Alî dike û wî sor dike ku ji partiyê cuda bibe da bibe hevkarê wî li Sûriyê.

Bi vî rengî Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) bû du partî bi yek nav, yek ji wan alîgirê Mesûd Berzanî û ya din jî alîgirê Samî Ebdulrehman bû. Her du rêxistin weşandina rojnameya navendî “Dengê Kurd” berdewam kir û di sala 1983'yan de, kongreya xwe bi pêşengtiya Şêx Alî li dar xist. Tê de navê rêxistinê guhert bo “Partiya karê Demokratîk a Kurdî li Sûriyê” û hizira Markis-Lênîn ji xwe re kir bingeh.

Di sala 1984'an de, piştî kongreya çaremîn a partiyê, parçebûnek di nava refên El-Partî de çêbû ji hêla hin kesayetên rewşenbîr ên ku dixwestin bi hizira Markis-Lênîn ve pêbend bin. Ew kesayet di mala xwe de man heyanî veqetîna Îsmaîl Omar ji partiyê di sala 1988'an de û beşdarî partiya wî bûn. Ji ber peywendiyên di navbera wan û Îsmaîl Omar de di dema dûrxistina wan ji partiyê qut nebûn û bi eşkere ew tişt didan xuyakirin. Hêjayî gotinê ye ku parçebûna di sala 1988'an de bi pêşengtiya Îsmaîl Omar bi awa û hejmara xwe pir balkêş bû û heke ne piştgiriya Partiya Demokratîk a Kurdistanî- Îraq ji Kemal Ehmed re ba, dê partî parçeyî du beşên wekhev bibana. Lê destdayîna “Partiya Demokratîk a Kurdistanî-Îraq” bandoreke mezin li ser alîgirên Kemal Ehmed kir û hejmara alîgirên parçebûnê kêmî nîviyê alîgirên wî kir, her wiha serweriya wî li hin herêman kêm kir.

Di sala 1996'an de, Kemal Ehmed koça dawî kir û komîteya navendî ya partiyê û bîroya siyasî civiyan û “Nesredîn Ibrahîm” weke sekreterê nû ji partiyê re hate hilbijartin. Nesredîn rêveberiya partiyê kir heyanî kongreya sala 1999'an, piştî wê hevalên wî di rêveberiyê de komployeke hundirîn dijî wî çêkir bo ku ji sekreteriya partiyê rakin û sekreterekî din ji dervayî partiyê li şûna wî deynin. Di encamê de, partî parçeyî du partiyan bû, ya yekemîn bi pêşngtiya Nezîr Mistefa û ya din bi pêşengtiya Nesredîn Ibrahîm bû. Partiya yekemîn piştgiriya wê ji hêla Partiya Demokratîk a Kurdistanî- Îraq ve dihat kirin.

Di sala 1998'an de, nakokiyeke din di hundirê partiyê de derket û beriya lidarxistina kongreya partiyê, hilbijartinên hundirîn çêbûn û kombûna “Siûd Mele û Ebdulhekîm Beşar” piraniya dengan di komîteya navendî de bi dest xistin. Lê kombûna Ebdulrehmen Alûçî piraniya dengan di komîteya navxweyî û herêmî de bi det xist. Lewre jî kombûna yekemîn encamên hilbijartina komîteya navxweyî û herêmî red kir. Sekreterê partiyê Nezîr Mistefa biryar da ku encamên hilbijartinê bêne betalkirin. Di encamê de, Alûçî ew biryar red kir û kombûna wî derveyî partiya mak ma û pêşengtiya wê li ser nerewabûna baska Alûçî, tekez dikir. Piştî wê ew bask bû “El-Partî ya Demokratîk a kurdî- Sûriya" û Ebdulhekîm Beşar di sala 2007'an bû sekreterê nû ya partiyê.

Partî di sala 2009'an de, parçebûnek di hundirê kombûnên partî yên sereke de “Ebdulhekîm Beşar, Siûd Mele, Mihemed Îsmaîl, Nesredîn Berhek” çêbû. Yek ji wan aliyan kesayetek li ser sîteyên eleketronîk bi nasnav “Lewend Mele” derxistin holê. Lewend Mele tekez dikir ku ew pêşengtiya şoreşeke reformî ya spî di hundirê partiyê de dike. Armanca wê sererastkirina riya partiyê û qewtandina Ebdulhekîm Beşar bi sedema gelek bihaneyan ji wan: veger ji helewsta partiyê li pêşiya hikûmetê û nêzîkatiya wî ya kesane ji Ebdulhemîd Derwîş re.

Ebdulhekîm bi naskirina nasnameya “Lewend Mele” ve mijûl bûbû, her wiha gelek kesayetên serbixwe daxwaz kir ku Lewend Mele nasnameya xwe ya rastîn eşkere bike.

Di destpêkê de, Ebdulhekîm bawer dikir ku Lewend Mele ew Siûd Mele bi xwe ye, piştre jî rojnemevan Lewend Hisên tawanbar kir ku ew Lewend

Mele ye. Lê Lewend Hisên ew tişt di daxuaniyekê de red kir. Di dawiyê de, Ebdulhekîm heman awa bi kar anî û kesayetek bi heman navî “Lewend Mele” li ser sîteyên enternetê afirand û wî Xalid Kemal Ehmed (endamê berê yê bîroya siyasî ya partiyê), Mihemed Îsmaîl û Nesredîn Berhek tawanbar kir ku ew li pişt “Lewendê Muxalif" in. Piştre jî baska Ebdulhekîm Beşar gelek gotar bi navên tevgerî weşandin û lîsteyek bi navên kesên ku di kombûna dijî Ebdulhekîm Beşar dixebitîn, weşand. Di wê lîsteyê de 14 navên pêşengên partiyê weşandin, ji wan: Mihemed Îsmaîl, Nesredîn Berhek, Emîn Golîn û Xalid Kemal Ehmed.

Di mijdara 2009'an de, Lewend Mele yê rikber eşkere kir ku Hekîm belavokeke partiyê ya hundirîn weşand û tê de diyar kir ku di partiyê de diyardeyên kombûn, dijbertî û eşkerekirina razan derketine. Her wiha wî soz da ku dijberan ceza bike û nîşan da heke partî li rastî parçebûnê hat, wê çaxê dê rewabûn di destê sekreterê partiyê de be.

Lê Lewendê “Alîgir” tişta ku Lewendê “Rikber” gotibû neyînî kir û tekez kir ku parçebûn di partiyê de tune ye û rapora hundirîn tenê qala pirsgirêkên partiyê ji destpêka damezrandina wê heyanî kongreya gulan 2007'an ve, dike.

Der barê Partiya Demokratîk a Kurdî ya Sûrî de, damezrînerê wê Mihemed Baqî Mele Mehmûd (yê ku bi navê Şêx Baqî dihate naskirin) di 5'ê gulana 2008'an li bajaroka Şaaba (li derdora Şamê) jiyana xwe ji dest da, piştî wê kurê wî Cemal Şêx Baqî bû sekreterê partiyê.

Partiya “El-Wehda” Yekîtî .û veqetîna Partiya “Yekîtiyê” jê

Di sala 1990'î de, her du partî “Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî)” baska Îsmaîl Omar û “Partiya Kar a Demokratîk a Kurdî” bi pêşengtiya Mihiyadîn Şêx Alî yên ku ji El-Partî cuda bûn, bûne yek partî bi navê “Partiya Kurdî ya Demokratîk a Yekbûyî" avakirin.

Di sala 1993'an de, yekîtiyeke din di navbera “Partiya Kurdî ya Demokratîk a Yekbûyî” û van partiyan de çêbû: “Yekîtiya Gel/ koma Hesen Salih û Fûad Elîko”,“Partiya Karmendan/ Azad Elî ” û koma ku ji Partiya Çep cuda bû (Sedîq Şernexî) û bûne yek partî bi navê “Partiya Yekîtî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (Yekîtî)”, her wiha Îsmaîl Omer hate hilbijartin û bû sekreterê partiyê.

Di salên 1994-1995-1996'an de, Partiya Yekîtî kampaniyeke pankartan di salvegera roja serjimêriyê de li dar xist û tê de daxwaza mafê kesên ku nasnameya sûrî ji wan hatibûn kişandin û çareserkirina doza kurdî, kir. Di encamê de rêjîma sûrî bi sedan endam û alîgirên wê partiyê girtin.

Piştî wê, nakokî di hundirê partiyê de derketin der barê berdewamkirina meş û kampaniyên ku daxwaza mafên kurdan dikin. Lewre jî partî dabeşî du koman bû “Koma Yekbûn û Xebatkaran” û “Koma Yekîtiya Gelêrî”. Piştre Koma Yekîtiyê di salên 1997 û 1998'an de xwe ji partiyê vekişand bi rengê vekişandinên kesane. Di sala 2000'î de kesên vekişiyayî kom bûn û partiyeke nû bi navê “Partiya Yekîtî ya Kurdî li Sûriyê” damezrand û tekez kir ku ew berdewambûna rewa ji Partiya Yekîtî û xebatên wê re ne.

Nakokiyeke kûr di hundirê Partiyê de di navbera Hesen Salih û Fûad Elîko de çêbû. Di kongreya partiyê ya ku di dawiya sala 2009'an de hate lidarxistin, civîn bi dawî bûn bêyî ku pêşengtiyeke nû ji partiyê re bê hilbijartin û bêyî ku rojeva wê temam bibe. Ji ber Fûad Elîko û piraniya endamên komîteya siyasî berbijartin (namzetî) red kir bi sedema şermezarkirina biryara guhertina navê partiyê ji “Partiya Yekîtî ya Kurdî” bo “Partiya Yekîtî ya Kurdistanî”û pejirandina xweserî wek çareseriyeke siyasî ji pirsgirêka Kurdî li Sûriyê. Ev her du biryar bi dengdayîna piraniya dengên endamên kongreyê, hatin girtin.

Di 8'ê berfanbara 2009'an de, civînek bo komîteya navnedî “pêşengtiya partiyê” hate lidarxistin, hin çavdêr navê “Civîna Sêşemê” lê kir û di encamê wê de lihevkirin di navbera şepêla Fûad Elîko (yên ku guhertinên nû red dikirin) û şepêla Hesen Salih (yên ku guhertinên nû pêşniyar kirin) pêk hat û li gorî vê yekê bû:

Rakirina biryara guhertina navê partiya Kurdî bo Kurdistanî.

Hiştina biryara pejirandina xweseriyê wek çareseriyeke siyasî bo pirsgirêka kurdî.

Hilbijartina komîteyeke siyasî bo gera (dewre) bê.

Baska alîgirê Hesen Salih di rêxistina Ewropa de (Ebdulbasit Hemo, Omar Dawîd û hevalên wan) encamên Civîna Sêşemê red kirin û di 15'ê berfenbarê erêkirina biryarên kongreya giştî ragihand û tekez kir ku ew ê

xebatên xwe di bin navê partiyê yê nû de “Partiya Yekîtî ya Kurdistanî” dewam bikin.

Di 26'ê berfenabarê de Hesen Salih tevî sê endamên komîteya siyasî (Mihemed Mistefa, Marûf Mele Ehmed û Enwer Naso) hatin binçavkirin piştî ku rêveberê Şaredeariya Qamişlo şande pey wan.

Di destpêka sala 2010'an de, komîteya navnedî ya Partiya Yekîtî Ismaîl Hemê wek sekreterekî nû ji partiyê re hate hilbijartin.

Tevgera Apocî û Damezrandina Partiya Yekîtiya Demokratîk:

Di destpêka salên 80`ê ji sedsala bîstan de, damezrînerên PKK'ê û ji wan serokê partiyê Ebdulah Ocalan li erdên Sûriya û Lubnanê bi cih bûn. PKK'ê di demeke kin de karîbû hizirên xwe belav bike û gelek endam û alîgiran ji hawîrdora kurdî ya Sûrî li dor xwe kom bike.

Hizirên partiyê yên ku daxwaza rizgarkirina her çar parçeyên Kurdistanê dikir û riya têkoşîna çekdarî dişopand, moral da Kurdên Sûriyrê bo ku bi hejmareke pir mezin beşdarî partiyê bibin, her wiha hin kom bi dehan kes ji partiyên din ên kurdî yên ku di nakokiyan de dijiyan vekişiyan û tevlî refên PKK'ê bûn.

PYD'ê bi awayekî pratîkî li derveyî Rojava li çiyayên başurê Kurdistanê hate damezrandin, ji ber operasyonên girtin û binçavkirina endam û alîgirên vê partiyê ji hêla dezgehên ewlehiya Sûrî û saloxgêrên wê ve. Nemaze piştî derketina A. Ocalan derveyî erdên Sûrî di dawiya sala 1998'an de, piştî lihevketina têkiliyên Sûrî –Tirkî û gefkirina dewleta Tirkî bi destpêkirina şerekî dijî Sûriyê. Piştî wê hêdî bû dema pêşxistina têkliyan di navber herdu dewletan de.

Pêşengên vê partiyê biryargehên xwe li Çiyayên başûrê Kurdistanê bi cih kirin bo ku xebatên rêxistinî dûrî dezgehên ewlehiya Sûrî bikin. Ji ber endamên partiyê rastî kampaniyeke dijwar ji hêla rêjîma Sûrî ve hatin, lewre jî rêberên li Qendîl ev yek red nekir. Piştî ragihandina fermî ji partiyê re di 2003'yan de, partiyê dest bi xebatên rêxistinî di hundirê Sûriya de kir bi navê “Partiya Yekîtiya Demokratîk”. Wê demê saloxgêrên Sûrî navê “Partiya Apociyan a Nû” lê dikir û endamên wê weka cudabûyiyên ji PKK'ê û carinan jî weke baskek alîgirê PKK'ê didîtin. Lê PYD'ê her tim ew

tawanbarî neyînî dike û bi eşkere dibêje ku ew rêbaz û îdeolojiya Ocalan dişopîne û li rojavayê Kurdistanê pêk tîne, lê ew ne girêdayî wê ye yan jî tu têkiliyên rêxistinî bi hev re tune ne, tişta hevbeş di navbera wan de hizir û ramanên Ocalan e, her wiha peywendiyeke xurt û mezin bi PKK'ê re heye ji ber bi hezaran keç û xurtên Rojava di qonaxên cur bi cur di têkoşna PKK de şehîde ketine.

Alîgirên hizira Apocîtî partiyek ku hizir û ramanên Ocalan dinimîne,damezrand û navê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) lê kir. Ev nav di kongreya damezrîner a ku di 23/10/2003'yan de hate lidarxistin, hate lêkirin. Wê çaxê gelek nav hatin pêşniyarkirin li ser bingeha şopandina rêbaza Netewya Demokratîk da ku nav li gorî rêbazên wê be. Lewre jî di wê kongreyê de piraniyan ew nav pejirand. Di kogreyên li pey wê re gelek pêşniyar hatin dayîn bo guhertina nav û zêdekirina peyva “Kurd” yan “Kurdistan” li serê, lê ev pêşniyar ji hêla piraniya endaman ve hate redkirin. Ji ber ew dibînin ku ev partî siyaseta hemû pêkhateyên Sûrî nexşe dike û mafên wan di pêvajoya guhertin û veguhestina demokratîk de, misgoer dike.

Di kongreya yekemîn de ya ku di 23/10/2003'yan de hate lidarxistin û 160 delege tevlî bûn, Zerdeşt Haco bo serokatiya partiyê hate hilbijartin. Lê ji ber mercên rûniştina wî li derveyî welat rola ku jê dihate xwestin baş nelîst û di kongreya duyem di 2005'an de hate guhertin û Fûad Omer hate hilbijartin bo serokatiya partiyê. Piştî bidawîkirina du geran, di kongreya çarem de Salih Mislim bo serokatiya partiyê hate hilbijartin.

Endamên ku ji PKK'ê cûda bûn, partiya Rêkeftin dadimezrînin:

di salên 2003-2004'an de, hin kadirên kurdên Sûrî dev ji PKK'ê berdan û berê xwe dan YNK'ê li Silêmaniyê, li wir di 2004'an de Tevgera Rêkeftin a Demokratîk a kurdî li Sûriyê damezrand, bi serokatiya Kemal Şahîn. Piştî lidarxistina kongreya wan a duyem di 2007'an de, nakokî û parçebûn di hundirê serokatiya Rêkeftin (yê ku li Silêmaniyê bi cih dibû) de çêbû.

Serokatiya Rêkeftin (koordînasyona giştî) ji van endaman pêk dihat: Fewzî Şengalî (koordînatora giştî), Hecî Efrînî (berpirsê ragihandinê), Salih Sofî, Neşaat Mihemed, Nedîm Yûsif (nûnerên partiyê li Ewropa), Telal

Mihemed, Cegerxweîn Şêxo (Heleb), di salê 2008- 2009 parçeyî du koman bû:

Kombûnek ji van kesan pêk dihat: Şengalî, Sofî, Telal Mihemed.

Kombûna din jî ev kes tê de bûn: Efrînî, Neşaat, Cegerxwîn.

Di dawîya 2008'an de, Nedîm Yûsif xwe ji Rêkeftin vekişand, beriya wê jî bi çend mehan gelek endaman xwe ji Rêkeftin vekişand û di nîsana 2008'an de Rêxistina Yekîtiya Niştîmanî ya Azad damezrand bi serokatiya Ebdilfetah Dihêr.

Di 12'ê hezîrana 2009'an de, Fewzî Şengalî bi navê partiya xwe lihevkirinek bi Hoşeng Derwîş (damezrînerê Şepêla Azadiya Kurdiatana Sûrî) û Ebdilbaqî Kolo re (damezrînerê Tevgera Niştîmanî ya 12'ê Adarê) mor kir, bo damezrandina pergalekî yan jî yekîtiyekê di navbera her du rêxistinan de. Roja din, Hecî Efrînî berpirsyarê ragihandinî (rêveberê malper û rojnameya Rêkeftin) daxuyaniyek weşand û tê de peywendiya Rêkeftin bi wê lihevkirinê re neyînî kir.

Gelek kesayetan hewl da bo ku çareseriyekê ji van nakokiyan re bibînin, lê hemû hewldanên wan bi bin ketin.

Pêdiviya Şengalî bi kesayetekî ku bikare ragihandineke alîgir jê re damezerîne û bi rê ve bibe hebû, bo ku hêza Hecî Efrînî yê ku ragihandina partiyê bi rê ve dibir, bişkîne. Lewre jî Şengalî bi Hoşeng Derwîş re (yê ku li astekî siyasî bilind digeriya) li hev kir ku tevlî Partiya Rêkeftin bibe hemberî damezrandina hêzeke ragihandinî alîgir jê re. Bi rastî jî Derwîş malperek bi navê “rekeftin.org” damezrand û rojnameyek bi navê “Rêkeftin” derxist. Di 27'ê tebaxa 2009'an, bi ragihandina yekbûna Şepêla Azadiya Kurdistana Sûrî bi Partiya Rêkeftin re, lihevkirina wan bi serî bû.

Di dawiyê de, kombûna Şengalî kongreya xwe ya giştî bi navê “Kongreya sêyem a Rêkeftin” di 25'ê mijdara 2009'an de li dar xist û tê de Şengalî hate hilbijartin wek sekreterê giştî ya Rêkeftinê û kombûna Hecî Efrînî ji partiya Rêkeftinê hate qewitandin.

Di 1'ê çileya 2009'an de malpera “rekeftin.net” daxuyaniyek li ser zimanê malbata Kemal Şahîn (damezrînerê Partiya Rêkeftin) weşand. Tê de şandina tu nameyeke pîrozbahî ji baska Şengalî re li gorî ku malpera

“rekeftin.org” ragihand, neyînî kir û ev yek şermezar kir. Her wiha daxuyakirin ku armanca van kiryarên ne berpirsyar rewakirina hewldana parçebûnê ye, ya ku ew baska gumanbar (li gorî ku di daxuyaniyê de hatiye danîn)hewl da pêk bîne û diyar kir ku ew ê berê xwe bide dadê bo ku sînoran ji kiryarên wiha re deyîne.

Di 7-8'ê berfanbara 2009'an de, kombûna Efrînî civîneke berfireh li dar xist û tê de ragihand ku ew Kongreya Sêyem a Rêkeftin nepejirînin, her wiha diyar kir ku ew kesên ku li pişt wê disekinîn ji Partiya Rêkeftin cûda ne û divê bi lez bixebitin bo ku kongreya sêyemîn a Rêkeftinê li dar bixin.

Di 2010'an de, kombûna Efrînî kongreya xwe ya giştî li dar xist, lê di cih de nakokî di navbera endamên wê de derketin û du partiyên nû jê derketin; ew jî “Partiya Rêkeftin a Kurdistanî- Sûriya” bi serokatiya Neşaat Mihemed û “Partiya Rêkeftin a Demokratîk a Kurdî ya sûrî 'Şepêla Reformê'” bi serokatiya Hecî Efrînî.

Şepêla Pêşerojê kopiyeke nû ji hişmendiya partîtiya Kurdîtî:

Ev şepêl di 29'ê gulana 2005'an de bi serokatiya Meşal Temo (endamê bîroya siyasî yê berê di Partiya Yekîtiya Gelerî ya Kurdî), hate damezrandin. Di cih de Ehmed Mûsa xwe ji vê şepêlê vekişand û daxuyanî bi navê “Desteya Demkî ya Şepêla Pêşerojê” derxist. Piştî çend mehan xebatên bi navê şepêlê sekinandin. Di 2007'an de, piraniya damezrînerên şepêlê xwe vekişandin wek bertek li ser dayîna Temo ji biryaran bi tena serê xwe û di tebaxa 2008'an de bi Desteya Rewşenbîrên Kurd re ku Îbrahîm Kaban ew damezrand bû, bûne yek.

Di 15'ê tebaxa 2008'an de, Temo hate binçavkirin bi tawana lawazkirina hestên neteweyî, hişyarkirina nijadperestiyê û belavkirina agahiyên derew. Di 31'ê 2008'an de Omran Seyid berpirsyarê rêxistina Amûde ya şepêlê hate binçavkirin piştî belavkirina wî ji belavokên ku daxwaza berdana Temo dikir. Piştî serbestberdana Omran Seyid hin ji serokên şepêlê red kir ku ew vegere cihê xwe yê berê di şepêlê de bi bihaneya ku helwesta wî di dadgehê de ne li gorî helwesta şepêlê bû. Lê rêxistina Amûde piştgiriya Omran dikir û ji nav wan Cengîdar Mihemed (yê berpirsyariya Rêxistina Amûde rakir di dema girtina Omran de).

Omran didît ku şepêl rêxistineke çandî siyasî ye û naxwaze tenê rêxistineke siyasî be, her wiha her tim dijî awaya dayîna biryaran di şepêlê de derdiket û di hevdîtineke çepemniyê de diyar kir ku biryar bi dizî ji hêla kesine derveyî Bîroya Têkiliyên Giştî ve têne dayîn û peywira Bîroya Têkiliyan tenê morkirina biryaran e. Her wiha wî da xuya ku: “Kiryarên demokrasiyê û rêzgirtin ji pirnerînan re ku qalê dikin tenê slogan in û tu girêdana wan bi rastiya şepêlê re tune ne”. Her wiha Jîndar Mihemed diyar kir ku rêxistina Amûde red dikir ku pêbendiyên darayî bide û got: “Tiştên darayî di şepêlê de girêdayî kesekî tenê ye tu kes nizane karûbarên lêçûnê çawa pêk tê, her wiha daxwaza wan bi çêkirina komîteyeke malî bo ku serperiştiya lêçûn û dahatên şepêlê bike, dihate redkirin”.

Bi sedema redkirina serokatiya şepêlê ji daxwazên Omran û Jîndar re, wan xebatên rêxistina Amûdê sekinandin heyanî ku civîna giştî ya şepêlê bê lidarxistin. Civîn dê di dawiya gulana 2009'an de bihate lidarxistin, lê hate taloqkirin heyanî demeke ne diyar. Lewre jî serokên şepêlê yên mayî civînek ji Bîroya Têkiliyên Giştî re di 14'ê mijdara 2009'an de li dar xist û tê de biryar bi qewtandina Omran Seyid da. Wek bertek ji vê yekê re rêxistina Amûdê –tevî her du endamên Bîroya Têkiliyan- xwe ji şepêlê vekişandin wek şermezarkirin ji piştguhkirina şepêlê ji wan re.

Hevbendiyên siyasî yên kurdî di navbera salên 1980-2010'an de:

Çêkirina hevbendiyên siyasî yên kurdî li rojavayê Kurdistan girêdayî bû bi guhertina rewşa siyasî û peywendiyên di navbera her du partiyên sereke li başurê Kurdiatanê. Piştî binketina Şoreşa Berzanî û koça wî ya dawî di 1979'an de, di 15'ê sibata 1980'î de peymaneke di navbera sê partiyên kurdî li Sûriyê hate çêkirin: Partiya Demokratîk a Pêşverû li Sûriyê (bi serokatiya Ebdilhemîd Derwîş), Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (bi serokatiya Şêx Mihemed Baqî, Şêx Mihemed Îsa) û Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê (bi serokatiya Îsmet Sîda). Ev her sê rêxistin peywendiyên wan bi YNK-Îraqê re ya bi serokatiya Celal Telebanî, baş in.

Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan–Îraq hewl da xwe ji hundir de bi rêxistin bike û serweriya xwe vegerîne qada kurdî ya siyasî di Sûriyê de. Di 1986'an de hevbendiyeke alîgir jê re hate damezrandin ev partî tê de hebûn /El-Partî- Yekîtiya Gel- Çepa Kurdî/.

Di encama yekbûna nerîna siyasî ya YNK'ê û PDK-Îraq li başurê Kurdistanê piştî Şerê Kendavê ya Duyem, Hevbendiya Demokratîk a Kurdî li rojavayê Kurdistanê di 1'ê sibata 1992'yan de di navbera çar partiyan de hate ragihandin, ew partî jî ev bûn:

Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) – Kemal Ehmed.

Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê – Ebdilhemîd Derwîş.

Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê – Yusif Dîbo.

Partiya Demokratîk a Kurdî ya Sûrî – Mele Mehmûd Şêx Baqî.

Yek ji sedemên damezrandina vê hevbendiyê yekkirina kom û blokên ku ji partiya mak cûda bûn di Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî de û bikaranîna şêwazeke nû ji xebatên siyasî yên kurdî li Sûriyê (poster), bo ku rewatiya siyasî ji gelên kurd û hêzên Kurdistanî bigire dest. Her wiha komek di Partiya Yekîtiyê de hewl da tevlî vê hevbendiyê bibe.

Bi sedema nakokiyên di navbera YNK û PDK-Îraq de û pêşketina nakokiyên di navbera her du aliyan de ber bi pevçûneke çekdarî çû, hevbendî parçe bû û Eniya Demokratîk a Kurdî di 1996'an de hate damezrandin û hevbendî ji nû ve hatin çêkirin û bû bi vî awayî:

Hevbendiya Demokratîk a Kurdî, ev partî di nav de hebûn:

Partiya Demokratîk a Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê – Ebdilhemîd Derwîş.

Partiya Demokrartîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) – Nesredîn Berhek.

Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê – Mihemed Mûsa Mihemed.

Partiya Demokratîk a Kurdî ya Sûrî – Mele Mehmûd Şêx Baqî (ew di 2003'yan de ji hevbendiyê vekişiya).

Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê – Îsmaîl Omer.

Eniya Demokratîk a Kurdî, ev partî di nav de hebûn:

Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê (El-Partî)- Kemal Ehmed.

Partiya Demokratîk a Pêşverû a Kurdî li Sûriyê – Ezîz Dawûd.

Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê – Xêredîn Murad.

Partiya Niştîmanî ya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê- Tahir Sfûk.

Hin rewşenbîr û nivîskarên kurd daxwaza yekbûna partiyên siyasî di yek jêdereke siyasî yekgirtî de dikir. Tevî ku hin partî xwedî li ramana lidarxistina kongreyeke neteweyî ya Kurdî û yekbûna nerîna siyasî derketin, lê ev yek pêk nehat û hemû parçebûnên di partiyên kurdî de di bin slogana yekbûna nerîna siyasî de çêdibûn.

Rabûna serhildana 2004'an û damezrandina hin partiyên nû bandoreke mezin li guhertinan nexşeya hevbendiyên siyasî yên kurdî kir; Partiya Çep piştî ku jev ket ji Eniya Demokratîk vekişiya û Partiya Azadî di 2005'an de damezrand. Bi vê yekê çarçoveya hevbendiyeke sêyem bi navê "Komîteya Hevrêziya Kurdî" di 2006'an de hate damezrandin û ev partî tê de hebûn:

Partiya Yekîtî ya Kurdî – Fûad Elîko.

Partiya Azadî ya Kurdî – Xêredîne Mûrad.

Şepêla Pêşerojê ya Kurdî – Mişal Temo.

(di nerîna min de ev beş tevlî hev bûye)

Piştî salekê ji damezrandina komîteya hevrêziyê, nakokî di navbera endamên wê de derketin nemaze di navbera Yekîtî û Azadî de û berztirîn sedemên nakokiyan ev bûn: boykotkirina Azadî ji hilbijartinên perlemanî bêyî ku bi Yekîtî bişêwire/ pêşwazîkirina Yekîtî ji kesên ku ji Azadî vekişiyan (koma Hişyar Ehmed di rêxistina koçeratan de û hejmarek ji xwendekarên zanîngehan). Carinan her du alî hev û du tawanbar dikir (bû nakokiyeke kesane di navbera Elîko û Xêredîn) û êdî rewş gihaşte asta bihêrskirina hevdu. Xêredîn Mihemed xwe nêzî Ebdilhemîd Derwîş dikir yê ku bi dijminatiya xwe ji Yekîtî re dihate naskirin. Li aliyê din jî Elîko xwe nêzî Mihemed Mûsa sekreterê Partiya Çep dikir, yê ku nakokî û dijminatî di navbera wî û Xêredîn de li ser serokatiya Partiya Çep, hebû.

Ebdilhemîd Derwîş sûd ji nakokiyên di navbera Yekîtî û Azadî de girt û projeyek pêşniyarî Xêredîn kir bi damezrandina hevbendiyeke çaralî di navbera van partiyan de (Pêşverû, Yekîtî, azadî, El-Partî) wek bedêl ji jêdera siyasî ya giştî re lê dûrê Yekîtî û partiyê din be. Xêredîn wek destpêk li ser vê projeyê erê kir û di hundirê partiya Azadî de reklam jê re çêkir, lê El-Partî – baska Ebdilhekîm Beşar ev proje têk bir.

Xêredîn têgihişt ku hevbendî bi Derwîş re dijwar e, her wiha asoyên tevgerên Ebdilhekîm Beşar sekreterê El-Partî bo damezrandina mecliseke siyasî ya kurdî yekgirtî wek bedêl ji jêdera giştî re, xuya bûn. Lewre jî Xêredîn hin rêzetedbîr pêk anî bo ku nêzî serokatiya El-Partî bibe da ku ji xwe re cihek yan jî rolekê di projeya El-Partî de bibîne. bo vê yekê jî di destpêkê de gotarên ku pesnê Berzanî dida weşandin û gotarên Ebdilhekîm Beşar di rojnameya partiya xwe de weşandin. Di encamê vê nêzîkatî de di 2008'an de civînek di navbera her du bîroyên siyasî yên her du partiyan de hate lidarxistin û tê de li hev kirin ku peywendiyên xwe bi pêş bixin û hevrêzî di helwestên xwe de der barê jêdera siyasî de, çêkin.

Elîko jî ji hêla xwe ve sûd ji nakokiyên di navbera Mihemed Mûsa (sekreterê Çep) û Hemîd Derwîş (yê ku hewl dida Çep di hevbendiyê de piştguh bike) de girt. Lewre jî nêzîkî Mûsa bû û wî kir hevkar di xebatên komîteya hevrêziyê de, ango rê li pêşiya wî vekir bo ku dev ji hevbendiyê berde û tevlî komîteya hevrêziyê bibe. Lê dema ku nakokî di hevbendiyê de gurtir bûn, bû du parçe:

Komîteya Bilind a Hevbendiyê (Çep, El-Partî- baskê Nesredîn).

Meclisa Giştî ya Hevbendiyê (Pêşverû û Yekîtî).

Elîko di cih de itîraf bi Komîteya Bilind a Hevbendiyê kir û her du partiyên Komîteya Bilind beşdarî xebatên meydanî ya Komîteya Hevrêziyê kir.

Ebdihemîd Derwîş di dawaiya sala 2007'an de, hewl da El-Partî tevlî projeya xwe ya bi “Hevbendiya Çaralî dihate naskirin bike, lê El-Partî ev yek red kir û tekez kir ku ew hemû partiyan nahewîne, sedema redkirina partiyê jî vedigeriya metirsî ji van tiştan:

Hişmendiya Hemîd Derwîş û hewldanên wî yên domdar ku serweriya biryara siyasî bike û aliyên din piştguh bike.

Lawazbûna rol û cihê partiyê (piştî ku serokatiya eniyê ji dest çû û enî parçe bû û jev ket).

Metirsî ji tolhildana Partiya Yekîtî (yê ku dê hevbendiyeke berfirehtir û hevrik damezrîne ku baskên din ên El-Partî û partiyên din di nav xwe de bihewîne).

Piştî têkçûna projeya Ebdilhemîd, Ebdilhekîm projeya xwe pêşniyar kir. Ew proje pêşniyara damezrandina mecliseke siyasî yekbûyî ji partiyên kurdî re dike û di cih de Ebdilhekîm erêkirina Xêredîn bi dest xist û nêzîkbûneke siyasî di navbera El-Partî û Azadî de çêbû. Her wiha di 2008'an de Yekîtî projeya El-Partî erê kir.

Partiya Yekîtî û Azadî di 2005'an de xwepêşandanek li Qamişlo li dar xist wek şermezarkirin li ser kuştina ramangir Meşûq El-Xiznewî, lê Ebdilhemîd Derwîş ev yek istixlal kir û hevbendiyek bi eniyê re çêkir dijî hevbendiya Azadî û Yekîtiyê.

Dema ku hewldan bo avakirina jêdereke kurdî dest pê kir, Derwîş hewl da derbê li hevrikê xwe "Yekîtî" bixe û wî dorpêç bike. Her wiha di dema hevdîtinên ku di navbera her sê blokan de (hevrêzî, enî û hevbendiyê) de pêk hatin, Ebdilhemîd daxwaz kir ku Şepêla Pêşerojê (hevalbendê Yekîtî yê herî berz) dûrî jêderê bikeve, lê daxwaza wî bi temamî hate redkirin. Dema ku her sê aliyan li ser morkirina dawî ji nerîneke siyasî ya yekgirtî li hev kir û derbasî aliyê rêxistinî bûn, Ebdilhemîd bi piştgiriya Ismaîl Omar daxwaza dubarekirina nîqaşan der barê gelek tiştan di wê nerîna siyasî de kir ew wesf kir ku ew radîkal e, bi vê gotinê ew têgîna "erd û gel" dide nîşan.

Lê dema ku nakokî di navbera Azadî û Yekîtî de derketin, Ebdilhemîd projeyek pêşniyar kir, ew jî damezrandina çarçoveyeke siyasî nû ku partiyên "Pêşverû û Yekîtî ji Hevbendiyê; Azadî ji Komîteya Hevrêziyê û El-Partî ji Eniyê" di nav xwe bihewîne û armancên Hemîd ji vê projeyê ev bûn:

Ku ew di hemû hûrgilyan de bibe jêder.

Jevxistina Hevbendî, Enî û Hevrêziyê.

Dûrxistina Yekîtî û dorpêçkirina wê di qada kurdî de.

Bi bidestxistina Ebdilhemîd Derwêş ji erêkirina Xêredîn sekreterê Azadî ji vê projeyê re, êdî dest bi projeya xwe kir û partiyên Çep û El-Partî di desteyên Hevbendiyê de piştguh kirin. Her wiha Pêşverû û Yekîtî kursiyên Hevbendiyê di bîroya sekreteriya giştî ya Daxuyaniya Şamê de desteser kir. Ev yek jî heşt ku Çep û El-Partî hevbendiyekê dijî Yekîtî û Pêşverû çêke û bi navê komîteya bilind a Hevbendiyê nûnertiya Pêşverû di Hevbendiyê

de di gulana 2008'an de rawestand. Pêşverû û Yekîtî jî Meclisa Giştî ya Hevbendiyê desteser kir di riya lidarxistina civîneke ji meclisê re bêyî vexwendina Çep û El-Partî.

Hevbendî bi vê yekê dabeşî du hevbendiyan bû:

Komîteya Bilind a Hevbendiyê (Çep û El-Partî).

Meclisa Giştî ya Hevbendiyê (Pêşverû û Yekîtî).

Di cih de, Yekîtî itîraf bi rewatiya Komîteya Bilind a Hevbendiyê kir û wê beşdarî gelek çalakiyên Komîteya Hevrêziyê kir.

El-Partî baska Ebdilhekîm projeya Hemîd a Hevbendiya Çaralî red kir, ev yek jî derbeyeke mezin ji Hemîd û ji hevalbendê wî Yekîtî re bû, yên ku ji qada siyasî ya kurdî cuda man û bo ku xwe ji wê cudabûnê derxînin, li ser raya giştî ya kurdî projeya kongreya neteweyî ya kurdî li Sûriyê ku hemû hêzên siyasî yên kurdî li Sûriyê di nav xwe de bihewîne, pêşniyar kir; lê ew hewldan bi bin ket.

# ÊLÊN DÊREZORÊ

(Beşa 2)

-Êla Elbokamil: Navê vê êlê li Kamil kurê Xenam kurê Elî kurê Salim Elsihêbî vedigere. Malbata Elhifil serweriya vê êlê bi tevahî dike. Ev êl, bi taybet li van cihan belav e: Elmeyadîn, Elişare, Zubiyan, Elbisêre, Elsûr, Elşihêla rojhilat û rojava, Elhewayic û hin gundên din jî. Hin ji girûpên wan ev in:

| Êl /girûp | Şax | Cihên ku lê dimînin | Cihên ku di navbera wan û êlên din de hevbeş in | Şêxêtî |
|---|---|---|---|---|
| Êla Elhifil | Elzahir | Nevçeya Elbisêre,<br>Zubiyan li çepê Feratê ya ku girêdayî Elmeyadînê ye, her wiha gundên Elfatise, Elrexîb, Elhewayic a ku girêdayî Elmeyadîn û gundê Elmiwêleh rojavayê Xabûr e û girêdayî navçeya Elsûr e. | Gundên Elxerîbe û Elherîcî yên girêdayî navçeya Elsûr. | Malbata Elhifel, malbata Mihemed Elderwîş û malbata Xelef Elemêr. |
| Êla Elbikêr | Elenabize, Carelah û Elkibêse (elqebêse). | Bajarokê Elxişam, gundên Elxirêciye, Elmiwêlih, Miêcil, Xerîbe, Elnimliye, Berşam a ku girêdayî navçeya Elsûr e û gundê Tîbetilfal. Her wiha Girûpa Elqesêbe li bajarokê Elbisêre û gundê Elhirêciye bi cih dibin. | Gundên Elhirêce, Elherêcî, Elseilo, Deblan û Elsûr. | Şêxê wan ê bi mîrasgiriyê Ebdilezîz Daûd Silêman Elhemade ji şaxê Elkebîse ye. |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Êla Elşiwêt | Elxalidiye, Elmecalîb û Elhemzat. | Gundên Sibêxan, Xerîbe, Ebûherdûb a ku girêdayî navçeya Elişare ye û Kemşe a ku girêdayî navçeya Elhecîn e. | Gundên Deblan û Xerîbe. | Malbata Berxeş Elmihemed Elwegai. |
| Êla Elbûrehme | | Gundên Eldiwêr û Elcirzî yên ku di navbera navçeyên Elişare û Hecîn de ne. | | Şêx Rehêman Kewan Elcibare. |
| êla Elbûhesen | | Gundên Elişare û Siwêdan Elşamiye û Siwêdan Elcezîre. | Navçeya Elişare. | Şêx Sefûk Fêsel Elnecris. |
| Êla Elqerian | | Bajarokê Elqoriye û gundên Elteyane û Elşenan ên ku girêdayî navçeya Elişare a girêdayî Elmeyadînê ne. | | Şêxê navçeya Elqiwêre: Tirkî Elhac Elhecî û şêx Serayî Elebid Elmihemed in.<br>Şêxê gundê Elteyane Tirkî Minadî Elxelîl û şêx Hemed Elferec in. |
| Êla Elcihêş | | Gundên Mehikan û Fatise (Elteybe). | | Malbata Emîn Elxelef Elicêl. |

Elcihêş: Dibêjin ev nasnav pir kevin e. Di zimanê wê demê de tê wateya kesê bihêz ê ku nayê şikandin, an jî kesê bi tundî şer dike1. Berî hatina Egêdatan, ev êl li herêma Dêrezrê bi cih bûbû. kombûna wan li herêma Mehkan a girêdayî Elmeyadînê bû. Li Hoza Zibêd a Qehtanî vedigere. Li çend welatên Ereban belav in, mîna: Iraq, Sûriyê û Yemenê. Di dema hukmê Sedam Hisên de, hin serbazên mezin ji vê êlê di artêşa Iraqê de

[1] http://al-zubaidi22.blogspot.com.tr/2015/08/blog-post.htm

derketin holê, mîna: Serleşker Salih Ziyab Elşihab şêwirkarê serokê parêzvanên komara Iraqê yê giştî. Hin şerên xwînî di navbera wan û êla Elegêdat de çêbûn. Sedemên wan şeran jî ew bû ku hinan ji êla Elcihêş bela xwe li jineke ji êla Elegêdat dabû. Di encamê de êla Elegêdat bi ser ket, lewma êla Elcihêş dev ji gund û çêrgehên xwe berdan û koçî Iraq (Mûsil û Nînewa) û Herêma Cizîrê (Rojava- Bakurê Sûriyê) bû, lê hin ji wan li gundên Mehkan û Fatiseyê (Teybe) li Dêrezorê man. Hin şaxên vê êlê li Sûriyê ev in[2]: Elsilêbî, Şereb, Elmehmo, Elwerdî, Elzîrat, Elhemûdî, Zeraq, Elkendar, Elhemed, Elselîm, Elboselîm, Şereb Elwerdî, Elmelaxnîx, Elmenêtî, Elselêbî, Elzenbîn, Elziyab û Elremo.

Êla Elbokemal: Navê xwe ji Kemal kurê Xenam kurê Elî kurê Salim Elsilêbî girtiye. Beşeke mezin ji wan li Bokemala ku navê xwe ji wan girtiye dijîn. Her wiha li van gundan jî bi cih dibin: Elsalihiyê, Elxebre, Heserat, Elsûse, Elsiwêiye, Seyal Şerqî û Xerbî, Elşeife û ji bilî wan…

Hin ji girûpên wan ev in:

Girûpa Elhesûn: Li van gundan bi cih dibin: Elxebre, Elherî, Elsiwêiye, Elsûse û Elheserat. Serokatiya vê êlê di destê malbata Eldendel ên ku li gundê Elsûse bi cih dibin de ye. Şêxê wan Eymen Deham Eldendel e. Bi şerê xwe yê li dijî ingilîziyan li Sûriyê û Iraqê tên naskirin. Şaxên wan ev in: Elmihemed Elhesûn, Elelî Elhesûn û Elhemûd Elhesûn.

Eldemîm: Şêxêtî di destê malbata Elcerah de ye. Şêxê wan ê niha "Nacî Ebûd Faris Elcerah" e yê ku Kemal nacî Elcerah bi alîkariya Newaf Ebûd Faris Elcerah ew ji şêxêtiyê dûr xist. Newaf jî kesayeteke nêzî rêjîma Esed e[3]. Ev êl li gundên Elsalihiyê û Elbehre bi cih dibin. şaxên wan ev in: Totihe, Ecarice, Ebas, Elhac û Elcemah.

Elbomirêc: Şêxêtî tenê di destê şaxê Elxelîl malbata Herset Elereb de ye. Li van gundan dijîn: Seyal, Elşefe û Elqete. Ji şaxên wan ev in: Elxelîl û Elelêwî.

---

[2] http://alguhayeesh.forumarabia.com/t22-topic

[3] Serokê şaxê ewlehiya siyasî li Laziqiyê bû. Di sala 1994an bû berpirsê şaxê partiya Baas li Dêrezorê. Di sala 1998an de bû parêzgarê parêzgeha Laziqiyê. Di sala 2000î de bû parêzgarê parêzgeha Idlibê. Di sala 2002yan de bû parêzgarê Qinêtireyê. Di 2008an de bû baliyozê Sûriyê li Îraqê.

Elboqian: Ev êl li êla Elebîd vedigere, du şaxên wê hene; Elelî û Elbûîsa. Gundên wan jî ev in: Elremadî li Şamiye û Tel Ebûhesen li Cizîrê.

Elmecawide: Dem û cihê damezrandina wê ne diyar e. Li gundê Elbiqie li Şamiyê dijîn û du şaxên wê hene; Elmenasire û Şemer.

Elmeşahide: Li Meşhed a Îmam Elî li Iraqê vedigere. Du şaxên wê hene; Elheramîş û Elşihabat. Li van gundan dijîn: Elsikeriye, Elcedle û Elsalihiye.

Elbûherdan: Dibe ku ji êla Elebîd a Mûsilî be. Li Hecîn dijî.

Elmerasime: Li êla Elcibûr vedigere. Navê xwe ji bapîrê xwe Mersûm kurê Cabir girtiye. Li gundê Elbaxûz dijîn. Li vî gundî, Telherîrî yê şûnwarî yê ku li Qiralgeha Marî vedigere, heye. Du şaxên vê êlê hene; Elbûdixmiş û Elbûmistefa.

Elmeraşide: Koka wê ji êla Elcibûr e. Li navçeya Elsûse dijî. Du şaxên wê hene; Elîban û Elzûre. Li girûpa Elhesen a ku malbata Eldendel serweriya wê dike, vedigere.

Elcexayîfe: Du gotin li ser koka wan hene; hin dibêjin koka wan li êla Eldeylem vedigere, hin jî dibêjin li êla Şemer vedigere. Ev êl bi Elhesûn re li van gundan dijî: Elsûse, Elhirî û Elxebre. Şaxên vê êlê ev in: Elsetam, Elelî û Elebûcelîd.

Elbûbedran: Li Zênilabidînê ku ji malbata Pêxember e, vedigere. Li bakurê gundê Sûseyê dijî.

Eldelîc.

Êla Elbûzamil: Navê Elşiêtat jî li wan dikin. Neviyê Zamil kurê Xenam kurê Elî kurê Salim Elsihêbî ne. Sê şaxên wan hene; Elhenfûr, Eleliyan û Elcedûi. Hin gundên wan ev in: Elxeranîc, Ebûhemam, Keşkiye (Ceşçiye) û Salihiye ya ku berê navê wê Dora Orbos bû.

Êla Elbûseraya: Gundên wan heta navçeya Eltibnî li bakurê bajarê Dêrezorê belav in. Ew gund jî ev in: Elbiwêtiye, Elterîf, Elşimêtiye, Elxirêtiye, Eyaş, Elbixêliye, Buqris û Elşola li çolistanê. Hin şaxên wan ev in: Elebûezam, Elebûizedîn, Elebûşiêb, Elebûziyab û Mûsa. Şêxêtî di destê şaxêElziyab de ye. Bi banga xwe ya ji bo şer "Exû Sebhe" (birayê Sebhe) navdar e. Li gorî wan dema ku êlên Elcibûr û Şemer êrîşî wan kir, Sebhe

berevaniya malbata xwe kir. Ev êl xizmên êla Elmesûd a şemerî ne yên ku li Kerbela û Elmiseyib belav in. jixwe vê êlê weke bira ji xwe re dibînin. Remedan başa Elşilaş ê ji gundê Elşimêtiye, yek ji şêxên wan ê herî navdar e. Vî şêxî di sala 1897an de dibistana Eleşayir bi dawî kir. Piştre tevlî dibistana leşkerî ya Osmanî bû û bi payeya Sitvanê Siwar di bin serpereştiya osmaniyan de bi dawî kir. Di riya hevkariya wan bi Elşerîf Hisên û Mîr Fêsel re, Serweriya raperîneke êla Egêdat li dijî Osmaniyan kir. Piştire di riya hevkariya wan bi Sultan Başa Eletreş re, li dijî Ingilîz4 û Ferensiyan jî sekinîn. Şêxê wan jî Fêsel Elfeyad e.

Êla Elbûxabûr: Ji hevpeymanên Egêdat in. Hin dibêjin ji girûpa Elbokemal in. Ev êl dabeşî çend şaxan dibe: Elbûhilêhil, Elbûumer û Elbûmiêt. Elbûhelêhil li ser çend şaxan dabeş dibin: Elelî, Elbûderbas, Elbûhorî, Elbûesaf û Elbûsiwêd. Ev giş jî ji navçeya ElMohesen in û di şivantiya pez de kar dikin û hin çêrgehên taybet bi wan hene. Lê Elbûumer dabeşî Elbûcirês û Elbûfewaz dibin û li gundê Elbûebid dijîn. Elbûmiêt jî dabeşî Elbûhesen, Elbûdec û Elbûdeham dibin û li gundê Mirêiye û bajarokê Mohesenê dijîn.

Êla Elbûlêl: Hin gotin hene dibêjin ku Elbûlêl ne ji Egêdatên resen in, lê belê ji Hevalbendên wan in. Hin kes wan bi êla Ebde ve ya ku ji hoza Şemer e girê dide. Paşê bûn hevalbendên Egêdat da ku êrîşî êla Elcibûr bikin. Girûpên wan jî ev in: Elmensûr, Elelî, Elbûxelef, Elzirêfat û Elbûhelahil Îsa. Li gundên Eltûb û Elqitie yên ku nêzî asayîşgeha Mohesen in, dijîn. Her wiha beşek ji Elbûlêl li navçeya Semian li bakurê Îdlibê û beşek jî li Iraqê li rojhilata Mûsilê dijîn. Her wiha beşek bi Elcibûr, Elbikêr û Elbokemal re li gundê Elseyale dijîn.

Hin nerîtên Egêdat ên taybet bi pêşwazîkirina mêhvanan hene, mînak: Ji dêvla ku hiriya serê lawirê were selixandin (gurandin), hiriya wê tê hilkirin. Ew lawira gurandî bi tevahî tevî serî li pêşberî mêvan tê danîn. Pêşwazker bi erkê qutkirina goşt radibe û hemû tiştên ku ji bo rehetiya mêvan pêwîst in, pêşkêş dike. Di pêşwazîkirina mêvanan de li cem Egêdat, divê ji bo her mêhvanekî lawirek were serjêkirin. Eger du mêhvan hatin, divê ji her yekî re lewirek were serjêkirin. Lê heger mêvanê duyem dereng hat ango di dema

[4] Axaftineke serokwezîrê Birîtaniyayê Wînistun Tişirşil heye wisa dibêje: "Dijminê me li Rojhilat du ne; yek ji wan Lînîn li bakur e, yê din jî Remezan Şlaş li başûr e."

pêşkêşkirina xwarina mêvanê yekem de hat, li vir mêvanê duyem di navbera du bijardeyan de ye; yan dê beşdarî xwarina mêvanê yekem bibe, yan jî dê li benda lawirê ku bi taybet ji bo wî hatiye serjêkirin bimîne. Heger beşdarî xwarina mêvanê yekem bû jî, divê pêşwazker serê lawira ku ji bo mêvanê duyem serjê kiriye, nîşanî wî bide da ku zanibe pêşwazker bi erkê xwe rabûye. Lê niha ji ber sedemên şer li Dêrezorê ev kevneşopî nema girîng in.

Êla Elbeqare ango Elbegare di zaravayê xwecihî de:

Yek ji êlên sereke ye. Li Erebên Ednanî vedigere. Lêkolîner Wesfî Zekeriya di pirtûka xwe ya bi navê Êlên Şamê de dibîne ku tu belgeyên xurt ji koka vê êlê re nînin. Du gotin li ser koka wan hene; yek dibêje ku ev êl ji paşmayên êlên Enmar û Îyad e, ev her du êl berî Islamê li vê herêmê dijiyan. Ya din jî dibêje ku ev êl ji neviyên Elîmam Mihemed Elbaqir kurê Zênilabidîn kurê Elhuseyn e û bi hêza leşkerî ya bi serkêşiya Sehabiyê bi navê Iyad kurê xenem, derbasî vê herêmê bû. Sedema navlêkirina vê êlê bi vî navî wisa ye; hin dibêjin ev nav girêdayî bavikê wan Mihemed Elbaqir e ku ew yek ji Îmamên Şîa ye, lê ev gotin ne gelekî zelal e, ji ber ku heke navê wan ji Baqir bihata dê navê yekî ji wan Baqirî bûna û navê gelekan ji wan Baqiriyûn bûna. Hin dibêjin navê wan girêdayî xwedîkirina wan ji lawiran re ye û bi taybet xwedîkirina çêlekan (navê çêlekan bi erebî Beqera ye).

Ev êl mezin e, hin girûpên wê li Herêma Cizîr, Heleb û li hin herêmên din jî hene. Her wiha hejmareke wan a kêm li dewletên cîran jî heye, mîna Tirkiye, Iraq û Urdunê. Ev êl li Sûriyê li ser du beşan parve dibe; Begare Elzor, ji ber ku li Dêrezorê dijîn û Begare Elcebel (çiya) ji ber ku li çiyayê Kazwanê (Ebulezîz) dijîn.

Begara Elzorê li herêma Dêrezorê li ser kenara çepê ya Çemê Feratê, li rojavayê bajarê Dêrezorê nêzî 70/80.km ta 40 km rojhilata bajêr, li cem Elbisêre, bi aliyê avrêjgeha çemê Xabûr dijîn. Beşeke mezin ji wan li bajarê Dêrezorê dijîn. Hin ji malbatên vê êlê xwedî bandoreke mezin di serweriya siyasî ya bajêr de bûn, her wekî: Malbata Ayiş, Eyaş û Hec Fadil Elebûd.

Bi awayekî giştî gundên Elbegare li navçeyên Elkesre û Mirat û ji gundewarê Dêrezorê yê aliyê rojhilat ta bajarokê Elbisêre belav in. Hin ji

gundên wan ev in: Hisêniyê, Meîşe, Sifêre Foqanî, Sifêre Tehtanî, Hetle, Mirat, Kesre, Mezlûm, Xişam, Tabiye, Sadûnî, Cedêdet Beqare, Cezîret Mêlac, Cezîret Bûhemîd û Şatî. Li çêrgehên di navbera rêya Dêrezor-Hesekê ta quntara çiyayê Kezwanê li herêma Cizîrê belav in, di nav de girên Elterembe, Immedfe, Wadî Elsimad, Xirbetilmoz, Bîra Berzan û Tiliteban Elcinûbiye jî.

Şêxîtî di destê malbata Elbeşîr de ye. Ev malbqat ji şaxê Elbûerb ya ji êla Elabid e. Berî kirîza Sûriyê şêxîtî di destên Newaf Raxib Elbeşîr de bû yê ku gundê Elmihêmîde ji bo şêxîtiya êlê kiribû navend. Ev kesayet di dilsoziya xwe ya ji bo rêjîma Sûriyê, Saloxgerên Tirik, Rikberiya Sûrî û Îranê re, demdemî bû. Her wiha di êrîşkirina wî ya li ser Kurd û Erebên Serê Kaniyê de li Rojava, xwedî heman kesayet bû. Lê ew têk çû û hêzên wî reviyan Tirkiyê. Piştre bi rêjîma Sûriyê re lihevkirinek pêk anî û pêşinyar kir ku serkêşiya Elheşd Eleşairî bike, da ku li herêma Cizîrê şerê QSDê bike, lê ji hêla êla xwe û êlên din ve hat piştguhkirin.

Vê êlê şer bi êlên din re bi awayê êrîşan dikir, her wiha li ser çêrgeh û kaniyên avê şer bi wan re kiriye, weke şerê wê bi êla Fedan re ya ku li hoza Inize vediger, Cês (Qeys), Êzîdiyên Şingalê, Şemer, Şerabî û êlên Kîkan ên Kurdî. Di van şeran de Begare gelek tişt ji dest dan.

Li gorî gotina Begare ew li Mihemed Elsaih vedigere yê ku sê kurên wî hebûn, ew jî ev in: Abid, Ebîd û Sultan. Neviyên van, sê girûp damezirandin, ew jî ev in:

Girûpa Elabid: Di navbera bajarê Dêrezor û Elkesre de dijîn. Şêxêtî di destê malbata Elbeşîr de ye.

| Şax | Serkêşî | Gund |
|---|---|---|
| Elbûereb | Şêx Newaf Raxib Elbeşîr | Mihêmîde, Hewayic Elziyab, Elhisêniye û Hewayic Elziyab Şamiye |
| Elxencer | Tirkî Hisên Elxenam | Mirat |
| Elrefîi | Deham Hisên Elkebiş û Ehmed Elrizîyan Elkebiş | Elkebiş |
| Elebid Elcadir | Ehmed Eldabûl | Sifêra foqanî û gundê Sifêre |
| Elraşid | Himêdî Elhindawî | Mezlûm |
| Elhemed Elabid | | Elcinêne û Elhisan |

Girûpa Elebîd: Di navbera bajarê Dêrezor û Elbisêre de dijîn. Şêxêtî di destê mala Elxanim de ye.

| Şax | Serkêşî | Gund |
|---|---|---|
| Elbûmesie | Ese'd Xelef Selman Elmesawî. | Hewayîc Elbûmesie |
| Elcasim Elebîd û Elhemed Elebîd | Şêx Mihemed Ibrahîm Elremedan, Mihemed Elbeşar, Mihemed Ebdela Elcîlat û Iweyid Eselîm. | Elhermûşiye |
| Elelî | | Elelî û beşek ji wan li gel şaxêElxencer li gundê Mirat dijîn. |
| Elhulamiye | Bedir Salih Elşelal û Hisên Elşahir | Elzixîr Elhulamî, Elzxîr û Zixîr Elşamiye bi şaxê Elbûhesen li kenarê rastê yê çemê Feratê dijîn. |
| Elmenasire | | Navçeya Elkesre û gundê Himar Elkesre. |

Girûpa Elbûsiltan: Li herêma Elkesre dijîn. Şêxêtî di destê malbata Elbûsalih de ye.

| Şax | Serkêşî | Gund |
|---|---|---|
| Elbûsalih | Şêx Bedran Elebdela û Şêx Xidir Salih Elxelef | Elkesre û gundên Cerwan, Qisêbe û Elkuber |
| Elbûrehme | Arif Elhimêdî û ji rîsipiyên wê; Selman Elsihû û Elî Elwês | Gundên Eltabiye, Eltabiye Elşamiye û Eldehle |
| Elmeşhûr | Ehmed Debûs Eligle û Ebûd Elşelaf | Gundê Elsiûde |
| Elbûşemis | Xelîl Ebdela Elhêwî û Hemûd Elşelal | Gundê Cezret Elşati û beşek ji wan li Reqayê dijîn |
| Elbûbedran | Berê di destê Malbata Hinêdî û niha di destê Malbata Elxelef[5] de ye. Serokên wan ên herî navdar ev in: Mişeweh Elebûd, Mehmûd Elsexîr û Remedan Elxelef. | Gundê Elbûbedran li herêma Elbokemal û Hetle ye. |
| Elebdilkerîm | Feyad Elreyaş û Selame Elreyaş | Gundê Cidêdet Begare û piraniya niştecihên bajarê Dêrezorê yên li |

[5] Êlên Dêrezorê, keseyat û navdarên Dêrezorê, https://www.facebook.com/

| | | |
|---|---|---|
| | | kolanên kevin ew in |
| Elbûhesen | Fêsel Elfendî | Elxerîte, Eldebîb, Zixîr Elşamiye û Hewayic Ziyab Elşamiye |
| Elbûşêx | Hisên Elî Salih Elcezan û Hesen Elşelal | Gundê Mişêrife |
| Elbûmiêş | Şêx Nûrî Xalid Eltelai û Şêx Geûd Xalid Eltelai | Gundê Şeqra |
| Elkilîzat | Seîd Hemdan Elkilîzî | Gundê Xiwêbîret Um Medfei |

Êl û girûpine din:

| | | |
|---|---|---|
| Elsiyad | Malbata Hac fadil Elebûd û Malbata Ayiş û Eyaş Elhac | |
| Elbûmislim | Hilal Mihemed Elxidir, Malbata Şêx Etiye û Mele Hamid | Gundê Elebyed |
| Elmirêxat | Fewaz Mihemed Elremo | Gundê Mişêrife Elremo |
| Elhemed Elhisên | Yasîn Elsêfan û Mihemed Elcasim | Gundê Cezret Elbûhemed |
| Elbûelaw | Îdan Elhemed | Gundên Ilûg Xerbî û Ilûg Şerqî |
| Elbûhemdan | Ferhan Sayil Elqenas û Salih Elwegai | Gundê Bedî Elzero |
| Elxeranice | Mihemed Ezîz Elbetran û Xelîl Elselman | Gundê Um Işbe |
| Begara Heleb û gundewarên wê | Li Helebê Şêx Setûf Elhemûd Elmirî û li gundewarê Helebê Hemadîn Hemadîn | Bajarê Helebê û gundewarê wê |
| Elbûsiltan | Şêx Ibrahîm Elbûetrî Elsiltanî | Herêma Minbicê |
| Begaret Elcebel | Ebdilkerîm Îsa | Herêma Cizîrê û bi awayekî taybet li Çiyayê Kezwanê (Ebdulezîz) |

Hin êlên din jî hene, lê ji aliyê pirbûn û belavbûnê ve ne weke êlên Begare û Egêdat in. Ew êl ev in:

Êla Elbûbedran: Şîiyên bajarokê Hitle digihine wan.

Êla Ellehîb: Li Erebên Elqehtan vedigerin. Ji êla Zibêd in. Dibînin ku Sehabî Emr kurê Meid Yekrub Elzubeydî bapîrê wan e. Li hoza Lehîb a ku

pir mezin e û li gelek dewletên erebî, Tirkiya û hin ji wan li Dêrezorê ne jî, vedigerin. Nasnavê "Lihêbî" li hev dikin.

Êla Elzefîr: Li Erebên Elqehtan vedigerin. Zaroyên Lam in ê ku yek ji êlên kevin ên Tey in. Ev êl yek ji êlên kevin ên ku ji Necidê li Nîvgirava Erebistanê di sedsala 15an B.Z koçî Welatên Şam û di nav de Dêrezorê jî kirine. Li çend welatên Ereban û li Tirkiye belav in. Nasnavê "Zifêrî" li hev dikin. Ji şaxên wan li Dêrezorê, Elbiwês û Elbûhedad in û serkêşiya êlê di destê malbata Ehmed Beg de ye.

Êlên ku ji Hoza Inize ne:

Elbûdibiş, Elbûxabûr û Elbûribah: Ev her sê êl Pismamên hev in. Ji Erebên Ednan in. Ji êla Inize ne. Ji Necid ji Nîvgirava Erebistanê ber bi welatên Şam û di nav de Dêrezorê koç bûne. Ji şaxên wan li herêma Dêrezorê, Elbûdibiş û Elbûxabûr in ên ku hevbendiyek bi êla Egêdat re çêkirin. Şaxên ku ji êla Elbûrebah in, ev in: Malbata Sewad Şihaze, Malbata Cerad, Malbata Mistefa, Malbata Ebdiletîf, Malbata Ibêd, Malbata Umer û hwd. Serkêşiya vê êlê di destê malbata Hesen Eltaha de ye.

Elbûerefat: Ji êla Inize ya Ednanî ne. Ji wan ev malbat hene: Fitêh Elgernûs, Hesen Elmeşhûr û Ferîh Elhemîd li Meyadînê. Serkêşiya êlê di destê malbata Fitêh Elgernûs de ye.

Êla Elbûşelhûm: Ji êla Elcelas in. Ji ber pirbûn û belavbûna wan nasnavê Elrole (belav) li wan tê kirin. Ev êl ji Hoza Inize ya Ednanî ye. Bapîrê wan Mihemed kurê Mecîd ê bi nasnavê (Şelhûm) Ji Erebistanê ber bi herêma bi navê Dêrilşear (niha navê wê Dêrezor e) ve koçber bû. Ne tenê li Dêrezorê, lê belê li bajarê Elbisêre û gundê Elhiwêce jî dijîn.

Du êlên din jî hene: Elhisanî û Elnewabixe.

Elxerşan: Ji êla Benîsexir a Qehtanî ne. Ji ber nexweşiya Xurîyê ya ku bavikekî wan pê ketibû[6] û riwê wî piştî vê nexweşiyê kunik tê de çêbûbûn, nasnavê Elxirşan (rûbikun) li wan hat kirin. Yek ji şaxên vê êlê li Dêrezorê dijîn, ew jî Elbûhef e ya ku Elbûheran, Elbûebid Yasîn û Elbûxelîfe jê ne. Serkêşiya êlê di destê malbata Ferhan Elfeyad de ye. Şêxê wan niha Tariq Ziyad Zehdî ye. Ji rîsipiyên wan ên herî navdêr Celal Elseyid e.

[6] Benîsexir, Dêrezor bewabet Elfurat, http://www.dzodz.com/vb/archive/index.php/t-27710.html

Êlên ku di koka xwe de ji Malbata Pêxember in (Al Elbeyt):

Êla Elmeamire: Koka xwe digihînin Malbata Pêxember. Dibînin ku Ibrahîm Elmurteda kurê Mûsa Elkazim kurê Elhusên kurê Elî, bapîrê wan e, lê tu belgeyeke ku vê yekê tekez bike, nîne. Hin gotin hene wan dighînin êla Zubêd a Qehtanî. Serkêşiya vê êlê di destê malbata Ebdela Elserhan de ye.

Êla Elneîm[7]: Li herêma Mohesen a ku li rojhilatê Dêrezorê bi dûrbûna 20 km'an, dijîn. Ji ber bapîrê wan ên pêncemîn Hezretê taha Elneîmî, nasnavê Eltahat (Pirjimariya Taha) li wan hat kirin. Piraniya seyidên Elneîm ên li Dêrezorê ji şaxê Eltoplis in, kurên Seyidê Şêx Ebidilrehîm kurê Seyid Izedîn in ku nasnavê Neîm Elkebîr ango Ebû Hemze lê tê kirin.

Elcewalixe:

Êla Elrehbiyîn: Her wiha navê wan Elqelaîn (Elgelaîn) e jî. Du gotinên cuda li ser koka vê êlê hene; yek wan digihîne êla Texlib kurê Wail û yek jî wan dighîne Malbata Pêxember. Navê wan ji Kelha Elrehbe ya li herêma Meyadîn hatiye. Di dema Ebasiyan de ev herêm di bin rêveberiya Malik kurê Tewq Eltexlibî de bû. Êla Elrehbiyîn ji pênc êlên sereke pêk tê, ew jî ev in: Elbûxelîl, Elweysat, Elbûnasir, Elsenaniyîn û Elbûmistefa. Ji van êla êline din jî şax didin, weke: Elbûhemîd (li Meyadînê dijîn), Elbûxanim, Elbûmalik, Elşiwêxat û Elrihêbat (li Elişare dijîn), Elrehbiyîn (li Ebûkemal dijîn) û bi nasnavê Elaxa tên binavkirin, lewma jî bi Axawat (pirjimariya Axa) tên binavkirin. Ev nav ji hêla sultanê Osmaniyan ve li wan hatiye kirin. Li bajarên Elmeyadîn, Elişare û Elbokemal belav in. Şêxêtiya giştî di destê êla Elbûxelîl, malbata Şêx Borsan de ye. Piştre malbatên Dexîl Elborsan û Weqai Elborsan şêxêtî ji wan girtin. Piştî damezrandina Komara Sûriyê, şêxêtî kete destê malbata Xibên bi her du şaxên wê; Eldiwêhî û Elmihêd.

Êla Elweysat[8] xwe dighînin yekî ji waliyên Osmaniyan ku navê wî Wêsiyê Duyem bû û li ser herêma Elmeyadînê bû. Ev kes bi koka xwe dighêje Zênilabidîn kurê Husên kurê Elî kurê Talib. Lewma ji Erebên

---

[7] Êla Elneîm li Dêrezorê, https://www.makalcloud.com/post/9slv3f6jg

[8] Vê êlê navê xwe ji Weys Ebûtasa yê ku li Helebê li devera Babilneyreb li mizgefta dibistanê hat veşartin, girtiye. Zanistnameya malbat û dûndeyan. http://www.ansab-online.com/mybb/showthread.php?tid=8251

Ednanî ne. Beşek ji wan li Iraqê jî dijîn. Serkêşiya êlê di destê malbata Elhecî ya ku ji Elbûxanim in, de ye. Ji wan ên ku li bajarê Elmeyadîn xuyayî ne, malbata Silêman Elrehbî ye û li Dêrezorê malbata Cafer Elrehbî ye.

Êla Elbûnasir: Li bajarê Elişare dijîn. Li wir malbata Elsilêman û Mişewih serkêşiya wan dikin; li Meyadînê malbata Emrîr serkêşiya wan dike. Hejmarek êlên Elbûnasir hene, ji wan Elebdela û Elsinaniyîn. Elbûebdela serkêşiya wan di destê malbata Rehîl de ye, Elrehbiyîn ên ku li Elbokemalê ji wan e, lê Elsinaniyîn piraniya wan li Xabûr dijîn û şêxê wan ji malbata Elselame ne.

Êlên ku ji hoza Elcibûr in:

Elbûimêrî: Li navçeya Elbisêre dijîn.

Elqudat: Şaxek ji êla Elcibûr in. Beşek ji wan li gundê Deman û beşek li gundê Berşim dijîn.

Elcumeylat: Ji êla Cês (qeys) in, li navçeya Elbisêre dijîn.

Elsexanî: Navê xwe ji bajarokê xwe Elsuxne yê nêzî Tedmurê girtiye. Girêdayî çend êlan e, weke êla Cês (Qeys), Benîhemdan û hwd e. Her wiha hinan ji wan xwe gihandine êlên Elxerşan û Elciwêşine li Dêrezorê.

Elbûfehid: Ji êla Ibêd in. Li navçeya Elbisêre dijîn.

Elebêd: Ji Hewêca Elibêd a li Iraqê ne.

Elbûoce: Ji malbata xalid in. Serkêşiya êlê di destên malbata Cinêd de ye.

Eldilêm: Elkerabile, Elbûfiryo, Elmehamid, Elbûîsa û girûpa Elzebarî.

Her wiha Elmeşarife ji Mewaliyan e, Elbûxerês ji Xeface ji şaxê malbata Seyf Elzalim û malbata Xidir Efendî ye, Elciwêşine ji Tey ji malbata Zerêfî ye, Elbûhedîd ji Hedîdiyan, Elşear û Elikêl e.

Hin malbatên kurd, Ermen û Suryanî jî hene.

Ol, bawerî û ayînên olî li Dêrezorê:

Piraniya êlên li Dêrezorê Misilmanên Sunî ne, mezheba wan Şafiî û Hembelî ye. Her wiha hejmareke biçûk ji Şîa û Filehan jî heye.

Hin rêçikên Sofî jî li Dêrezorê belav in, mîna: Elneqişbendiye9, Elqadiriye ya ku ji navê Ebdilqadirê Gêlanî hatiye û Elrafîye ya ku ji navê Ehmed Elrifaî hatiye. Nasnavê Elsade Eleşraf li serkêşên van terîqeyan (rêç) tê kirin. Ev kes di koka xwe de xwe dighînin malbata pêxember. Li wan deveran hin mizgeft, mezargeh û tekî10 hene, her wiha hin dibistanên Jiberkirina Qurana Pîroz û hînkirina zanistên olî yên taybet bi wan Terîqeyan jî hene, weke tekiya Weys Elezî Elneqşebendî û Tekiya Şêx Ebdela Elneqşebendî.

Koka terîqeya Neqşebendî li Cizîrê11 (Dêrezor, Reqe û Elbokemal) li beşeke ji seyidên Ele'reciye vedigere. Tevlîbûna têkiliyên êlî di nav neqşebendiya Cizîrê de (Hesekê, Reqe û Dêrezor) bi êlên Iraqê re, derfet ji bo peywendiyeke taybet û meydaneke sofî vekir, vê jî hişt ku mirîdên vê terîqeyê beşdarî şerê dijî Emrîkiyan li Iraqê di sala 2003an de bibin.

Seyidên herî navdar li Dêrezorê Ev in12:

Elbûselame ji malbata Şêx Îsa Elseyadî Elrifaî Elhusênî ye.

Elrawiye Elrifaîye Elhusêniye.

Elbûbedran Elrifaîye Elhusêniye.

Elbûxabûr Elrifaîye Elhusêniye.

Elneîm Elrifaîye Elhusêniye.

Malbata Ceber Elşide Elhusênî

Elmernediye Elqadiriye Elhusêniye.

Eltifêhiye Elrifaîye Elhusêniye.

---

[9] Terîqeta Neqişbendî: Navê wê li Mihemed Behadîn Şah Neqişbend vedigere. Ev kes li gundê Buxara di sala 717 K ji dayik bûye û di sala 791 miriye. Piştgirên vê terîqetê dibêjin ku terîqeta wan bi navê "Elsedîqiye" dihat binavkirin, yanî navê xwe ji navê Ebûbekir Elsedîq girtiye. Ev terîqet li her aliyên cîhanê bi taybet li devera Qafqasiya, Buxara, Semerqend, Turkuman, Xîzestana li Yekîtiya Sofiyêtî û Nîvgirava Hindistanê belav dibe. Mezinên vê terîqetê ji van welatan in. Ev terîqet zanista şeriî, koka vê zanistê ya di pirtûkên suneta pêxember û Qyranê de ne û edebên reftarên olperestên ku dixwazin xwedê nas bikin, vedihewîne, jixwe ew olperest rêzikên ku wan nêzî Xwedê dikin û wan digihînin hezkirina wî ya bêalî. http://al3zy.net/?p=542.

[10] Tekî destoêkê ji tenêbûna kesê sofî re dihat gotin. Ew jî ji kurdî hatiye, tê wateya "Tenê dimîne". Hin dibêjin ku ev peyv ji ya erebî "Itekee" hatiye. Jixwe ku ev be tê wateya cihê vehesîna rêwiyan.

[11] http://middle-east-online.com/?id=155294

[12] http://alsalamy.yoo7.com/t4-topic

Elneqişbendiye Elhusêniye.

Elweysat.

Malbata Ecan Elhedîd.

Malbata Bavê Abid Elhusênî.

Elbûnasir Elseyadiye Elrifaîye Elhusêniye.

Eldirêfat Elrifaîye Elhusêniye, malbata şêx Salih Eldirêfî Elrifaî.

Îran jî ji bo ku herêmê bixe şîe, di sala 2000î de dest bi operesyonekê li rojhilata Sûriyê kir. Deverên xizan li rojavayê Dêrezorê û bajarê Elbokemalê, deverên herî zêde ji Şîan re armanc bûn. Bi awayekî giştî rêjeyeke kêm ji Şîan li bajarokê Elhetle ya ku dikeve rojhilata bajarê Dêrezorê, hene. Hejmara wan ne zêdeyî 1000î bû ji tevahî niştecihên bajarokê ku hejmara niştecihên wê nêzî 250000[13] kesî ye. Hin malperên opozisyona Sûrî diyar dikin ku operasyona şîîkirina li herêmên dibin kontrola rêjîma Sûrî de li Dêrezorê, zêde dibe. Li gundê Elcefre nêzî balafirgeha Dêrezorê, rêjeya şîabûnê gihaştiye %90 ji hejmara niştecihan. Ev rêje li gundê Elhîsan gihaşt %20 û li gund û bajarokên Elsixîre, Elseiwe û Elkesre gihaşt %10[14].

Xiristiyanî jî li wir hene, piraniya wan Ermenî ne, her wiha Suriyan jî hene. Bi giştî hejmara xiristiyanan kêm e. Li gorî rapora Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan[15], hejmara xiristiyanan li Elbokemalê ne zêdeyî 3 malbatan e û li Meyadînê malbateke tenê heye (Malbata Babêk)[16]. Rêjeya xiristiyanan a herî mezin li Dêrezorê ye, nêzî 150 malbatî ye. Hejmara tevahî xiristiyanan nêzî 1200 kesî ji hejmara giştî ya niştecihên bajêr ku hejmara wan 500,000 mirov e. Ji vî 1200 kesî zêdeyî nêvî ji tîreya (tayife) Siryanên Ersezoks in. Her wiha ev 150 malbat li ser pênc biran tên dabeşkirin; Siryanên Ersezoks, Siryanên Kasolîk, Ermenên Ersezoks, Ermenên Kasolîk û Ellatîn (Keboşî). Li Dêrezorê 5 dêr jî hebûn.

---

[13] http://burathanews.com/arabic/levant/198622

[14] http://www.orient-news.net/ar/news_show/78758

[15] Sûriyên xiristiyanî li Dêrezorê, Rewangeha Mafê Mirovan, http://www.syriahr.com. Xiristiyanên Dêrezorê, https://www.alaraby.co.uk.

[16] https://www.aljumhuriya.net/ar/35532

Ramngêrê navneteweyî di pirtûka xwe ya bi navê "ji dewleta kahinên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve" wisa dibêje: "Bawerkirina bi xwedawend 'Îl' ku wekî xwedawendê hevbeş yê qebîleyên samî tê hesbandin, pêşketinekê dide diyarkirin. Ev pêşketin ji cem pêxmber Ibrahîm dest pê dike û li cem pêxember Muhemed yê ku gihaşt têgeha "Xwedê" yê bihêz yê ku xwediyê 99 navn e, bi dawî dibe. Bi rastî Xwedê ew vedana hizirî ye ji navendîtiya qebîleyên ku 10,000 sal li Nîvgirava Erebistanê berdewam in. Ta ku Xwedê bû semboleke bihêz yê qebîleyên samiyan, di gelek qonaxan re derbas bû. Bi pêxember Muhemed re gihaşt lotkeyê. Şêweyê xwe yê dawî stand, ji ber ku ew nasnameya îdiyolojî ya civaka bazirganan e, her wiha ew xwedawend e ku ji aliyê neteweyî ve yê ku vedana îdiyolojî ya herî bilind li cem samiyên ereb e, cuda dibe. Xwedanê Muhemed di rêya yekirina qebîleyên sereke re pêwîstiya bihêzê dide diyarkirin. Jixwe ev nêrîneke hevpar e di nav qebîleyên koçber de û ji bo qebîliyên yekbûyî re hêz e..."

Ji ber sedemên topbarankirin û tundiya girûpên terorê, her wiha kuştin û binçavkirina ji hêla dizan ve, piraniya xiristiyanan ji Dêrezor, Elbokemal û Meyadînê pena bûn.



Wêrankirina Dêra Ermenî ya pakên Topbarankirina ku goristan û pakrawan li Dêrezorê ji hêla teroran ve17. mezr tûşî tên18

[17] Fapiyos gefên wêrankirina dêra Dêrezorê dixwe, https://www.annahar.com
[18] Wêrankirina mizgeftan li Dêrezorê, di navbera moşekên balefirên şerker û hişkiya DAIŞê de, http://deirezzor24.net/archives/6918

# Koçberî

## Sedem û Encamên Wê - Koçberiya Kurdan

## (Beşa 2)

### Koçberîyên Kurdî

Kurdistan (welatê Kurdan): Ji ber erdnîgarî û çanda wê ya çandinî û sewaldarîyê mîna dergûşa serdema Nîyolîtî dihat naskirin. Her wiha ew qada ku şoreşa çandinî û gundîtîyê tê de pêk hatîye.

Bi rêya teknîkên şûnwarnasîyê (erkolojî) tekez bûye ku ew xwedî çandeke aram e û koka wê digihêje 11 hezar sal B.Z. Ji vê dîrokê kevntir di cîhanê de nîne. Xebatên lêgerînê tekez kirin ku komên niştecihbûnê li Amed, Tişay Onî, Erxenî, Çemê Kotîbar, Çemê Xalan, Elih, Newala Tişûreçê û Sêwerek (Ruha) hebûn. Dîroka wan vedigere 10,000 sal B.Z. Her wiha şûnwarên gundên pêşî bi navê GUND di binê girên axî yên di navbera Dicle û Feratê de hatine dîtin, ew jî mîna şoreşa serdema kevirî ya yekemîn tê zanîn. Peyva GUND jî bi Kurdî heman wateyê dide, bi zimanê Lolo tê wateya welatên cihên bilind.

Peyva Gundiwana bû Kurdîyan û di serdema navîn de bi zaravayê Selcûqîyên Îranî navê Kurdistanê lê hat kirin. Tu herêm di cîhanê de xwedî komên niştecihî wek vê herêmê heya vê radeyê kevn nîne. Kurd û welatê wan rastî hemû êrîşan hatin. Heger em ji Gilgamêşê Sûmerî dest pê bikin em ê bibînin ku Babilî, Asûrî, Paris, Hêlînî, Romî, Sasanî, Bîlî, Aşûrî, Persî, Hêlînî, Romî, Sasanî, Bîin em ê bibînin kud. de ê Xalan, Batman, Newala Ttişûre û Sêfirkzentî, Ereb, Tirk û Mengolîyan li pey hev ev herêm dagir kirîye. Ev kelepûr heya roja me ya îro berdewam kirîye, carinan li hev dikevin û carcaran jî dibin yek. ″Ji Dewleta Şamanên Sumerî Ber Bi Şaristanîya Demokratîk Ve Ocalan R.23-351-352".

Di hemû serdemên ku bi ser Kurdan derbasbûye de, dîyardeya koçberîyê jiyan kirine û heya roja me ya îro jî dewam dike. Lê belê koçberîyên Kurdan ne mîna koçberîyên gelên din bûn, ji ber ku Kurd bi hin gelên ji xwe cuda, weke tevneke resen û bi rengekî mirovî, demokrasî û biratî jiyan kirine. Ev yek weke kelepûreke çandî û xwezayî çêdibû. Kurdan

bêyî ku li rewş û encamê bipirsin, piştgirêya hemû gelên din di hemû tengasîyan de dikir, an jî di êrîşan de xwe dispartin çîyayan, da ku kelepûr, çand û şaristanîya xwe biparêzin.

Gelê Kurd ji destpêka dîrokê ve rastî koçberî û sirgûnîya li ser destên desthilatdar û ferwerîyên ku hatine Mezepotamyayê, hatine; wek mînak: Di dema qiralê Ekadî (Tekla Bilasir ê sêyemîn) de, 5000 Mîdî (Kurd) sirgûnî herêma dîyalayê kirin (çavkanî: "Dîroka Suryanan li Mezepotamyayê", werger Ehmed Silêman Elibrahîm).

Ev kiryarên nijadperest li ser niştecihên resen (Kurd ), bi destên êrîşkerên ku ji hemû alîyan ve hatin, berdewam kir. Hinek ji wan jî ev in:

1- Şerê Arî-Samî

2- Şerê Ekadî-Kûtî

3- Şerê Asûrî-Mîdî

4- Şerê Asûrî-Orarto

5- Şerê Pars-Yûnan

6- Şerê Romî-Sasan

7- Şerê Ebasî-Bîzentî

8- Şerê Selcûqîyan

9- Şerê Osmanî-Bîzentî

10- Şerên Mengolîyan.

Ev netewe ne ji gelên herêmê yên dîrokî bûn, lê tevî wilo jî weke hêzeke dagirker derbasî wê bûne û xwestin dest deynin ser xaka herî fireh û dewlemend. Ji bo vê yekê hemû amûr bi kar anîn (ol, hêza leşkerî ya pir hejmar û çek).

Di serdema nêzîk de, bi destpêka serdema Selcûqî ya ku ji serdemên din ne çêtir bû, Kurd sirgûnî bajarên Sûrîyê kirin, bi taybetî bajarê Helebê, ew jî bi bihaneya alîkarêya Tirkan di şerên ku dikin, ji ber ku Kurd jî weke tirkan misilman in. Lê belê armanca wan koçberkirin û dûrxistina Kurdan ji welêt bû. Tevî ku çaxê hatina Tirkan ji Asîyaya navîn; Rojhilata Navîn şaristanîyên pêşketî dîtibûn. Şaristanîtîya Îranî û Erebî qonaxeke pêşketî ji koletî û çînîtîyê, jiyan dikir, lê Tirk gelekî hov û dûrî şaristanîtîyê bû.

Di dema şerên Selahedînê Eyûbî yên pey hev de yên li dijî Xaçparêzan, bi armanca xurtkirina sînorên Islamê, koçberîya mezin û berbiçav di serdema wê dewletê de pêk hat. Hinek ji Kurdan di sedsala 14`an de bi armanca xurtkirina desthilata Memlûkîyan koçberî Şamê û Libnanê bûn. Her wiha berê xwe dane Misir û Sûdanê jî. Kurd li wan welatan belav bûn û heya roja me ya îro li wan deran niştecih in.

Bajarên ku Kurd koçberî wan bûne: Bajarên Sûrîyê (Heleb, Şam, Himis, Hema), bajarên Libnanê (Kerk, Cibêl, Çîyeyê Amil, Terablos, Bîqa, Zehlê, Ekar, Çîyayê Şof), li bajarên Urdunê (Selt, Eman, Zerqa, Aqebe, Resîfe), li bajarên Filistînê (Celîl, Quds, Yafa, Nablos, Cinîn), her wiha Kurd li Misrê jî li cihên cur bi cur ji Iskenderêya ya bakur bigire heya bi Eswana başûr belav bûn. Hinek ji van koman xweserêya xwe ya Kurdî (çandî û dîrokî) parast. Piştî ketina paytexta Ebasî (1258 Z), ji ber ku Moxolîyan welatê Misilmanan dagir kirin, koçberîyên din çêbûn.

Van koçberîyên bi zorê heya serdema Memlûkî, Osmanî û yên li pey wan bênavber, berdewam kir. (Kurdên derveyî Kurdistanê, D.Mihemed El-Siwêrî).

Koçberîya herî gemar û zordar di sedsala 16 û 17`an de bû. Di serdema dewleta Sefewî û Osmanî de yên ku ne tenê dixwestin Kurdan koçber bikin, lê belê dixwestin demoxrafîyê; bi taybetî ya Kurdistanê biguherînin. Kurdistan li gorî berjewendîyên xwe kirin qadeke şerê giran.

Lê belê dewleta Osmanî di wê demê de ranewestîya û rêya xwe ber bi bihêzbûn û serdestîyê ve vekir. Sîyasta zordestîyê bi rêya fermanan di sedsalên 8 û 10`an li dijî binemalên Kurdan yên olî, mîna fermana 1918`an pêk anîn. Ev ferman der heqê Kurdên Ezdehayî (Êzdî) de bû ku bi zorê ji xaka xwe koçber bûn û berê xwe dan welatên cîran weke Rusîya, her wiha ji ber zordestîya wan revîyan deştên welatê xwe Kurdistan a ku bi navê Rojava tê naskirin.

Carinan dibe ku hinek dîrokzan mirov têxin şaşîtîyên dîrokê, bi taybetî li ser kirîyar ên çewisandinê yên ku li ser Kurdan û şaristanîya wan de, pêk hatine ku ev dîrokzan bi rengekî eşkere alîyên wan girtin û ji bo mezinkirina hin welatan, bi rêya serkeftinên aşopî re ku rêka cîhanê guherand, hinek şaristanî û welat ji holê rakirin. Ev yek ket rajeya xurtbûna hêzên mezin ên ku cîhanê bi bihaneyên demokrasîyê û parastina mirovan, bi rê ve dibin.

Mînaka herî mezin Rûsîya ye û tiştê ku di serdema Stalîn de çêbû û kirîyar ên wî yên li dijî Kurdên Kurdistana Sor a ku rastî gelek koçberîyên bi zorê û li pey hev hat. Bi gotineke zelal rastî (qirkirina laşî û çandî) hat, mîna xwişka xwe Kurdistana başûr ku ew jî rastî komkujîya Enfalê û gorên komî hat.

Bi destpêkirina şoreşa Şêx Seîdê Pîran, Atatork xwe avêt hembêza Stalîn û jê daxwaz kir ku dawîyê li Komara Kurdistana Sor bîne.

Di sala 1930`î de bi rêkeftineke sêalî (Îran, Tirkî, Yekîtîya Sovyêtê) şoreşa ”Agirî Dax” bi serkêşîya Nûredîn Paşa hat têkbirin. Di heman salê de Stalîn dawî li komara Kurdistana Sor anî û Kurd li dewletên Yekîtîya Sovyêt ya berê, belav kirin, mîna (Okranya, Moldavya, Qerqîzya, Ozbekistan, Tecekistan, Tirkmenistan, Kezexistan).

Ekademîsyan Nadîr Kerîmofîç Nadîrov dibêje: Koçberîya yekemîn di sala 1937′an de bû. "Em di vagonên trênê bi sewalan re şandin, dinya pir sar bû". Di serdema şerê cîhanê yê duyem de û di sala 1944′an de dîsa Yekîtîya Sovyetê dest bi koçkirina Kurdan a bi zorê ji Curcistan û Ermenistanê ber bi xîzistana Kazaxistanê, Ozbekistan, Qerxîzistan û Tirkmenistan kir. Ev koçberî vê carê bi bihaneya ku Kurd mîna Elmanan ji regeza Aryan in pêk hat, tevî ku gelek ciwanên Kurd di enîyên şer de li hemberî Nazîyan şer dikir. Jixwe Tirkî hevalbenda Nazîyan bû. (Kurdên derveyî Kurdistanê, ”D.Mihemed El-Siwêrî”).

Ji ber ku Kurdistan wargeheke jîndarî û erdnîgarîyeke pir girîng e, her wiha Kurdistan ji bo avakirina demokrasî û yekîtîya niştimanî, ji destpêka dîroka mirovahîyê û heya roja îro, dibe palpişteke bingehîn, êdî ji bo ku vê giringiyê şîlo bikin; welatên ku Kurd bi hemahengî bi gelên wan re jiyan dikin, dest bi xêzkirina nexşeyeke sîyasî kirin ku pişaftin, çewisandin û parçekirinê di nava xwe de dihewîne. Armanca wê jî çewisandina nasnameya çandî ya Kurdan bû. Ji ber vê yekê dest bi pêkanîna sîyaseta tunekirinê, qirkirina laşî û çandî kirin. Her wiha xwestin hevgirtin û resenîya wê ya ku di dîroka mirovahîyê de hatîye çespandin û ya ku xelekeke girêdanê di navbera dema niha û berê de ye, bi dawî bikin. Nexşeya sîyasî ya dewletên ku Kurdistan dagir kirine, rajeya berjewendîyên van dewletan dike. Ji ber ku xwe dispart kar û bazara dan û standinê, ango ji alîyekî ve Kurdan weke nimûneyeke regezî û cuda pêşkêş dikin, da ku ji sîyaseta wan

re bibin rûyekî demokrasî, lê ji alîyekî din ve jî dema ku Kurd bixwazin dîroka wan a rast derkeve, wan biçûk dikin. Her wiha ew weke amûreke sembolîk ji bo bikaranîna nasnameya domkrasîyê di sîyaseta xwe ya li hemberî gel û kêmneteweyên bi wan re dijîn bikar tînin. Êdî heya gihişt asta ku belavbûna berheman, dan û standin, belavkirin û mezaxtina di warê sîyasî de, bû tiştekî asa û xwezayî. jixwe ev nexşe ne tenê di warê sîyasî de bû, lê belê gihaşt warê leşkerî, aborî, civakî û heya erdnîgarîyê jî û xwedî stratejîyeke kûr bû.

Bi gelemperî, ev rewş hemû ne tenê encama kedxwarî û çewisandina ku di rastîya ferwerî û desthilatên serdest de yên girêdayî pergal sermayedar de ne; lê belê ew xwedîyên sîyaseta qirkirina çandî ne. Ev sîyaset jî dixwaze rastîya Kurdan di warê netewe û dewletê di milên civakî, aborî û çandî de ji holê rake. Lê belê rewşa civaka Kurdî li hemberî van kiryarên ku li seranserî cîhanê mîna wan nîne, rûbirû maye. Jixwe astengkirina têkilîyên civakî û çandî û pişaftina regezan a bizorê, berhema sîyaseta stemkarîya sermayedar e. Her wiha kiryarên pişaftina ziman û çanda gelan û têkbirina wan, kirîyar ine dijsincî ne.

Jixwe ev sîyaset sedema sereke ya koçberkirina Kurdan û qewitandina wan ji welatê wan ê resen bû. Ev yek tekez dike ku piranîya koçberîyên Kurdan di bin zor û zordarîyê de bûn.

Lê alîyê din ê sîyaseta wan ew bû ku gund û bajarên Kurdan bi xizanî, paşketin, venegeşbûn û windabûna di nava bîyanîya civakî, aborî û dîrokî de girê bidin.

Ev yek di sîyaseta dewleta Tirkîye, Îran, Sûrîye û Iraqde ya ku li dijî Kurdan bi awayekî neyekser tê bikaranîn, tê xuyakirin. Ew jî bi rêya paşguhkirina herêmên Kurdan di warê avakirina zanîngeh, sazgeh û kargehan de û rêgirtina li hember pêşxistina avayî ji bo ku xweşguzarî û aramîyê bi xwe re neyîne. Her wiha bajarên Kurdan wekî bajarên dûr bi nav kirin, da ku Kurd her tim paşdemayî û nezan bimînin, an jî sedemeke sereke be ji bo ku Kurd li karan bigerin û li pey pêşketinê bikevin. Bi vî awayî neçar dimînin ku berê xwe bidin bajarên mezin ên van welatan. Di encamê de dev ji cih û warên xwe berdidin û koçberî navendên welat dibin.

Herêma Mezepotamîyayê, dayîka binirx e ku şaristanîyên pêşîn ên mirovahîyê afrandine. Ji ber hebûna derfetên pirbûnê û avhewaya guncav,

mirovahîyê ji wir dest pê kirîye û ber bi jiyanê ve çûye. Ev herêma xweş a ku mirovan ber bi xwe ve dikişîne, gelek êş û azar kişandine. Ji ber ku em di lêkolîna xwe ya beşê duyemîn de giranîyê didin koçberîya Kurdî, pêwîst e em binemala dîrokî ya gelên ku destê wan di guhertina dîroka herêmê de hebû û ev herêm kirine ya xwe, rêz bikin. Ew jî bi rêya kuştin, şer, talan û binpêkirina maf û çanda gelên herêmê (bi taybetî gelê Kurd) ên xwedî dîrokeke kevnar e, ew dîrika ku nîşana avakirina wan a kevirên pêşîn a jiyana mirovahîyê.

Hebûna tirkan li ser axa mezopotamîyayê:

Dîrok gelek piştrastîyên dike ku hin komên neteweyên Sîbîrêya Başûr ku Tirkên destpêkê komek ji wan in, di salên 9000-7000 B.Z de koçî başûrê ku bi navê Çîn, Korêya, Japonîya, Mengolîya û asîyaya Navîn têne naskirin, bûne. Her wiha ber bi rojavayê wê ve jî koç bûne weke (Elhon, Tabgnac, Farî, Kokter, Oygur, Qere Xanî) yên ku bi ola “Kok Tengirî” bawer dikirn. Weke ku tê zanîn ev netewe bi qirikirn û rûxandina neteweya berî xwe, dighaştin desthilatdarîyê, tevî ku nêzîkatî û girêdanên xwîn û olê weke ku ew dibêjin di navbera wan de hebû. Ev tenê pişkeke ji dîroka Tirkan ya ku rewşa wan a niha nîşan dike.

Yekem belgeyên nivîsandî yên Çînî jî qala êrîşên Oyguran li ser neteweyên cîran di salên 200 B.Z de dikin û Oygurî li gorî gelek nêrînan pêşîyên Tirkan e. Tirk li gorî ku dîrok tekez dike, dema ku ji nîva Asîyayê hatin, hîn bawerîya xwe bi ola Islamê nanîbûn. Rêjeyeke pir kêm ji wan ji ber zuhayî, xela û pirbûna şêniyê koçberî Rojhilata Navên bûn. Bi êrîşên xwe ber bi Îranê ve çûn (Cahiz dibêje: Tirk heweskarên şer bûn). Dema ku Tirk hatin herêmê, hîn şaristanîyê nas nekiribûn, ji ber vê yekê pêşketineke bîrdozî û ramyarî ya ku guhertina çînîtî û şaristanîyê peyda bike, li gel wan çênebibû. Bawerêya Tirkan bi islamê jî, weke îdeolojîyayeke ku rê li ber firehbûn û êrîşên wan veke, bû. Tirk bi rêya islamê re dikarîn çavbirçîtîya xwe ji firehbûnê re li ser hesabê niştecîyên resen pêk bînin. Ew niştecih xwedîyên çanda mirovahîyê û jiyana hevbeş bûn a ku ji dîroka xweyî kevnar a li herêmê girtine. Tirkan destpêkê ji Selcûq, Qîlxaî, Xegtay, Teymûrî, Osmanî (ola islamî, Henefî, Sunî) û ta roja me ya îro, şûrê islamê li ser herêmê bi kar anîye. Gelek hêz û serwerî ji vê yekê qezenc kirin. Ew kiryarên qirkirina Turkmenan jî vî tiştî pişrast dike. Kurd û Turkmen çînên

çewisandî ne, lewre xwe avêtin çîyayê Kurdistan û Torosê. Ji wê demê û pê ve Tirkan rêgezên qirkirina fîzîkî, çandî û dîrokî bawer kirin. Ev rêbaz ta afrandina dewleta Tirkî ya niha şopa xwe berdewam dike ku xwe weke lawê mezin ji deverê re dibîne.

Dewleta Tirk ji dîroka xwe ya kûr ve, weke dewleteke zîrek di qirkirin û komkujîyên der barê gelan de û qewitandina wan ji welatê wan, tê nasîn. Ji xwe rêwîtîya Seferbelikê jî nayê jibîrkirin. Ew rêwîtîya dirêj ji koçkirina neçar, di bin sîwana erka olî û niştimanî de bû û bû dîyardeyeke dîrokî ku dema qala sitemkarî, zordarî û nemirovatîyê tê kirin, ev rêwîtî weke nimûne tê arastekirin. Gelê Kurd jî gelek êş ji vê dîyardeyê kişandin, bi taybet ji alîyê koçkirina ji welatê xwe ve. Ev yek jî hebûna gelê Kurd li hemû welatên Erebî, Spenyolî, Rûsî û hwd tekez dike. Dewleta Tirk pilanên xwe yên nemirovî neguhertine ku cureyên herî gemar ên zordarî û sitemkarîyê li dijî gelê Kurd, pêk anîne. Vê yekê jî Kurd neçar kirin ku yan koçî bajarên mezin bibin, bi armanca ku li ewlehî, aramî û jiyana xweş bigerin. Mebesta tirkan jî valakirina herêmên Kurdî bû. Ji wan bajarên ku Kurd koçî wan bûn ev in: (Ezmîr, Mêrsîn, Adana, Stenbol), li gor serjimêriyan 5 melîyon Kurd li Stenbolê hene. Neçarîya din ya Kurdan ew bû ku koçî derveyî sînorên welatê xwe yê resen bibin û ber bi dewletên cîran ve yan ber bi dewletên Ewrûpî ve biçin. Bûyera koçkirina serdemî di sala 1925`an de hate jiyankirin. Piştî têkçûna şoreşa Şêx Seîd a ku li tevahî beşên bakurê Kurdistanê çêbû; dewleta Tirk Ji bo vemirandina berxwedana Kurdî, dest bi pilanên çewsandinê li hemû bajar û gundan kir. Di serê van pilanan de, pirojeya ku bi serenava Pilana çaksazkirina Rojhilat (Şerq Islah Pilani) bû ya ku cîgirê Kemal Ataturk ”Ismet Inonu” pê rabû. Ew jî pirojeyeke mîna pirojeya "Zinara Erebî" ya li dijî Kurdan li Rojava ye, tenê cudahîyeke di serenavan de bû. Armanca sereke ya wê pirojeyê, qirkirina çandî û kêmkirina nasnameya Kurdî bû, ew jî bi rêya çewisandin û reşkirina wê bû. Ev yek jî bi hemû navgînan pêk anî, da ku gemarîya pilana xwe li ser gelê Kurd veşêre. Dewleta tirk, li gorî pirojeya ku bi biryarên komarî dihat birêvebirin, dest bi koçkirina kotekî li dijî gelê Kurd kir; bi taybet li herêmên ku bi raperînê bandor bûbûn. Ew koçkirin ber bi herêmên desthilatdarêya dewleta Tirk ve çêdibû. Encama wê pirojeyê jî koçkirineke komî ya Kurdan ber bi Libinanê ve bû, bi taybet ji Amedê. Ev koçkirin ta sala 1940'î

berdewam kir. Rêjeya koçberên ku gihaştine wir nêzî %80 bû. Ew jî li wir bi temamî niştecî bûn. (Kurd li Derveyî Kurdistanê, D.Mihemed El-Siwêrî)

Beşê mezin ji wan, berê xwe da Rojavayê Kurdistanê ku ew weke parastgeheke biewle ji sitemkarêya artêşa Tirk dîtin. Ji ber ku hebûna xeteke tirênê ku bakur û rojavayê Kurdistanê jev vediqetand, gelê Kurd navê "Binxetê" li Rojava û navê "Serxetê" li bakurê Kurdistanê kir. Piranîya koçberan jî ji rewşenbîr û welatperweran bûn ku Rojava ew hewandin û hêza xwe ji xizmên xwe yên herêmê girt. Piranîya herêmên ku tûşî koçberîyê bûn, ev in: Wan, Mêrdîn, Amed, Ruha, Mûş û Bedlîs. Lê belê piştî ku rewş aram bû, piranîya koçberan vegerêyan xaka xwe. Ew koçberî bandoreke wê li ser guherandina pêkhateyên Kantona Cizîrê, di wê çaxê de, hebû. Berpirsyarên Tirk ji mêj ve ta roja îro di axaftinên xwe de raperînên Kurdan ên bi navê ”Raperînên paşeverû yên olî” tînin ziman. Raperîna Şêx Seîd jî berxwedaneke bi rengê olî bû lê bi taybetmendîyeke neteweyî bû. Her wiha hembermayîneke rijd li pêşberî Komara Tirk bû a ku gelek dijminatî û armancên qirêj li hember gelê Kurd, di nava xwe de vedişart. Eger em rewşên wê demê bigirin ber çavan, em ê bibînin ku tu çare nebû ji bilî ku rengê olî yê bi taybetmendîyên neteweyî, li raperînên xwe bar bikin. Heman tişt li gelek welatan û bi piranîya gelan re çêdibû. Loma nabe ku rengê paşverûtîyê li raperînên ku di serdema Osmanîyan de çêbûne, were kirin û nabe ku bi qirkirin û komkujiyan werin sizakirin.Tirkan jî dizanî ku ew bi misilmantîyê pêş ketin û bi hêz bûn, bi vê yekê hişmendîya çînî li gel wan zêde bû. Jixwe ew bûn ên ku dewleta xwe bi paşverûtîya islamîk bi pêş xistin.

Bi rastî Tirkîyê ji mêj ve rêgeza zordarîya rêxistinkirî li ser Kurdan bi kar anîye, nemaze piştî pergala zagonî ya ku ciwanên Tirk di sala 1908`an de nû kir.

Kesên ku bi hevgirtîyê bang dikirin, ji dema şerê cîhanê ve zagonek amede kiribûn. Ew zagon ji hêla Xelîfe ”Mihemed Reşad yê pêncem" ve hatibû mor kirin. Zagon ji dehên xalan pêk dihat. Mebest jê sirgûnkirina Kurdan ji welatê bav û bapîrên wan bû. Li gorî vê zagonê 700.000 Kurd, li gorî tomarnameyên rêveberêya koçberîyê li Kastintînayê ”Constantinople”, di wê demê de ji malên xwe hatin qewitandin û ber bi herêmên Tirkî ve hatin şandin. Ew li gundên Tirkan bi rêjeya %5 ji niştecîyên tirkan hatin

belavkirin. Jixwe rîspî û serkêş li bajaran hatin bicihkirin, ji bo ku têkilî di navbera wan û Kurdên din de were birîn. Lê Tirkîyê di dawîya şerê cîhanê yê yekem de û piştî encamên peymana Lozanê, hebûna xwe ya neteweyî di metirsîyekê de dît, loma ji berdewamkirina karê xwe vegerîya. koçkirin li ser gelê Kurd giran bû ku di rê de ji ber qehr û birçîbûnê mirin, gelek ji wan li ser destên cendirmeyên Tirkan jiyana xwe ji dest da, tenê jimareke kêm karîbû vegere Kurdistanê.

Êdî ji ber ku gelê Kurd bindestî, têkçûn û koletîyê napejirîne û ji bo tolhildana serhildana Şêx Seîd, gelek serhildanên Kurdan li pey hev hatin. Mîna serhildana Agirî li herêma Serhedê di sala 1927`an û 1930`î de. Ji ber van serhildanan û ji ber ku Kurdan daxwaz kir ku bi çavê mirovahîyê li mafê wan yê rewa mêze bikin. Êdî Kurd careke din bi kiryarên hovane li hemberî koçeberîyeke bi darê zorê hatin ku gihaşt asta qikirina fîzîkî, derûnî û çandî. Ji ber stemkarêya dewleta Tirk, Kurdan ji herêma Serhedê ber bi herêmên din ên bakurê Kurdistanê ve koç bûn. Lê dewleta Tirk komkujîyek li devera Gelîyê Zîlan li ser Kurdan pêk anî, loma navê komkujîya Gelîyê Zîlan lê hate kirin, her wiha beşeke din ji Kurdan koçî Îranê bûn.

Di pey van serhildanan re, li Dêrsimê serkêşên dewleta Tirk û bi erêkirina Ataturk, Kurd bi darê zorê koçberî bajarên Tirkan kirin. Ji ber wilo em dikarin bibêjin ku taxeke Dêrsimîyan di her bajarkî Tirkan de ava bûye. Ew bajar jî ev in: Stenbol, Ankara, Izmîr, Adana, Mêrsîn, Keyserî, Dunzly, Mogla, Malatîya, Aydin û hwd.

Di heman dema wan bûyeran de, Seyid Riza û hevjîna wî Besê jî, agirê berxwedanê li herêma Dêrsimê pê xistin. Ji ber kiryarên hovane gelek berxwedêr ber bi çîyayê Kurdistanê ve çûn û li hemberî çekên kîmyawî hatin. Yekî ji serbazên Tirkan xwe bi van sûckarîyan paye kir û got: "Me ew di şikeftan de weke mişkan fetisandin".

Di wê demê de bêtirî 20 - 70 hezar Kurd li Dêrsimê hatin qirkirin. Ev ji bilî koçberkirina 20 - 30 hezar Kurd ku piranîya wan zarok bûn. Tirkan, bi aramanca pişaftina di nav çanda Tirkî de, ew birin û li malbatên Tirkan belav kirin, di nav wan de keç jî hebûn, ew keç bi fermandarên artêşa Tirkî re hatin şûkirin û gelek ji wan jî li bazaran hatin firotin.

Ji ber ku dewleta Tirk di sîyaseta tunekirina fîzîkî, çandî û derûnî de têra xwe pispor e, hewl da ku bi çend rêbazên din gelê Kurd koçber bike. Ev tişt

di sala 1960`î de bi rengekî zelal û berfireh di nava kedkarên Kurdan de tê xuyakirin. Ew jî dema ku li dewletên cîhanê ji Awistralya bigire ta Siûdîyê û ji Ewrûpa ta welatên Iskendenavî, hatin firotin. Ev kirîyar ne tenê ji bo dûrxistineke fîzîkî ji Kurdistanê bû, lê belê ji bo pişaftina hebûna Kurdî li Tirkîyê ye. Amaran da zanîn ku tenê li Elemanyayê nêzî 1.5 milyon Kurd hene.

Iêdana leşkerî ya di sala 1980`yî de ya ku Ceneral Kenan Evrîyîn yê ku kiryarên wî bi Kurdan re pir xirab û tund bû, pêk anî; zemîneke koçberîyê ya ber bi welatên cîranan ve çêkir, nemaze hin kom ber bi Libnanê ve çûn. (Kurd gelê kul û derdan e. Selah Ebû Şeqra R. 59-61).

Miletê Kurd yê ku têkoşîn û berxwedanê dike da ku hebûna xwe ya dîrokî mîna gelên cîhanê bisepîne, di sala 1992`an de dewleta Tirk gelek astengî li ser wan ava kirin. Ev astengî ta sala 1994`an berdewam kirin. Ji ber ku dewlata Tirk nikarîbû gelê Kurd neçar bike ku dev ji xaka xwe berde, careke din dest bi sîyaseta tunekirinê kir û gelek binçanvkirin û komkujî pêk anîn. 5000 gundên bi ser Şirnax, wan û Cizîra Botan ve şewitandin, di encamê de 20,000 Kurd koçberî bajarên Tirkîyê bûn.

Lê beşê ku ber bi başûrê Kurdistanê ve çûn, ne tenê rastî êrîşên dewlata Tirk hatin, lê belê rastî gelek koçberîyên lipeyhev hatin. Destpêkê ji kampa Bêsef û paşê Şeranîş, Gelî qîyametê, Fatroş, Nînewa û kampa Nehdarê heta ku gihiştin Mexmûrê ya bi ser Nînewa ve, êdî li wir bi cih bûn. Ev kampên derbasbûyî ji 12,000 koçberî pêk dihat. Nêzî 7000 koçber ji ber êrîşên dewleta Tirk, koçî Kampa Simêlê bûn. Ji ber ku ev koçberî di bin teşeyeke sîyasî de bû, heta ku ev pirsgirêk neyê çareserkirin, koçber nikarin vegerin welatê xwe.

Ev sedemên ku me anîn ziman, hişt gelê Kurd koçbrî bajarên mezin yên dewleta Tirk bibn. jixwe koçberîya  Kurdan ber bi dewletên Ewrûpî ve jî ber biçav e (Norwêc, Danîmark, Fînland, Avusturya, Fransa, Îtalya). Jimara mezin ber bi Elmanyayê ve çû, jixwe rmanc jê peydakirina kar, ewlehî û aramîyê bû.

Hebûna Farisan li ser xaka Mezopotamyayê:

Peyva Îranê ji ”Arayan” hatîye. Ev nav li hozên ku li bakurê Asîyayê rûniştîbûn dihat kirin. Piştre tevî sewalên xwe bi armanca qezenckirina av û çêrîyê koçberî alîyên başûrê rojava bûn û li wê deverê bi cih bûn. Tê gotin

ku Zeredeşt yekem kes bû ku Berî Zayînê bi çend sedsalan, navê "Îranî" ya ku tê wateya "xanedan" li niştecihên van zozanan kir. Gelek payînên dîrokî hene ku koçberîya  Farisan ji Asîyaya navîn û ji herêma deryaya Reş û Xezer bi hozên Arî re, nifşo nifşo ber bi herêmê ve hatine. Li alîyekî din jî hin çavkanî didin xuyakirin ku Faris yek ji gelên Îranî yên kevnar in. Faris pêleke ji pêlên gelê Hind-Ewrûpî (Arî) ye ku ji destpêka hezarsalîya yekem Berî Zayînê ve, derbasî xaka Îranê bûye. Di wê serdemê de rûniştvanên resen ê wê herêmê, di jiyanek aştîyane de dijyan.

Împaratorêya Medan di "727-550" B.Z de li vê herêmê hatibû damezrandin. Medî yek ji gelên ku li bakurê rojavayê herêma ku niha bi navê "Îran" tê naskirin, dijiyan. Niha bi giştî tê gotin ku Medî ne ji farisan bûn, tevî ku her du jî ji hozên aryan in. Hozên farisî yên koçer li başûr li gel herêmeke ku navê wê kirin ”Faris” nêzî herêma Şîraz û Parsîs a ku bi yonanî tê wateya hov û talanker, bi cih bûbûn.

Di heman qonaxa rêxistinbûna Medan di warê dîrokê de, cara yekem faris bi navê xwe li ser dika dîrokê derketin û bi rêya belavbûna şaristanîyê, bû têgehek û nêzîkatîyeke xurt di navbera ziman û çandê de hat danîn. Jixwe hêj di erdnîgarêya Îranê de heye û seranserî herêmên Farisan û herêmên Kurdistanê jî derbas dike. Tê xuyakirin ku cudabûneke mezin di qonaxên dîrokî yên berê de çênebûye, lê belê di nava pergaleke hevbeş de bûn. Neperçebûna Farisan di wê serdema dîrokî ya dirêj de û bi berdewamî hêzbûna wan bi rêya Medan re, rastîyeke dîrokî ye. Malbata Exmînî di sedsala 6`an a B.Z de derket. Bi lêdaneke ji hêla ”Koreş” ve, desthilatdarî kete destê malbata Exmînî ya farisî (Exmînişyan). Elcahiz dibêje: "Faris timî daxwazê serwerîyê ne”. Hin dibînin ku Cihûyan bi alîkarêya Farisan, ji bo ku Împaratorêya Medan dagir bikin, bi darê zorê Koreşê Exmînî li ser hemû gelê herêmê kirin qiral. Şerê vê rastîyê ji hêla dewleta Îranî ve hat kirin û çi kesê ku ev rastî dîyar kir, hate bidarvekirin. Tu dikarî bibêjî ku tu nexşe û belge nînin ku rewşa Farisan berî Koreşê mezin (duyemîn) diyar bikin. Dîrok tekez dike ku Medan şaristanîyeke berfireh ku di sala 837`an a B.Z nêzî Kermenşahê hatîye vedîtin, ji Îranîyan re ava kiribûn. Li ser dika Îranê gelek Împaratorî di rêzê de hatin; mîna Împaratorêya Silcoqî di sala 330 - 150 B.Z, Împaratorêya Persî (Eşkanî ne) 250 B.Z - 226 P.Z, Împaratorêya Sasanî 226 - 650 P.Z di vê împaratorîyê de neteweya Farisî li ser hesabê gelên herêmê û paşmaya wan a dîrokî, pir geş bû. Ev

Împaratorêya xwedî pergala qiralî ya ku di nava malbata desthilatdar de rakendî ye, gelên di nava vê Împaratorîyê de piştguh kirin û heta hatina Fithên islamî berdewam kir. Her wiha ev fith bûne sedema gelek şeran li ser vê xakê û gelek binpêkirin der barê gelên herêmê yên resen de pêk anîn. Nimûneya herî li cih a li ser vê yekê, damezrandina dewleta Sefewî di salên 507 - 907 K de bû. Di vê dewletê de du dîyardeyên girîng derketin holê, ew jî ev in: Damezrandina yekîtîya Îranê û neteweya Farisî, lê bi rengekî islamî ku taybetmendîya wê jî tîreya Şîî bû.

Îran bi pergala (Meleyan) ya ku pirsgirêkên xwe bê bihane bi sizaya bidarvekirinê çareser dike, tê naskirin. Vê zozanê gelek pergalên cur bi cur dîtine. Van pergalan li hemberî gelê Kurd stemkarî, kuştin, koçberî, revandin û wêrankirin bi kar anîne. Ev bi zelalî di dîmena sîyasî de ya ku dewleta Sefewî li xwe girtibû, zelal dibe. Ew jî ji bo ku taybetmendîyên xaka Kurdî bi rêya peymanên sîyasî û leşkerî bi Osmanîyan re biguherîne. Osmanîyan Kurd neçar dikirin ku dev ji gund, bajar û xaka xwe berdin û ber bi gund û bajarên Farisan ve yan jî ber bi herêmên di bin serwerya wê de herin, weke koçberîya Kurdên Xuresanê bi sedemên sîyasî ku dewleta Sefewî ev kirîyar pêk anî ji bo ku Kurdan tune bike û ji bo ku parastina sînorê bakurê Xuresanê ji Mongol û Turkmenan bike. Jixw ev yek di sala 1510`an de di serdema Şah Ismaîlê yekem de pêk hat. Ev koçberî di serdema Şah Tehmasbê yekem de berdewam kir. Wî jî digot sedema vê yekê şerê tîreyî ye û ev şer bi hebûna Kurdan gurtir dibe, ji ber vê yekê ew bi kotekî koçber kirin û dûrî welatê wan Kurdistan xistin. Di vê koçberîya ber bi Xuresanê ve, Kurd li gund û bajarên derdora çîyayê Berz û bakurê Îranê bi cih bûn. Li alîyekî din Osmanîyan jî Turkemen û Şîî koçberî dewleta Sefewî kirin û Sefewîyan jî ew li ser xaka Kurdan bi cih kirin. Mebest ji vê yekê binyata civaka Kurdî bugerînin. Îranê jî ji alîyê xwe ve li dijî Turkmenên Sunî, sîyseta tirsê bi kar anî û ew neçar kirin ku koçberî Tirkîyê bibin û li ser xaka Kurdan li bakurê Kurdistanê bi cih kirin. Gelek caran berjewendîyên her du hêzan tenê di mijara girêdayî gelê Kurd de hevpar bûn. Loma her du alî hewl didan ku bi rêya guhertina demografîya Kurdistanê û miletên din di ser wan re bigirin ku ew bibin xwedî maf; hebûna Kurdan winda bikin. Tişata ku mirov di vê mijarê de matmayî dihêle, ew e ku ev hevpeymanî di navbera wan de li bajarê Kurdan dihat hûnandin, ew jî weke herêma Serhed ya ku li ser pilanên Sefewî û

Osmanîyan yên li ser Kurdan dîdivaneke dîrokî ye. Ji hêla xwe ve dewleta Sefewî ji berfirehbûna hêza Kurdî li ser destê Xanê Lepzêrîn (Mîrxanê Biradostî) di sala 1605`an ditirsîya. Vî kesî bi destaneyeke mezin a berxwedan keleha ”Dimdim”ê dîroka Kurdî zengîn kirîye. Ji bo jinavbirina vê hêzê, dewleta Sefewî hemû cureyên şer ên xirab ji tunekirina fîzîkî û veşartina nasnameyê, li hemberî berxwedêrên Kurd li wê kelehê bikar anî. Ew keleh, bi jinên xwe yên ku li beranberî xweradestkirinê xwekujî bijartin, navdar bû. Li alîyekî din jî dewleta Sefewî gelek gundên Kurdan vala kirin û bi kotekî ew koçber kirin, lê Kurdan dev ji gundên xwe berneda. Weke mînak li ser vê yekê: Tişta ku li gundewarên Ormîyê çêbû, hişt ku bajarê Ormîyê li ser destê gundîyên koçber were damezrandina. Sîyaseta çewisandin, pişaftina û qirkirina çandî li dijî Kurdan berdewam e. Her wiha koçbûna sîyasetmedarên Kurd ên ku ji ber biryarên stemkarî û zordarîyê dev ji welatê xwe berdan, berçav e. Weke mînak, dema ku şoreşa Qazî Mihemed di sala 1946`an de têk çû, piranîya sîyasetmedaran ji ber sitemkarêya dewleta Îranê koçberî başûrê Kurdistanê bûn û hinên din koçberî Ewrûpa û Emerîkayê bûn. Îranê, da ku Kurdan dûrî maf û doza wan bixe, mafê wan bin pê kir û ew weke kêmneteweyekî nîşan da. Lê gelê Kurd serî danexist û li hemberî wê stemkarîyê serî hilda û şoreş bi serpereştîya Qasimlo di sala 1979`an di serdema Xumeynî de li dar xist. Ev şoreş jî li hemberî çewisandin û zordarîyê dewleta Îranê derket pêş. Ev çewsandin bi taybetî li ser sîyasetmedar, rewşenbîr û ciwanên ku tu tişt ji bilî reva wan ber bi deverên aram ve li pêşîya wan nema, pê hat.

Di sala 1980`yî de û di dema şerê kendavê yê yekemîn de, careke din Kurd li hemberî komployeke Îranî-Iraqî hatin ku timî li hundir û derveyî xaka xwe fişarê li ser Kurdan dikin. Ji ber wilo gelê Kurd ên koçber li başûrê Kurdistanê rastî stemkarêya rêjîma Îranê hat. Careke din koçber bûn û piranîya koçberan ber bi Tirkîyê ve çûn. Gelek kampên koçberên Kurd hene, mînak: Kampa ”Iltaş”, kampa ku li Iraqê li herêma Enbarê bû, Kampa ”Welîd” û Kampa”Erd Elheram" ên ku li ser sînorê Urdin û Iraqê bûn û Kampa ”El Reşîd”. Hin koçberên Kurd li Kampa ”Kawa” ya ku li başûrê Kurdistanê ye û ”UNHCR” di sala 2006`an de ava kiribû, bi cih bibûn. Ev sedem hemû bûn hêmanên sereke ku hişt Kurdên rojhilat koçberî bajarên Farisî bibin; hin ji wan di nava çanda Farisî de hatin pişaftin û hinekan karîbû çanda xwe ya Kurdî biparêzin û hinekan jî nikarîbû dûrî welêt bijîn,

dema aramî çêbû vegerêyan. Di sala 1990'î de piştî rawestandina şerê kendavê li Îranê, rewşa wê ya aborî û ewlehî lewaz bû. Piranîya ciwanan koçberî Tirkîyê, Ewrûpayê û hin welatên din bûn. Ne tenê wisa, piştî rawestandina şer, Îranê sîyaseta ”nerm û zordar” li ser pêkhatîyan meşand. Di nav de danpêdaneke zagonî bi zimanên wan kir, zimanê Kurdî jî yek ji wan bû, lê zimanê Farisî yê fermî bû, ango "sîyaseta farisîkirinê" dimeşand. Ew danpêdan weke belgenameyekê li derve bi kar anî, da ku bi awayekî zagonî xwe biparêze û ji bo zordarêya xwe li hemberî gelên din bi taybetî Kurd, veşêre. Ev yek tenê ma bendek di magezagonê de û rê neda ku ev bend pêk were. Ji ber vê yekê dest bi avakirina gelek tiştan kir, weke: nexweşxane, dibistanên nimûneyî û zanîngeh, her wiha zêdekirina av, pir û torên ragihandinê li gund û bajaran. Lê belê tu teknîk û alavên nûjen ên çandinîyê ji bo pêşxistina çandinyê pêşkêşî herêmên Kurdan nekir, her wiha tu girîngî jî neda xwedîkirina sewalan. Bi armanca ku Kurd sûdeke kêm ji dewlemendîya Kurdistanê bigirin, hin zagon danîn da ku herêmên Kurdan ji alîyê aborî ve di bin destê dewleta Îranî de bimînin (bikaranîna girêdana aborî). Her wiha Kurdistan ji alîyê bazarganî ve jî dorpêç kir (Leşkerên xwe li seranserî sînorê Kurdistanê belav kir, tenê bazar û veberanînên xwedî pirojeyên biçûk ên ku bi rêjîma Îranê ve girêdayî, man). Bi vê yekê hişt Kurdistan û gelê Kurd di rewşeke aborî ya xirab de bijî. Bi van kirîyaran hişt gelê Kurd tenê bi parîyê nanê xwe û bi peydakirina aborîyeke aram mijûl bimîne, êdî ji bilî ber bi bajarên mezin ên Îranî ve, tu bersiv ji bo vê pirsgirêkê nedîtin. Ji bo ku Îran karibe serwerêya xwe li ser herêmê bisepîne; li her bajar, bajarok û gundekî kampeke leşkerî ava kir, ew jî ji bo ku gelê Kurd dûrî qada sîyasî bixe, her wiha rojhilatê Kurdistanê kir dergeheke sereke ya qaçaxtîya heyberên hişbirê, da ku tirsê li herêmê belav bike û vê herêmê ji her kesî re bikin herêmeke gumanbar. Her wiha tawanên zagonî li ser sermayedaran sepand û nehişt ku pereyên xwe li herêmên xwe bi kar bînin. Her wiha dewleta Îranî handan bi pirojeyên veberanînê bi taybetî li Kurdistanê nekir û tu girîngî nedayê. Li aliyekî din jî, ji ber ku dewleta Îranî Kurdistan kiribû herêmeke leşkerî û tê de zagon û rewşên awarte sepandibû û bi armanca misogerkirina pere û jiyana xweş; piranîya sermayedaran çûn bajarên mezin ên Îranê da ku kargehan li wir ava bikin, jixw ji vê yekê re jî koçberîya sermayedaran tê gotin.

A ji her tiştî girîngtir biyanîkirina civakê ya ku Îranê sepand, em dikarin navê koçkirina civakî lê bikin, bi taybetî ya zarokên ku demeke dirêj li kargehên mafûr û xalîçeyan kar dikin. Ev kirîyar bû sedem ku zarokan ji bayê paqij û wizeya lebatî (Bîyoenerji), têkilîyên civakî û mafê xwendinê dûr bikevin û mîna koleyan kar bi wan hat kirin. Li alîyekî din jî kar bi wan didin hezkirin ji bo ji çand û kultûra xwe dûr bikevin.

Dewleta Îranê ne tenê dixwaze herêmên Kurdî vala bike û koçberkirina bikotekî bisepîne, lê bi hemû hêza xwe hewl dide ku çand, nirx, wijdana hevbeş û şaristanîya Kurdî tune bike. Bi vê yekê hewl dide pergala sincî ya gelê Kurd biherifîne ku di encamê de Kurd bibin amûreke hêsan di destê hemû gelan de.

Hebûna Ereban li ser xaka Mezopotamyayê:

Ji bo naskirina agahîyên rasteqîn, dîrok gelek caran mirov ber bi lêkolîn û hûrbînîyê ve tajo. Hebûna Ereban li ser xaka Kurdistanê yek ji wan sedeman bû ya hişt ku em vê hebûna li herêmê lêkolîn bikin û rastîya sîyaseta wan ya ku li hemberî gelên herêmê pêk tanîn, vebînin. Ji dema ku Ereb di dîrokê de hatine naskirin, tu serkeftineke mirovî ku bibe nimûne û rêbaz ji gelên herêmê re bi dest nexistine. Lê mixabin ji serdema hebûna wan ve, rêbazên kuştin û talankirinê bi kar tînin. Tenê Serdema Cahilîyetê (serdema berî islamê) weke dîrokekê di destê wan de ye ku wateya wê li gorî navê wê dîyar e. ”ji ber ku destpêka regeza Erebî bi taybetî li Mezopotamyayê bi destnîşaneke hûrbînî nayê dîyarkirin. Dîdevana herî kevn li ser hebûna Ereban li vê herêmê; ew malbata ku ”Êdêsa Ûrfa” di sala 132`an B.Z serwerî kiribû. Navê wan dîyar dike ku koka wan ereb e. Hin agahî ji sedsala yekem berî zayînê ku der barê Ereban e ”niştecihên konan”, hene. Li başûrê Şingal û xabûrê digerêyan. Li alîyekî din jî wê koma Ereb hin bi hin ziman û kultûra niştecihên welatê Aramîyan dipejirandin, paşê hin Ereb ketin Mezopotamyayê û di sedsala sêyem de ew tevlî bireke din bûn ku li bakurê Cizîra Erebî bi cih bûn. Li wir mîrgeha Hîre ya bi ser Farisan ve ya ku roleke wê ya girîng û mezin di erebkirina Mezopotamyayê de hebû ava kirin. (koçer-Maks- Oppenheim. R 104-105).

Peyva ”Ereb” têgeheka ku dîroka wê vedigere berî islamê lê ne berî zayîna ye. Loma Rojhilatnas û zanyarên Tewratê dîroka vê peyvê lêkolîn kirin. Deqa herî kevin ya ku peyva ”Ereb” tê de hatîye dîtin, di serdema

şahên Asûrêyan ”Şelmenser” yê duyem û sêyem de bû. Tê de hat xuyakirin ku peyva ”Ereb” wateya wê koçerî ye. Mîrninîya ”Meşyexe” serwerêya xwe li çolistana nêzî sînorê Asûrêyan dikir. (Dîroka Ereban berî islamê, Cewad El-Elî R6).

Heger Ereb ji regeza ”Samî” bin, gelek zanyaran hewl da ku rastîya welatê ku Samî jê hatine nas bikin. Yek ji wan zanyaran, zanyarê Îtalî yê bi navê ”Kîtanî” yê ku dibêje: Nîvgirava Cizîra Erebî welatê wan yê resen e. Wî dîyar kir ku ziwahî, hejarî û guhertina ku li avûbaya nîvgirava Erebî çêbû, hişt ku Samî dev ji welatê xwe yê resen berdin û li hin herêmên din bi cih bibin. (Dîroka Ereban berî islamê, Cewad Elî R.88).ç

Bi kurtasî, em dikarin bihane û belgeyên ku zanyaran xwe dispart ser gotina ku dibêje nîvgirava Erebî welatê Samîyên resen in û ji wir koçberî hermên din bûne; wisa rêz bikin:

Ne gengaz e ku cotkar û niştecîyên çîya ji jiyaneke bajarvanî vegerin jiyaneke koçerîyê. Lê belê, berovajî vê yekê, gelê Samî di qonaxên xwe yên pêşîn de jiyaneke koçerî derbas kiribû, loma divê welatê wan çolistan be û hêja ye ku girava erebî ji wan re bibe pêgeha guncaw.

Hate çespandin ku bajarên li Iraqû Şamê hatibûn avakirin, bi destê koçerên ku li wî cihî niştecî bûbûn, ava bûye. Çaksazkirina erdan, avakirin û pêşxistina bazirganîyê, di encamê de gund û bajar hatin avakirin. Ji ber ku kesên koçer ji kendava erebî hatine, ev kendav bû çavkanîya Samîyên ku bi pêlên berdewam hatin Iraqû Şamê û li wir niştecî bûn.

Hin belgeyên olî, zimanî û erdnîgarî hene ku bi awayekî zelalî nîşan didin ku kendava Erebî dergûş û welatê Samîyan e. (Dîroka Ereban berî islamê, Cewad Elî R.85).

Li gorî dîrokê tê zanîn ku di serdema kevn de, herêma bakur xwedî taybetmendîyên tijî jiyana bajarvanî bû. Di wê serdema kevn de mîrgehên Aryenan geş bûbûn. Kanîyên Xabûrê herêma navendî ya mîrgeha Mîtanîyên Aryen bû ”paytexta wê Waşokanî ya nêzî Til Helef bû”. Li alîyekî din jî deşta beranberî Mûsilê dibe dergûşa hêza Asûrêyan û paşê Aramî, Ereb û Tirkan hin dewletok li wan deverên Mezopotamyayê ava kirin. (Beşê yekem, Oppenheim, R.104).

Mirovan dîroka ereban a berî islamê bi navê cahilîyetê bi nav kirine ku Ereb di vê serdemê de koçer bûn û li gorî şaristanîyên derdorê li paş

mabûn. Piranîya wan mîna koçerên gerok jiyan dikirin. Tu têkilîyên wan bi cîhana derdorê re tune bû. Ji bilî talankirinê tu taybetmendîyên wan yê dîrokî tune bûn. Ji ber wilo di dîroka Ereban de islam bû bûyera herî mezin. Ew ji welatê wan derxistin, li welatên derdorê ew bi cih kirin û ew weke neteweyekî xwedî bandoreke metirsîdar li ser jiyana mirovan, dan pêş. Derketina islamê, bidawîkirina dîrokekê bû û destpêkirina dîrokeke nû bû. Bi dawîkirina cahilîyetê bû û destpêkirina islamê bû. (EL_Bedû, beşê yekem, Oppenheim R.104)

Dîdevana dîrokî ya hemdem ya herî mezin ku koçbûna Ereb û koçeran ber bi herêma Mezopotamyayê ve tekez dike; hatina êlên Şemer ên ku ji welatê xwe li bakurê Kendava Erebî, ji ber Wehabîyan Revîyan û nêzî sînorê Iraqê bi cih bûn. Ferwerîya Iraqî jî ji alîyê xwe ve ew bi rêya Feratê re veguhestin herêma ku ji rojavayê Mûslê ta devera rojhilata kantona Cizîrê dirêj dike. (heman jêder R.111).

Ji alîyekî din ve jî hemû êl û hozên Ereb, di demên berê de û ta niha jî, angaşt dikin ku ew li vê herêmê xwedî kokên dîrokî yên kevnare ne û rastîya ku vê xakê di demên dijwar de ew hembêz kirine red dikin, ta xwe bikin serkêşên gelê herêmê û hebûna wan ji dîrokê winda bikin, bi taybetî gelê Kurd ku niha hewl dide dîrokê vegerîne rê û serdema wê ya mirovî û rast.

Ev tişt dihêle ku mirov ji sîyaseta Ereban a li hemberî Kurdan, matmayî bimîne. Bi taybetî ji alîyê hewldana koçberkirina Kurdan bi darê zorê. Ev kirîyar rastîya paşmaya dîroka ereban a kûr a kuştin, tekezkirina hebûna xwe ne li ser erda xwe û talankirinê dîyar dike.

Li Iraqê mîna cîranên derdorê, hebûna Kurdan li hemberî berjewendîyên xwe yên taybet weke gefeke rasterast didît. Nemaze ji ber ku gelê Kurd di demên berê û niha de jî beşa sereke ya tevna neteweyî ye. Partîya Bas ya Iraqî ji hevalbenda xwe ya Sûrî pîstir bû, ji ber ku gel timî bêdeng û birçî dihiştin, da ku bi pêş nekevin û jiyaneke bêwate bijîn. Têkilîyên wan bi gel re li ser bingeha gef û tirsê bû. Loma bi her awayî şerê berxwedana Kurdî dikirin, ji ber ku berjewendîyên wan ên kesayetî û neteweyî di ser her tiştî re bû û ji ber vê sîyasetê, gelê kurd ji hemûyan bêhtir qurbanî danîn. Her wiha gelê Kurd rastî erebkirin, tunekirin, birçîbûn û bêxwendinê hat. Ji bo

peydakirina ewlehîyê, van kirîyaran rê li ber koçberîya ber bi bajarên Iraqê ên mezin ve, vekir.

Kiryarên koçberkirinê li Iraqê li dij Kurdan eşkere bû, ew jî bi rêya sîyaseta erebkirinê ya bi destê Basîyan, armanca wê jî ew bû ku Kurdistana Iraqê ji Kurdan vala bike. Kurd bi hezaran penaber bûn, ji herêmên şer revîyan. Piştî rawestandina şerê Başûrê Kurdistanê û Iraqê yê yekem û duyem ê di salên 1960`î û 1970`î de û destpêbûna şerê Iraqê û Îranê ku ji sala 1980 - 1988'an berdewam kir û şerê Kendavê, paşê jî serhildanên ku çêbûn, bi milyonan Kurd koç bûn. Piranîya van koçberan li Îranê bi cih bûn û yên mayî jî ber bi Ewrûpa û Emerîkayê ve çûn. Lê vê tenê dilê rêjîma Bas hênik nekir, loma bi rêya bikaranîna çekên kîmyawî re dest bi sîyaseta qirkirinê kir. Mînakaka vê yekî jî sşckarîya rêjîma Bas ku bajarê Helebçe di 16-3-1988`an de bi çekên kîmyawî topbaran kir ku bi hezaran şehîd û birîndar ketin ku piranîya wan jin û zarok bûn, lê piştî derbasbûna 28 salan hîna jî qopîtî û nexweşîyên cur bi cur li gelekan derdikevin, her wiha mêjer û cureyê heyberan jehrê yên ku hatin bikaranîn bû sedema bobelateke jîngehî ku çandinî, ajal û xak tev wêran kirin û kesên saxlem man jî koçberî derveyî welêt bûn. Piştre Kurdên başûr rastî pêvajoya Enfal hatin ku bi navê (كاراساته ئه نفال –Karsata enfal) bi zaravayê Soranî tê naskirin. Di vê pêvajoyê de dewleta Iraqî êrîşî herêmên mîna ”Sergulo, Bergulo, Qeredax, Germîyan, Hewlêr û Badînan” kirin.

Di wê demê de ferwerîya Iraqî 2000 gund wêran kirin û bi hezaran welatîyên Kurd di pêvajoya Enfalê de kuştin û bi kotekî nêzî nîv milyonî koçber kirin û bi darê zorê ew di gundên ku ferwerîya Iraqî ava kiribûn de, bi cih kirin. Jixwe armanca Iraqê jî ew bû ku bi hêsanî di bin desteserîya wê de bin. Nêzî 1000 welatîyên Kurd li deverên dûr yên Iraqî hatin kuştin û di goristanên komî de hatin veşartin.

Li alîyekî din jî rêjîma Bas 700,000 Kurd ji alîyê rojavayê Mûsilê qewitandin û bi zorê ew li alîyê bakur bi cih kirin (qirkirina nijadî).

Di sala 1991'ê de, dema ku Sedam Husên dest bi çewisandina Kurdan kir û komkujîyên ku Kurd rastî wê hatin eşkere bûn, her wiha piştî serhildana gelê Iraqî li hemberî Sedam Husîn; gelek Kurd neçar bûn ku koçberî derveyî welat an jî herêmên sînorî bibin, ta ku rewş aram bibe. Tê gotin ku jimara Kurdan li Emerîkayê nêzî 100 000 welatî, li Kenedayê 50

000, Awistralayê 15000 kesî ye. Li alîyekî din jî di wê demê de 50 000 koçberên Êzîdî li rojavayê Kurdistanê bi cih bûn.

Jixwe divê em jibîr nekin dorpêçkirina Iraqê ji hêla Emerîka ve, ji bo ku ji Kiweytê vekişe; weke bobelatekê ku rewşa Iraqê xerab kir, êdî ji ber ku Kurdistan bi navendê ve girêdayî ye, rewşa wê jî xirab bû. Ev jî bû sedema vekirina derîyê koçberîyê li ber hemûyan, di nav wan de Kurd jî.

Weke me anî ziman Kurd koçberî dewletên derdor, Ewrûpa, Emerîka û gelek dewletên din bûn, wan dewletan piştgirîya Kurdan nekirin, dema ku dorpêçkirin û sitemkarîyên li dij mirovahîyê li ser wan dihatin meşandin, ew bi xwe bûn yên ku himêza xwe ji koçberan re vedikir, ew jî ji bo ku xwe bi rengê dîmokratîyê diyar bikin û berjewendîyên xwe bi awayeke neyekser pêk bînin, eke ku niha li Rojava dibe.

Lê tiştê balkêş ev koçbûna ber bi Ewrûpa û welatên cîhanê ya ku niha li Başûrê Kurdistanê diqewime! Gelo ev koçberî ji bo pakkirina rewşa aborî ye, yan ji ber tunebûna demokrasî û dadmendîyê ye yan jî ji ber ku sîyaseta aborî ya peyrewî dihêle ku herêm ji bin destê gel wê derkeve, yan jî ew sîyaset bi belgeyên navneteweyî ku dijî gelê Kurdî tên bikaranîn ve girêdayî ye?

Li gorî peymana Saykis-Pîko ya di sala 1916`an de, dema ku Kurdistan parçe bû, gelê Kurd li Sûrîyê çarenûsa xwe bi çarenûsa gelê Sûrêyê ve hate girêdan. Niha jî Kurd yek ji pêkhatîyên sereke ji gelê Sûrîyê ne û li herêmên xwe yên dîrokî li bakurê û rojhilatê Sûrîyê ”Kantona Cizîrê, kantona Kobanê, kantona Efrînê” dijîn. Her wiha jimareke mezin li bajarên Sûrîyê yên mezin mîna Heleb, Şam, Reqa, Hema, Hums, Laziqîyê û herêma Horanê, bi cih bûne.

Di çarîka dawî ya sedsala 20`an de, bi sedema sîyaseta nijadperestî ya ku ferwerîyên Sûrî di wê serdemê de bi kar tanî, jimara Kurdan bi taybet li parêzgeha Şamê û parêzgehên hundir zêde bûn. Hêjayî gotinê ye ku hebûa kuradan li parêzgehên şam, Heleb û Laziqîyê û parêzgehên din ji serdema pêşengê Kurd Selahedînê Eyûbî ve ye, ango berî 800 salî ye.

Li Sûrîyê Kurd rastî cureyên cûda ji zordarî, sitem û çewisandinê bi rêya zagon û fermanên dûrî destûr û peymanên navnetwî, hatin. Mînak: Ew serjimartina awarte ya ku li parêzgeha Hesekê di sala 1962`an de çêbû (fermana zagonî ya jimar 93). Ev serjimêrî hevdemî girtin û kuştinê bû.

Mebest ji van kirîyaran, Kurdan koçber bikin. Ev serjimarî /150, 000/ Kurd di belgeyên nasnamegehê de wek ”biyanî” nîşan dan û yên ku navê wan nehatibû tomarkirin bê nasname man. Navê ”bêtomar” li wan hate kirin. Serjimarî bi awayekî ketober û dûrîmaf pêk hat. Di encamê de bi deh hezaran Kurd bê nasname man û ji mafê, karmendî, hilbijartin, kerta tenduristîyê û kirîna xanûberan û xwendinê, bê par man. Ev sedem û kiryarên qirêj rêya koçberîyê li pêşîya Kurdan vekir. Gelek Kurd ji bo peydakirina nirxên mirovahîyê koçber bûn.

Yek ji wan sîyasetên dijwar ên ku rêjîma Bas di serdema Hafiz Esad de bikar anî, pirojeya kembera erebî bû. Ev piroje di serdema yekîtîya di navbera Sûrî û Misrê de hatibû pilankirin. Endezyarê vê pirojeyê ”Mihemed Teleb Hilal” bû. Di sala 1965´an de ferwerîya Sûrîyê ev yek kir biryar, mebest jê valakirina kantona Cizîrê ji welatîyên Kurd û li şûna wan ereban wein bicihkirin, da ku guhertineke dîmokrafî li herêmê pêk were. Tê zanîn ku ev kember ji sînorê Iraqê li rojhilatê Sûrîyê dest pê dike heta Serê Kanîyê li alîyê rojava, bi dirêjahîya 300 km û firehîya 15 km e.

Ferwerîya Sûrîyê derfeta avakirina bendava Feratê û pirojeya jinûvedabeşkirina erdên çandinîyê bi dest xist. Mebesta wê jî dest deyne li ser erdên çotkarên Kurd û gundên nimûne ava bike û li ser çotkarên ereb yên ku gundên wan ketin ber lehîya ava bendavê, belav bike. Bi rastî jî zêdetirî 4000 malbatên ereb ji parêzgeha Reqayê li vê kemberê bi cih kirin û 700000 donim li wan hat belavkirin.

Nivîsgeha çakkirina çandinîyê jî dest bi çalakkirina biryarên xwe kir, 4000 malbatên Kurd ji wê kemberê koçberî herêmên din kirin. Li alîyekî din jî 25000 niştecihên Kurd li nava vê kemberê bê nasname hiştin û weke kesên bîyanî li cem ferwerîyê tomarkirîn. Bi biryarên partîya Bas û ferwerîya Sûrî ew dûrî herêma sînorî xistin. Ji bo ku Kurd hinohino koçber bibin, gelek astengîyên ewlehî, xwendin û aborî çêkirin. Hin caran jî ji bo koçberkirina wan, hêz bi kar tanîn.

Ev sîyaset, sîyseteke sîstematîk bû. Armanca wê tunekirina nasnameya Kurdî û pişaftina Kurdan di nava neteweyê erebî de bû. Vê sîyasetê tevgera sîyasî ya Kurdî çewisand û hemû serkêşên wê girtin û navê gund, bajar û girên Kurdan ên dîrokî guherandin û navên erebî li şûna yên Kurdî bi kar anîn. Her wiha ziman, awaz û stranên Kurdî jî qedexe kirin.

Ev kirîyar Kurd ber bi koçberîya hundirîn ve ya ji gundan ber bi bajarên mîna Şam, Heleb, Dêrazorê, Homs an jî Lubnanê ve dehfandin.

Desthilata Sûrîyê bê navber hemû cureyên sîyaseta gemar û tarî, zagon û fermanên zoradar, li hemberî mafê Kurdan dimeşandin, da ku pêşaroja Kurdan li gorî berjewendîyên xwe bi sînor bike. Armanca wê ya sereke ew e ku gelê Kurd tune bike, ev gelê ku timî ji bo rizgarkirn û azadîyê tê dikoşe. Rêjîmê, herêmên Kurdan gelekî hejar û birçî hiştin û geşbûna aborîya Kurdî bi bajarên Sûrî yên mezin ve girê da, da ku rewşa aborî di destê wê de bihêle û li gorî berjewindîyên xwe bi rê ve bibe.

Ji ber piştguhkirina çaksazîyê li herêmê û qedexekirina avakirina kargehan ji hêla ferwerîyê ve, aborîya bajarên Kurdî tenê xwe dispart çandinîyê û Kurdan bi rêya wê re jiyana xwe ya civakî û aborî didomand. Li wir jî rewşa hewayê li kêleka rêjîma sîyasî, roleke mezin di koçkirina gelê Kurdî de lîst. Ev yek di navîya deh salên borî de hat xuyakirin. Ev guhertinên hewayî û gerdûnî bandoreke mezin li ser jîngeha Sûrîyê kir, zuhayî li tevahîya welêt çêbû. Kantona Cizîrê qurbanîya mezin danî, dema ku bi pêlên vê zuhabûnê re, ava binerd a li derdora çeman jî miçiqî. Bê guman heger bergiriyek der barê kolana bîran de û pilanên çandinîya avî hebûna, ev zuhatî pêk nedihat. Jixwe sîyaseta lîbralî ya ferwerîya Sûrî rewşa herêmê piştguh kiribû. Di destpêka 2008`an de û di heman dema bilindkirina nirxên berhemên çandinî û sûtemenîyê de; çandinî li kantona Cizîrê herifî. Li gorî raporên Neteweyên Yekbûyî (NY) %60 û 1.3 milyon kes ku piranîya wan ji kantona Cizîrê bûn, bi sedema vê zuhabûnê li hemberî ziyanên zor hatin. Li gorî Yekîtîya Navneteweyî ya Xaça Sor (KNXS) û NY, bêhtirî 800 000 kesî dahatên jiyana xwe bi temamî winda kirin. Zuhabûn di navbera salên 2006 – 2009`an de, bi sed hezaran mirov ji herêmê qewitandin û ew ber bi gundewarên Heleb û Şamê ve koçber kirin. Ev wargehên nû yên koçberan dûrî alîkarî û pilanên geşedan û pêşxistina mirovhîyê bûn û bi xelkê xwe û kesên koçber tijî bûbû. Piştî du salan ev dever bû navenda şoreşa Sûrîyê.

Zordarêya rêjîma Sûrîyê li dijî gelê Kurd û hewldana çewisandina hebûn û cihê Kurdan di nava tevna civaka Sûrîyê de, bê navber berdewam bû. Di 10. 9. 2008`an de, rêjîma Sûrîyê fermaneke bi navê fermana /49/`an hatîye naskirin ragihand. Li gorî vê fermanê, çi welatîyê ku li herêma sînorî jiyan

dike, mafê wî di firotina xanî û erdan an jî li ser navê xwe tapokirin, çi di hundirê nexşeya pilankirî ya bajar de be, çi derveyî wê be ku rêdaneke zagonî ji hêla şareyarê navxweyî nebe, tu mafê wî nîne.

Pêkanîna vê fermanê encamên metirsîdar li ser mafê welatîyan derxistine holê. Her wiha tevlihevî û nearamîyek di têkilîyên civakî de peyda kir. Rêdana zagonî tiştekî pir zor e, ji ber ku li dezgehên ewlehîyê vedigere û ew dezgeh jî li ser wan rêdanan napejirînin, bi taybet ji bo kesên xwedî helwest û nêrîn, jixwe ji bo welatîyan jî napejirînin. Nehatîye dîtin ku welatîyekî Kurd rêdaneke zagonî ji demên dûr ve, bi dest xistîye. Ew jî ji ber sîyasetên zordarî û cudakirinê yên ku li dijî gelê Kurd pêk tên.

Vê fermanê bandoreke mezin kirîye, jiyana abûrî û civakî pûç kirîye, di herêmên Kurdan de kirîn, firotin û kirê qedexe kirine, gelek pirsgirêkên abûrî û civakî peyda kirine, bêkarbûn û hejarî di nava civakê de pir bûye û nearamî ketîye têkilîyên welatîyan. Van tiştan hişt ku bi hezaran welatîyên Kurd dev ji herêma xwe berdin û ber bi bajarên mezin yên Sûrîyê ve koç bibin. Bi taybet Şama paytext. Jixwe koçberên li wê deverê di rewşeke tengezar de dijîn, ji ber ku ji hemû mercên jiyanê yên serke weke ava paqij, xanî û gelek rajeyên civakî yên ku welatîyên din bi dest dixin, bê par in. Di dema dawî de, bi sedema zuabûnê, rewş di herêmên Kurdî de xerabtir bû. Pê re sîyaseta rêjîmê ya zordar ne tenê li herêma Cizîrê dihat pêkanîn, lê li kantona Kobanê jî di bin navê çakkirina çandinîyê de, pirojeya kembera erebî hat bicihkirin. Ereb ji Reqa û Tebqayê anîn û li Kobanê bi cih kirin, paşê erdên Kurdan li wan belav kirin. Lê bi lehengîya hin kesayetên Kobanî ev piroje têk çû û ereb neçar man ku li warên xwe vegerin.

Li milekî din jî sîyaseta ferwerîyên Sûrîyê yên lipêhev, timî kiryarên nijadperestî li ser Kobanê bi kar tanîn û Kurd neçarî koçberîyê kirin. Avakirina sazî û beşgehan qedexe kirin, avakirina dibistanan kêm kirin û xwendin piştguh kirin û bi giştî xizmetguzarî li wê deverê tune bûn. Her wiha Kobanê di navîya salên heştêyî ya sedsala 20`an de, li hemberî zuhabûnê hat, tevî taybetmendîya sereke ya hizkirina xakê û welêt li cem gelê Ksobanê; lê hejarî û bêkararîyê derîyê koçberîyê li ber wan vekir, berî dan bajarên Sûrîyê ji bo peydakirina kar, her wiha ji bo xweşkirina jiyana xwe ber welatên derdor û rojava ve çûn.

Tevî ew koçberîya ku Kobanê rastî wê hat, rêjeya koçberan ne zêdetirî %10 bû. Ev ji bilî têkilîyên welatîyên Kobanê bi bajarê Heleb re, ji ber ku ew girêdayî Helebê bû û Heleb ji Kobanîyan re bajarekî navenda pîşesazî, aborî û bazirganîyê bû, gelek ji welatîyên Kobanê ber xwe ve birin û li wir taxên taybet bi wan ava bûn.

Li gelek taxên bajarê Şamê jî Kurd bi cih bûbûn. Mîna ”Reknedîn, Edra, Xirbet Elwerd”. Piranîya neştecihên wan taxan di van karan de dixebitîn: karkerên avakirinê, ajokar, karkerên kolana bîran û hwd.

Her wiha ber bi Reqa, Bab û Minbicê jî ve çûn. Çûna wan gihaşt astekê ku mirov tê dernedixist ku ew herêm ya erban e, ji ber ku gelek Kobanî ji zû ve li wan deveran bi cih bûbûn.

Gelek ji welatîyên Kobanê bi alavên xwe yên kolana bîran, koçberî derve bûn, wek: Lîbya, Cezayir, Tûnis, Mexrib û Sûdanê. Piranîya wan karkerên kolana bîran bûn. Rêjeya wan ne zêdeyî %2-3 bû. Em dikarin bibêjin ku ew koçberî ya derve ya demkî bû, ne bi nîyaza ku timî li wir bimînin. Nêzî 5 salan li wan welatan dixebitîn û paşê vedigerêyan. Vê koçberîyê gelek sûd dida bajarê Kobanê û gundewarê wê, ji ber ku di binesazîya bajêr de dihat bikaranîn. Ev koçber bêhtirî xwe ciwan bûn bê ku malbata xwe bi xwe re bibin û demeke kurt li wir diman. Sedema wê jî ew e ku welatîyên Kobanê welatê xwe ve girêdayî ne. Welatîyên Kobanê ji berê ve bi hezkirina xak û çanda xwe tên naskirin.

Ji destpêka şoreşa Sûrîyê ve, Kurd ji bajarên din vegerêyan cih û warên xwe. Di nav wan de welatîyên Kobanê bûn. Welatîyên Kobanê her kêlî û bê navber li gorî pêşveçûna bûyeran bûn, her tişt di bajêr de spartin xwe û hîmên destpêkê yên pirojeya Rêveberêya Xweserêya Demokratîk danîn, bi vê yekê ji deverên din yên Rojava re bû pêşeng.

Dema ku Daişê bajarê Reqa, Minbic û Babê desteser kirin û Kurd koç kirin, bê dudilîbûn vegerêyan bajarê xwe Kobanê. Ev bajarê ku bû sembola berxwedanê; tevî birîna xwe ew himêz kirin.

Di sala 2014`an de Daişê êrîşî Kobanê kir û ji ber sawkarîya wê koçkirineke mezin û bi zorê li wê deverê rû da. Gelê Kobanê koçberî bakurê Kurdistanê bûn, da ku pîr û zarokan biparêzin, her wiha ji bo parastina bajarê xwe yê birîndar, amade bin. Hinek jî ber bi Cizîrê, Başûrê Kurdistanê û Ewrûpayê ve çûn.

Lê piştî rizgarkirina bajarê Kobanê û vegera aramî û ewlehîyê, tevî wêranbûna bajêr, welatîyên Kobanê bajarê xwe bernedan. Li milekî din jî bajarê Kobanê ji gelek koçberên Sûrîyê re herêmeke aram bû û weke welatîyên xwe, nêzîkatî bi koçberên ji bajarên din re jî dikir.

Efrîn jî weke bajarên din ên Kurdan bi rêbazên çewisandin û zordarêya rêjîma Sûrîyê yên weke birçîbên, tirs û erebkirinê, bê par nema. Ew jî ji bo ku ev gel timî bi paşverûtîyê ve girêdayî bimîne û tenê di peydakirina jiyaneke aram de bihizire, ev kirîyar pêk anîn. Heke em li Efrînê mêze bikin em ê bibînin ku Efrîn bi çandinî, geştyarî û bi herêmên xwe yên şûnwarî, pir dewlemend e. Lê gelê Kurd tu sûd ji vê xakê negirt, ji ber ku rêjîma Sûrîyê berhema Efrînê bi bajarê Helebê di bin sîwana ku Heleb bajarekî pîşezazîyê ye, girêdabû. Ji bilî hin kargehên biçûk ku wan jîngeha herêmê gemar dikir, tu tiştê din nedida Kurdan. Welatyên Efrînê li bajarên Sûrîyê bi taybetî li Helebê aramî, pêşketin, xwendin, zanîgeh û hwd didît. Nîşana vê yekê jî ew taxên Kurdan ên ku li Helebê hatine avakirin. Jixwe du cureyên koçberîyê li Efrînê hene:

Koçberîya mayinde: Ev koçberî jî du cure ne; yek jê ji derveyî kantonê ber bi Ewrûpayê ve ye, ya din jî navxweyî ye, ber bi Heleb, Şam û bajarê Tebqayê, ew jî ji dema ku bendava Feratê di sala 1968`an hatîye avakirin ve ye.

Koçberîya demkî: Ber bi Libnanê û a niha jî ber bi Tirkîyê ve ye, ew jî ji bo misogerkirina pêdivîyên rojane ye.

Sedemên koçberîya ji bajaran ber bi gundan ve berî sala 2011`an pir bûn. Paşê bi sedema nebaşbûna rewşa ewlehîyê; Koçberîyeke berevajî ji gundan ber bi bajaran ve rû da. Gelek sedemên vê koçberîya berevajî hene:

Ji ber xizanîya axê û belavbûna çîyayan bi rêjeya %90, axa çandinîyê Kêm e.

Tunebûna şênkatîyê (dar, gîya).

Vegera asta mêjera berhemên demsalîya zeytûnan ”nirx, bilindbûna lêçûnên çandinîyê”, vê yekê astengî li pêşîya firotina berhemdarîyê derxist û hişt ku astengîyên jiyanî derkevin.

Xwespartina li lawirvanîyê, ne gengaz e.

Nebûna kargeh û herêmên bazirganîyê.

Bi mebest piştguhkirina girîngîya herêmê, ew jî bi rêya tunekirina dergehên sînorî (Sîyaseta ku rêjîma Sûrî bi kar anîbû).

Nepeydakirina xanîyên gunacav ji bo ciwanan. Li alîyekî din jî bajar bû karîgera kişandina ciwanan ”Xizmetguzarî, derfretên kar, xwendin”.

Şoreşa Sûrîyê ya ku ji destpêka 2011`an ve pê ket, bû karîgera sereke di mijara koçberîyê de. Bi awayekî pir zêde gelê Sûrîyê nemaze ciwan, ber bi Ewrûpayê ve koç bûn, bi taybet Kurd. ji dêvla ku çareserîyeke guncav ji vê kêşeyê û sedemên wê re bibînin, her yekî gazin ji yê din dikir.

Pêlên koçberîyê çend sedemên wê hene. Ji kategorîyekê ta kategorîyeke din û ji malbatekê ta malbateke din cuda ye. Ne gengaz e ku koçberî bi sedemekê ve bê girêdan, ji ber ku gelek sedemên weke aborî, ewlehî û sîyasî hene. Li vir em dikarin koçberan li gelek kategorêyan dabeş bikin.

Bi deh hezar û sed hezaran Kurd, derveyî herêmên xwe li Heleb, Şam û gelek bajarên din ên Sûrîyê ku rêjîya Kurdan li wan bajaran ne weke hev bû, dijiyan. Bi destpêka alozîya Sûrîyê û bi çekdarkirina wê re, aramî û ewlehî li wan bajaran têk çû û bajarên wan wêran bûn. Vê yekê hişt ku koçberîyeke berevajî ber bi herêmên Kurdan ve çêbibe ”Kobanê, Efrîn, Cizîrê”. Ew jî ji bo ku ewlehîyê bi dest bixin û derfetên jiyanê peyda bikin, ew jî bi hêvîya vegerê ne ku rewşa wê ne diyar e.

Berdewamîya rewşa xirab û kêmbûna derfetên kar û çavkanîyên jiyanê, hişt ku piranîya malbatan koçberî dewletên derdorê bibin. Astengî û tinebûna derfetên kar, ji bilî du rêyan tu çare li pêşîya koçberan nehişt; yek jê vegera welat an jî dê xwe li ava deryayan bixin û koçberî Ewrûpayê bibin. Lê der barê malbatên ku ji berê ve li herêmên Kurdî dijîn; ji ber dorpêçkirin û rawestandina tevgera bazirganî, bihabûn û bêkarî, bêxwendin, reva serkêşên partîyên Kurdan û malalbatên wan û erzanîya lêçûna rêya Ewrûpayê; gelek kes koçber bûn. Kategorîyeke din jî heye, rêjeya wê kêm e, ew jî ya ku ji bo peydakirina kamiranî, dilşadî û xweşguzarîyê, koçber bûye.

Ev sedemên ku me bi bîr anîn, ji bo başbûna rewşê; bêhêvîtîyê li gel welatîyên Kurd çêkir, lê çavên wan li çareserîyêke nêzîk e.

Piştî hedaneke bêsînor ku hestê berpirsyartîyê li cem mirovê Kurd kuşt, metirsîyên koçberîyê ji bîr kir û li pêşeroja xwe û zarokên xwe gerêya û bi rêyan ket. Koçbûna serkêşên sîyasî yên Kurd û malabatên wan û piştguhkirina wan ji koçberên li hundir û derveyî welat re, barê jiyana mirovê Kurd girantir kir. Her wiha lêçûnên kêm û hêsanîya rêya Ewrûpayê, hişt ku ev karwanên mezin ji Kurdan koç bibin. Bê guman tu hêzên sîyasî yên Kurdî yan jî yên Sûrî, ji dil li ser sedemên vê dîyardeyê nesekinin û çareser nekinin, ev diyrdeya metirsîdar a dîroka komên mirovî, êdî dibe ku di demekê de bibe bobelateke, ew jî dema ku bigihêje koçkirina hişmendan.

Gelek sedemên giştî yên ku roleke mezin di vê dîyardeyê de lîstine, hene:

Pêngavên leşkerî ku bûn sedema belavbûna tevlihevî û bobelateke mezin ku gel neçarî koçberîyê kir.

Dirêjbûna temenê alozîya Sûrîyê û bêhêvîbûna çareserîyeke nêzîk.

Beşdarî û pêşkêşkirina gelek dewletan ji hêsankirin û reva koçberan re.

Rewşa Rojava berî 2011`an hinekî aram bû. Koçberîya navxweyî hebû, ji ber ku koçberîyeke demkî û demsalî bû, metirsî jê tune bû. Gelek malbatan di warê aborîyê de sûd jê werdigirtin. Lê dema şoreşa Sûrîyê dest pê kir, destpêk ji bajarên mezin bû, paşê hinohino gihişt bajarên din ên Sûrîyê û Rojava. Bandoreke wê ya mezin li ser vekirina derîyê koçberîyê hebû. Guhertineke demografî li seranserî Sûrîyê û Rojava rû da. Destpêkê ciwanên Kurd ên ku di artêşa Sûrîyê de leşker bûn, veqetîyan û koçber bûn. Her wiha derçûyên zanîngehan jî yên ku leşkerêya neçar a Sûrîyê nekiribûn, koçber bûn. Gel ber bi herêmên aram ve çûn, di nav wan de Rojava bû ya ku herêmeke aram ji hemû gelên Sûrîyê re bû. Kurdan rewşa li ber dest ji xwe re bi kar anîn, da ku hêza xwe ya demokrat berz bikin, ew jî ji bo ku şoreşê zelal bikin û wê ber bi rêya rast ve bibin ku çarenûsa hemû pêkhateyan were zelalkirin, ji bo ku ew pêkhate dest bi pirojeya nexşeya sîyasî ya neteweya demokratîk bi pêşengtîya gelê Kurd, bikin. Ev yek pirojeya ku hemû netewe, tîre û olan himêz dike. Ji bo pirojeya xwe li tevahîya Sûrîyê belav bike, Rojava ji sawkarîyê diparêze da ku bibe hêza sereke ya ku şerê sawkarîya Daişê dike. Lê ev tişt nebû cihê pêşwazî û dilxweşîyê li cem hinek dewletan, nemaze Tirkîye ku dest bi pilankirina hin pirojeyan kir ku armanca jê rûxandin û têkbirina hêza Kurdî bû. Ew jî bi

alîkarêya hêzên sawkarîyê yên weke Artêşa Azad û Cebhetûnusre û Daişê, ji bo nearamî û tirsê têxe nava herêmên Kurdî û wan herêman ji niştecihên wê yên resen Kurdan, vala bike. Bi vê kirîyarê gelek gelên Rojava koçberî herêma Kurdistanê û dewletên derdorê bûn, mîna Tirkîyê. Di nav wan koçberan de gelek rewşenbîr, hunermend, bijîjk, endezyar û parêzer hebûn.

Lê di vê demê de, bi taybetî dema ku parzemîna Ewrûpayê ya pîr pêwistîya xwe bi karker û xebatkaran pêşkêş kir û di vê derbarê de, gelek ferman û biryar bi mebesta nêzîkbûneke mirovî ji gelê Sûrîyê re û hêsankirina koçberîyê, derxistin. Pê re koçberîyeke komî ya ciwanan ber bi vê parzemînê ve çêbû. Li alîyekî din jî dewleta Tirk û dewletên dijberî Kurdan ji vê rewşê sûd wergirtin. Gelek koçber di avê de kuştin û dîyar kir ku gel ji ber rewşa xirab ji herêmê direve. Mebest Tirkîyê ew bû ku aramî, pêşketin û biratîya gelan a ku li Rojava bi rê ve diçe, reş bike. Li milekî din jî armanca wê têkbirina buhara Kurdî bû û valakirina wê ji Kurdan û hêsankirina desteserêya xwe li ser destkeftîyên Rojava bû, ji ber ku destkeftîyên rojavayê Kurdistanê jê re dibe nearamî û ditirse ku Kurdên Bakur doza mafên xwe yên sîyasî, çandî û aborî bikin.

**Jina Kurd û koçberî:**

"Roleke taybet ya jinê di pêkanîna serkeftina dawî ya civaka demokratîk de heye. Jina ku di civaka çînî de ji serdema Kevirî ya Nû (Neolîtîk) ve hat binpêkirin û çewisandin, weke xwedîya maf a rastî di hemleya demokratîyê de tola xwe ji dîrokê hiltîne. Her wiha bi rêya piştgirîya wê ji şaristanîya demokratîk a hilçûyî; dijdîtane(antîtez) ya pêwîst ava dike û ji bo bidestxistina azadî û wekhevîyê palpişteke civakî ya xurt e. Bi saya jinê û ciwanan; veguherandina Demokratîkbûna civakê ber bi dijdîtaneyekê ve dê pêk were. Şîyarbûna jinê û rola wê weke hêzeke pêşeng di qada sîyasî de, bû weke dijdîtaneyekê. Cîhana jinê, hişmendî, wijdan, hizkirin û parastina wê ji van hemîyan re; gengaz e ku nirxên şaristanîyeke balkêş biafirîne " (Ji dewleta Sumerî ya kahînan ber bi şaristanîya demokratîk ve - Ocalan R 340-341).

Ji ber ku rewşa jiyana civakî di her qadeke civakî de, ne tenê komeke mirov in; lêbelê ew bi xwe têkilîyeke domdar e. Di nav wan koman de hin hene ku bi rêya wan, civak têdigihêje. Ev tişt dihêle ku civak tijî jiyan bibe.

Ji ber jin endameke ji van koman e, bê guman roleke wê ya mezin di vejîna vê civakê de heye.

Bê guma dema em bihizirin ji bo em malbatekê ava bikin, tenê ew dayika ku dê nifşekî ji bo pêşerojê perwerde û ava bike de, tê bîra mirov. Dema ku em li ser civakê biaxivin û çawa civakeke saxlem ava bikin, divê em amajeyê bi wê malbata ku dayik bingeha avakirina wê sye, bikin.

Ev rastî dihêle mirov bibêje ku jin navik û pêşveçûna civakê ye, ji ber wilo hişmendî û xwenaskirin jinê û nermbûna wê bi derdora re; dihêle ku sûdê ji hin kesan bigre, bê ku li ser hesabê taybetmendî û cewhera wê ya şaristanî û kesayetî be.

Tişta ku şaristanîya mirovahîyê nîşan da ew e ku hişmendî, kesayet û çanda vekirî; dikare astên bilind ji serkeftin û pêşketinê bi dest bixe. Li milekî din jî civaka girtî yek ji karîgerên ku roleke wê ya mezin di biçûkkirina hêz û karînan de heye û nahêle pêşketin pêk were.

Ji ber girîngîya rola jinê û karîna wê ya hevgirtin û avakirina civakê û xurtkirina nirx û sincan di navbera kesên civakê de; jê tê xwestin ku ev nêzîkatîyê wê ji bo têkilîyên xwe bi cakê re pêk bînes, lê ne li ser hesabê taybetmendîyên wê. Di vê qonaxa dîrokî de, divê jin rola xwe bilîze, ew jî hewil bide ku hêz û karîn xwe ji bo parastina welêt û belavkirina çanda hezkirina welatê xwe bi kar bîne.

Dema ku jinê dîroka xwe nivîsand, ji çanda xwe ya bi erdê û bi berhemên wê ve, dest pê kir û têkilîyên wê bi erdê re li ser bingehê dan, hizkirin, ewlehîyê bû, her wiha li ser bingeha ku jiyan ji erdê hatîye afirandin bû.

Kurdistan welatê ku mirovahî di kesayeta gelê Kurdî de winda bûye. Bi taybetî jina Kurd ya parçeyeke ji welatekî ku hêjayî hizkirin û rêzêdarîyê ye. Bi vê wateyê jina Kurd dighêje asta dahênanê ku hîn di rewşa pêvajoya afrandin û afrandkirinê yên têkilhev de ye. Nirxên ku jina Kurd di kesayeta xwe de ava kiribû, mirovahîyê bi sedê salan şer kir da ku wan bi dest bixe, bi vê wateyê jina Kurd encama vî nirxî ye.. Jina Kurd di şoreş û avakirina civakê de, divê birûmet be û xwedî taybetmendîyên dilkêş û helwesteke dadmend be, her wiha fedakar û wêrek be. Îro civaka me hewcadarê vê yekê ye ku ji jinê tê xwestin ku beşdar bibe û alîkarîyê pêşkêş bike.

Di vê dema dawî de, gelek pêlên koçberîyê rû dan û gihişt astekê ku jin hat sûckirin. Koçberî ne tenê mirovan bi xwe re dibe, lê hemû şîyan û dewlemendîya welat bi xwe re dibe.

Koçberî girêdana di navbera koçber û welatê wî de qut dike. Piştire koçber dest bi jiyaneke nû li ser axeke nû dike, bê ku tu girîngîyê bide pêşeroja dûr. Ev jî dibe sedema pişaftina nifşê me yê nû di nav çandên wan civakên dûr ji çand û şaristanîya me. Encam jî tunebûn û windabûna wî nifşî ye, wê gavê koçberî, berdana welêt e.

Heke em tiştên ku me li ser rola jinê gotî, di avakirina malabat û civakê de bingeh bigirin, em ê bibînin ku berpirsyarê sereke yê koçberîyê, jin e. Ji ber ku ew peywendîyên yekser bi zarokên xwe re di malbatê de çêdike. Ji wê, jin benê çareserîyê dest pê dike û rûmeta welêt di destê wê de ye.

Malbat ji nifşên peyhatî pêk tê, yek ji wan jî zarok in. Jin dikare hemû rêgez, nirxên sincî û hezkirina welêt di kesayata wan de biçîne, ji ber ku ew nifşê pêşerojê ne. Ew jî ji bo ku berê xwe bidin hembêza welatên din û ew welat wan li gorî rêgez û nirxên ku berjewendîyên wan raje dikin, bername bikin û kesayetên wan saz bikin, piştre jî dibin avakerên wan welatan.

Gelek ji wan jî xort in ên ku hêz û karînên wan ber bi pêşketin, avakirin û dewlemendîya welêt ve, werin arestekirin, ji ber ku ciwan xeleka herî bihêz e ya ku welat û azadîyê pev ve girê dide û rûmetê diparêze. Lewre em dibînin ku hemû welat, ji bo ku wan bikêşin alîyê xwe, bandore li hişmendîya wan bikin, sûdê ji wan bigirin û wan ber bi berjewendîyên xwe ve bibin; di nava pêşbirkekê de ne. Ji ber ku ew hêza welêt a jîndar in û mertala ku parastina welêt dike, êdî tev dixwazin ku wî mertalî birûxînin û derbas bikin ku bi vî awayî dikevin nava welêt.

Dema ku kategorêya tememezin jî koç dibe; kultûr, dîrok û şaristanîya me bi xwe re dibe, da ku di bin kavilên xweşguzarî û demokrasîya sextekirî de bên veşartin.

Lê dema ku jin koç dibe, koçberîya wê zîyanê digihîne dînamîkî û jîndarêya jiyanê, her wiha ziyanê digihîne hemû hêz û karînên ku jiyan û civakê bi pêş dixin, ji ber ku jin navika civakê ye û mertala ku avakirina welêt û nifşan diparêze.

Jin bi rêya malbatê kesan dide hev û ji alîyê kultûr, hişmemdî û pêşketina kesayeta mirovî ve; dibe weke pirekê di navbera civak û kesan

de. Her wiha dikare hestên mirovan û alîgirtinên wan bi rêya dayikbûnê bandor bike û bi rêya azadî û çanda xwe, dikare tekûzbûnê di civakê de bi dest bixe û rengekî demokrasî lê bike. Bi vî awayî, dê gelek serkeftinên cihêreng û radeyên bilind ji serkeftinên di warên zanistî û aborî de bi dest bixe.

Jin rûyê din ê welêt e, ango beşeke ji welêt nayê jêkirin. Pêwîst e jin bi rola xwe ya girîng di kêmkirina koçberîyê de bilîze û hewil bide ku rê li ber bigire. Ji ber ku jin bi vî awayî rola xwe ya dîrokî dilîze û dîrokê nûjen dike.

Ciwanên Kurd û Koçberî:

Heya astekê rola ciwanan weke rola jinê ye, ji ber ku zû têdighêjin cîhana nû û ji rewşa xwe ya ku encama rewşa Rojhilata Navîn e, bêzar dibin. Teknîka agahîyan û peywendîyê, ciwanan ber bi hişmendîya bilez ve dibin, êdî zarokan jî cihê hêza demokratîk a bilez digirin, ji ber ku ew ciwanên ciwanan e.

Komên mirovan bi cûdahîya cureyên xwe, di gelek bûyerên ramyarî û rewşên civakî û aborî yên cihêreng re derbas dibin. Dibe ku hevgirtina endamên xwe peyda bike û bi hin rêgezên hevbeş weke yên di rojên şer, bobelat û kirîzan de pabend be, ji ber ku hestên nearam û tirsîyê yên ku bi van bûyeran re çêdibin, pêwîstî û nêzîkîya endamtîyê pirtir dikin. Êdî dizanin ku hevkarêya bi kesên din re misogerêya pêkanîna ewlehîyê ye. her wiha gefên derveyî yên li ser koman tên kirin, ji rewşên fişarî ne û ji alîyê xwe ve dihêlin endam nas bikin ku kom jêdera ewlehîyê ye. Rolên civakî yek ji dîmenên ku yekîtîya jiyana civakî û bandora wê li ser kesan, destnîşan dike.

Rol ji alîyê bûyerên civakî ve, ew hişîyarî û bersivên pevguher ên di navbera kes û civakan de ne û ji bo hevtêkilîya civakî ya sereke ye. Ji her navendekê re kar û şêweyên reftaran yên li gorî wê tên destnîşankirin. Ew jî maf û erkên ku ji her kesê di civakê de tên pêşbînîkirin.

Lê belê kesê di civaka me de, di gelek deman de bi çend rolan radibe û dibe ku sînorekî ji jiyana xwe re xêz bike ku dihêle rewşa dimildest û windayî jiyan bike. Ji vir hevrikî dest pê dike û mirov xwe li pêşberî gelek rolan dibîne ku her yek ji wan li gor hin helwestan e û li dijî helwestine din e. Dibe ku ew hevrikî teşeyeke din bistîne, ew jî ji ber pêşbînîyên rolan ên cûda ku pêşbînîya mirov ji rola xwe re, ne weke pêşbînîyên kesên din ji

heman rolê re. Bê guman hevrikî (hevrikîya rolan) û pirsgirêkên derûnî yên ku di encama wê de rû didin, pêwîst dike ku rol bi kesayet û taybetmendîyên mirov re guncav be.

Bi giştî, pêdivîyên jiyanê yên nû ji bo ku mirovê hemdem bibe endamekî çalak di civakê de, pêwîstî bi hin rolên nû û guherîna hin rolên heyî heye. Ji ber ku guherîna di rolan de, pêdivîya wê bi guherîna di rêgezên bigehîn de heye, ji ber dihêle ku guhertin di hişmendî û alîgirtinan paşê di kirîyaran de çêbe.

Êdî em dikarin bireke ji civak ya bi navê ciwanan e, pênase bikin, jixwe ciwantî ji dawîya sîpebûnê dest pê dike ya ku zêde guherîn, nearamî, xwespandin, arezû û helwestên ku bi hêsanî tên birêvebirin, tê de hene, êdî bi çend awayan tê zelalkirin da ku bibe destpêk ji qonaxeke dirust re yan têkçûna di jiyanê de. Pêvajoya ciwantîyê bi kelemên civakî, derûnî û lebetî yên ku mirov dixwaze wan derbas bike, zengîn e, da ku karibe guncandinê bi kesayeta xwe re û bi civaka xwe re çêke, ew jî ji bo ku guncandinê bi pêdivîyên jiyanê re pêk bîne. Lê hin ji tirsa rûbirûmayîna bi van keleman re, paş vedigerin û di encamê de dibe sedema çêbûna kelemên derûnî û civakî yên ku rêya jiyanê li ber wan asteng dikin.

Yek ji taybetmendîyên vê kategorêya ciwantîyê ew e ku hêzeke mirovî ya bi coş, hestyar, wêrekî û serbixweyîtî ye. Hestên nearamîyê jî li gel wê pirtir dibin, ew jî ji ber rolên ku ji hêla civakê ve lê tên spartin. Loma em dibînin ku ev kategorî xwe davêje gelek rêbaz û xapandinên berevanîyê, ji bo ku bigihêje çareserîne berdêl, lê ev jî dibe ku ne li gor rola wî ya di jiyanê de bin, êdî dibe ku ji bo bidestxistina van çareserêyan; tiştên xwe yên herî buha bide ku dibe li ser hesabê rêgezên wî jî be, ji ber ku nearamî rewşeke zor e, divê bi xwestek û hin awayên din were vemirandin, an jî dê bihêle ku mirov bi şêweyekî neguncav tev bigere.

Weke mînak em dibînin ku ev kategorî, tiştên li derdora xwe li gorî du pîvanên bingehîn dinirxîne:

- Pîvana qezencî
- Pîvana sembolî

Pîvana qezencî ya yekser ew e ku tişt gelek sûd û pêwîstîyan ji wan re bi dest dixe, jixwe tişt li gorî sûdên ku yekser ji wan tê girtin; tên nirxandin.

Lê pîvana sembolî yan jî razberî ew e ku girêdaneke razberî di navbera mirov û tiştên derdora wî de heye. Ev derdor dibe ku erênî be û hestên aramî û dilxweşî û kêfxweşîyê peyda bike yan jî dibe ku nerênî be û hestên nearamî, tirsê û tevlîhevîyê peyda bike. Dibe ku tişt tenê nirxê wê yê qezecî yan tenê yê sembolî be, lê dibe ku her du nirxan bihewîne.

**Mînak:**

Zemîn, dibe ku li gel hinan qezencî be bêtirî ku sembolî be û berovajî vê yekê jî rast e, her wiha dibe ku nirxa sembolî li gel hinan kêmtir be jî. Wê gavê dema ku pirsgirêk derkevin, hin kes parastina wê bikin, ji ber nirxa wê ya sembolî bêtirî ji bo sûdemendîya wê. Lê dema ku li gor sûdemendîya wê be, wê demê mirovên ku tu sûdê jê nebîne; dê dev jê berdin.

Ev yek di demên dawî de di koçkirina ciwanan a bêrawestan de, bi awayekî zelalî hate xuyakirin. Jixwe nehizirîn ka bandorîyên wê yan bobelatên ku bi koçkirinê re çêdibin, çi ne? Dibe ku kirîzeke domdar çêke ku zîyanê bigihîne nifşên pêşerojê (zarokên zarokên wan). Dema ku ev kategorî bi rêya koçkirinê re li dûv berjewendîyên xwe yên taybet biçe; bêyî ku bizanibe ka ev koçberî wê çawa wê ji xwe re bi kar tîne, wê gavê bê guman dê bikeve kortê de.

Dewlet rê didin vê kategorîyê ji bo ku koç bike; ji bo ku hêzên wê bi ser xwe ve bikşînin û di mijara pêşxistina aborîya xwe de bi kar tînin; ji ber ku ew kategorîyeke hişmend, rewşenbîr, xwende û karker e.

Destpêkê xewn û azwerên vê kategorîyê yên jiyana xweş, ji xwe re bi kar tînin, ew jî bi rêya geşkirin û xweşkirina rewşa jiyana li cem, her wiha diyar dikin ku ew alaveke ku bi erzanî tevahî xewnan pêk tîne. Hemû rêyên hêsan, biewle û hêmenîyê ji wan re peyda dike, da ku wan bi rêya bihuşta domdar sawêr bike. Êdî ev kategorî berê xwe dide rêwîtîya nediyar. Weke ku me berê anîbû zimên jî, ji ber ku ev kategorî bi gelek rolan radibe; li dûv berjewendîyên xwe yên kesayîtî, tevî ku li ser hesabê rêgez û nirxên wî be jî.

Çawa ev kategorî ber bi koçberîyê ve tê ajotin?

Dibe ku ev kategorî bi bijartekên jiyanê (pêşeroj, şûkirin, xwendin, dewlemendî) bihizire, êdî kelemên ku rêya wê asteng dikin; dibin sedema nearamîya kesayet û bilindbûna asta nigranîya wê. Dibe ku gelek teqînên hestîyarî li dûv hev pê re çêbibin û nehevsengî jî di têkilîyên wê yên civakî

de rû bidin. Bi vî awayî dê bibe nêçîreke hêsan ji dijmin re, piştre dê ber bi cihê ku xwestekên wê bi hêsanî pêk tînin ve, diçe, êdî dibe ku li ser hesabê rêgez û rûmeta wê be jî. Bi vê yekê, rûxandinên din di jiyana vê kategorîyê de dest pê dikin ta digihêje asta ku bibe pêlîstokeke bêarmanc. Ev jî bi zelalî di tevlîhevîyên derûnî yên di jiyana ciwanan de li derveyî welatê xwe, dîyar dibe.

Îcar gelo sedem çi ye ku ev kategorî ber bi hembêza xweşguzarêya derev ve dibeze û bi angaşta peydakirina jiyaneke xweştir, xwe dixe nav lepên kedxwaran ku ji bo jiyaneke xweş û ji bo parastina kesên din xwe gorî dike?

Çima ji welatê xwe direvin û hêza xwe di tiştên din de dimezêxin; tevî ku asta wan ya tevgerî û dînamîkî û nermîtîya tevlîbûna wan bilind e, lê weke kesine ezezî û nebîrbir xuya dikin.

Ji ber ku ev kategorî nimûne ye û ji berjewendî û peywendîyên kesayetî dûr in, mirov dikare ji hêza wê sûdê bigire û tevlî kar bike û li gel wê kar bike, loma divê ev nemûne were perwerdekirin, ji ber vê yekê divê vala nemînin û ne weke rengekî weke hev li wan were meyzekirin, ji ber ku cudahîyên kesayetî roleke mezin di birêvebirina wan û avakirina ramanên wan dilîzin. Li gor vê yekê gengaz e ku li ser çawanîya biryardayînê bên perwerdekirin, lê belê divê derfetên pêkan ji wan re hebin, ji bo wan biryaran bi bawerî û hişmendîya xwe pêk bînin, ta ku ji ketwerîyê nevciniqin ku kesayete xwe bê wate bibînin, ji ber ku ew di koka xwe de kategorîyeke rexnevan e û nimûnetîya bêtirî nêzî yotobîyayê ye bingeh digire, her wiha li ser bingeha ku ketwarî bi hizra nimûneyê re heman e rexnê dike û ew bi xwe fişar û sitemkarîyê ji tu alîyî napejirîne.

Koçikirina Ciwanan, welêt bêyî parastinê. Êdî ji ber ku îro ew bingeha piştgir a çavkanîya pêşxistin, nûjenkirin û berevanîyê ne û hêza ku dijmin jê ditirse ji ber ew kelha berxwedanê ya parastina vî welatî ye; her tim hêzên pilanker ên dijî gelê Kurd dixwazin hêza ciwanan bidizin, stûna jîndar û çalak li hundirê welêt birûxînin û berdeka li dij sitemkarî û zordarîyê pûç bikin ku li şûna wê berdeka berevaj a koçikirina ciwanên me li dûv leylana xweşguzarîyê.

Çawa divê em ciwanên xwe şîret bikin?

Berdewamîya peywendîya bi civak û çandên din re, awayên cihêrengî û cihêwazîyê di hundirê pêkhateyên civakê de zêde dikin, ev cihêrengî û cihêwazî dibe ku bibe yek ji karîgerên parçebûnê. Her wiha qelsbûna hişmendî û hesta neteweyî jî dihêle ku ev cihêrengî û cihêwazî zêde bibe. Ev yek dihêle ku civak li hember êrîşên (çandî, aborî, civakî) bimîne. Loma gerek e alîyên berpirsyar û yên ku girîngîyê didin vê kategorîyê, li ser van tiştên li cem vê kategorîyê baldar bin:

**Wateya Kesayetê:**

Ew e naskirina kesayetê weke ku di rastîya xwe de ye, êdî dema Ku mirov kesayeta xwe ya rastî têbighîje, xwedîtina wî bi hûrbînî çêdibe û dibetîyên wî bêtir nêzîkî ketwarîyê ne ku ew bi xwe wan didarêûe bê bandora kesên din. Bê gûman ev yek destek û handan jê re divê.

**Hestbûna Zelal Bi Nasnameyê:**

Hestbûna bi nasnameya xwe, nirxdayîna herî bihêz a ku dihêle mirov derfet û karîna xwe ji bo pêkanîna kesayeta xwe bi kar bîne, da ku di şopandina şêwazeke zelal de kesayeta xwe tekûztir û afrînetir bike, ew jî li ser bingeha xwebirêvebirina berpirsîyar û bêtir pêşbikeve û gihêje.

**Lihevkirina Civakî:**

Rêzgirtin kesên din re, bi pejirandina kesayetê pêk tê. Êdî kesê ku diane kesên din rêzkirîyar û ramanên wî rêz digirin û dipejirînin, bêtir beşdarî wan dibe, ji ber ku ew karîna alîkarî û danûstandina bi kesên din re, di kesayeta xwe de dibîne.

**Bûnmendî:**

Ji taybetmendîyên balkêş ên reftara dirust, ew e ku xwedîyên wê ji dêvla ku ji bûnmendîyê birevin û nifiran lê bikin, wê dipejirînin, her wih dizanin çiqas jiyan dijwar e, êdî çiqasî pirsgirêk û alozîyên jiyanê hebin jî, têkoşîn ranaweste.Jixwe tê zanîn ku astengîyên jiyanê gelek derfetên pêşxistina karînên mirovan vedihewîne û dihêle bawer bike ku pêşeroj ji niha û berê jî dibe ku geştir be.

**Têgihiştina Kelecanî:**

Têgihaştkerê hestyar, ew kes e ku dikare têkilîyên civakî li ser bingeha rêgeza dan û standinê saz bike. Her wiha dikare rastîya rewşên guherbar bipejirîne, ew jî ji ber ku nerm e, loma xwe bi şêwazekî hişk ji reftar û

hizirînê nagire, lewre dikare bi guherîn û helwestên dijwar re rû bi rû bimîne.

**Vîn:**

Weke dîyardeyeke derûnî, ew ji bûyerên mîheng û birêvebirina xweyî re, stûneke bingehîn e.

Sazgêrîyên Karê Vîyanî Wisa Tên Destnîşankirin:

Çalakirina mirov ji xebata xwe ya kesayetî re û geşkirina hêza xwe, da ku astengîyan derbas bike.

Têkoşîna li hember dilkêşîyan, ango vîn nahêle ku mirov bi bandorîyên derve yên dilkêş bertekdar be.

Biwebawerî.

Berpirsayrî:

Kesê ku ji xwe û ji jêhatîyên xwe bawer be, dikare bi jiyan û pirsgirêkên wê re têbikoşe, êdî li gorî pisporî û karînên xwe tev bigere.

**Dawî:**

Ji koçberîyê re gelek rû hene. Ew jî di rewşine taybet de xuya dibin ku komeke ji niştecîyên welatekî dagir dike. Bi vê awayî koçberî dîyarde, pirsgirêk yan bobelatek e. Yan jî zagoneke xwezayî ye ku mirov ji bo xweparastina ji metirsîyekê bi kar tîne. Lê belê koçberî ji gelê Kurd re mîna bobelatekê ye ku ji berê ve û ta niha jî dijmin li dijî nasnameya Kurdî û rola Kurdan a pêşeng di guhertina herêmê ber bi demokrasîyê bikar tîne.

Koçberîya Kurdî tevî astengîya rewş, awa û amûrên peydakirina wê di nav gelê Kurd de, ji koçberîyên din ên ku li cîhanê çêbûyî cuda ye. Ji ber ku nikarîbûn heskirina kesê Kurd bi welatê wî ve bihejînin. Lewre piranîya koçberîyên Kurdî di hundirê xaka Kurdistanê de bûn. Kurdistana ku gelê xwe hembêz dikir, birînên wan derman dikir û peywendîyên biratîyê di nav wan de xurtir dikir. Mîna koçberîya Cihûyan a ku li tevahî alîyên cîhanê belav bûbûn, weke wê nehat bi serê Kurdan, êdî ji kevin de û ta roja me ya îro; koça Kurdî bi hêvîya vegera welêt ma. Weke tê zanîn ku gelê Kurd bi hemû kategorî, cure û pêkhateyên xwe ve û bi heman jankêşanê; tûşî koçkirinê hat, ji ber ku kiryarên ku ji hêla dewletên dagirker yên li Kurdistanê dihatin bikaranîn; xwedî heman armanc, rêbaz û zagonan bûn.

# Wateyên Pergala Ewlekariya Niştimanî Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

(Beşa 2)

**Ewlekarîya niştimanî:**

Berî em ewlekarîya niştimanî bigirin dest, arîşeyeke ku têgîna neteweyî û niştimanî wê raber dikin heye. Çimkî şîroveyên derbarê van her du têgînan de gelek in û xuya dike ku bandora îdeolojî û alîyên bîrdozî li ser vê yekê heye. Em di gelek lêkolîn û jêderan de têgîna ewlekarîya neteweyî û ewlekarîya niştimanî, weke du têgînên hevwate carekê û weke du têgînên serbixwe careke din dibînin. Hin caran netewetî[1] weke nasnameya nijadçandî ya kes tê şîrovekirin. Lê di hin ferhengên zimanê erebî de wateyeke din ya netewetiyê heye: "Netewetî: Peywendiyeke civakî ya hestiyarî ye ku ji hevbeşiya di welat, zayend, ziman û mifayan de pêk tê"[2]. Di Ferhenga Felsefeyî wiha hatiye: "....neteweparêz ew kesê endamê neteweyekê ye... û netewetî ew taybetiya zagonî ye ku ji hevbeşiya di yek welatî de pêk tê, jixwe regezname wê dinimîne... Her wiha netewe têkiliyeke civakî ya hestiyarî ye ku ji hevbeşiya di welat, zayend, ziman, çand, dîrok, şaristanî, hêvî, berjewendî..."[3]. Di zanistnameya aborî û civakî[4] de wiha hatiye: "Netewetî (Nationalism) endamtiya komeke mirovî ya ji welatekî amaje dike, ew jî bi merca ku dîrokeke hevbeş, zimanek û çandeke hevbeş li ser erda welatekî wan bigihîne hev, her wiha li ser hesta çarenûsê, armanc û berpirsyariyên hevbeş yên hemû hemwelatiyan, bigihîne hev. Netewetî, gel û hestekî hevpar di navbera kesan de ye, dihêle ku di hest û reftarên xwe de bi ramana dilsozî û tevlîbûnê erdeke diyarkirî

---

[1] Netewe = peope - Netewetî = nationalism - Netewebûn = Nation. (Wergervan)

[2] Wate û pênaseya neteweyê di Ferhenga el-Wsît de, zimanê erebî yê hevdem; el-Raid, Lîsan el-ereb, el-Qamûs el-Muhît ferhenga erebî-erebî, lînk: https://www.almaany.com/ar/dict/ar-ar

[3] Cemîl Slîba; el-Mucem el-Felsefî; beşa duyem; el-Şerike el-Alemiye Lilkîtab; Beyrût 1994; r205

[4] Dr. Ismaîl Ebdilfetah Ebdilkafî; el-mewsûe el-iqtîsadiye wel-Içtîmaîye (erebî-inglîzî); Kutub erebiye Lilneşir; r 397

bandor bibin...". Lê di Ferhenga Ramyarî 5 de wiha hatiye: "Netewetî... tevgereke îdeolojîk e ji bo bidestxistina birêveberiyeke xweser ji komekê re ku neteweyekê pêk tîneku ji neteweyên din cuda ye. Tê gotin ku divê her yek netewe xwedî delweteke yekbûyî be.". Di zimanê kurdî de têgîna "Netewe"yê hem ji bo wateya "qewmiye" ya erebî hem jî ji bo wateya "ume" ya erebî tê bikaranîn. Di kurdî de netewe rewşa têkiliyên aboriyî, civakî û ramyarîyên gelekî vedibêje. Dema ku desthilat di destê neteweyekê de asê dimîne, netewedewlet derdikeve holê. Ramangerê navneteweyî Ebdulah Ocalan6, di rexneya netewdewletê de çar sembol û dirûşmeyên wê amaje kirin, ew jî ev in: "Yek al, yek ziman, yek welat û yek dewleta navendî."

Gelek lêkolîn amajeyê bi wê yekê dikin ku rayên têgîna ewlekarîya neteweyî li sedsala 17`an vedigere; ew jî dema ku peymana Westfalya sala 1684`an li Almanyayê li dar ket, ev peymana rê li ber çêbûna netewdewletê vekir û dawî li şerên olî li Ewropayê yên di navbera peyrewên dêra Katolîk û dêra Pirotî de anî. Gerîngtirîn rêgezên vê peymanê ev in: Rêgeza dilsoziya ji neteweyî re, ango dilsoziya ji neteweyê re ne ji dêrê, rêgeza serokatiyê, ango dewlet xwedî desthilat, ramyarî û biryarên xwe ye, heriwiha rêgeza destnewerdana di karûbarên hundirîn ên dewletan de. Lê weke wate, di ramyarîya împerator û qiralan di şaristaniyên kevnar ên cuda de bi serperiştiya kahin û rawêjkaran, ewlekarîya neteweyî hebû û bi rêya efsane û yasayên olî dihat derbirîn. Prof "Samuel Huntington" di pirtûka xwe ya bi navê Hevrikiya Şaristaniyan"7 de, amajeyê bi wê yekê dike ku netewdewlet dê karîgereke sereke di karûbarên cîhanê de bimîne.

*Samuel Huntington di pirtûka xwe ya bi navê "Hevrikiya Şaristaniyan" de dibêje: "... mirov ramyarîê ji bo destnîşankirina nasnameya xwe, her wiha ji bo geşepêdana berjewendiyên xwe bi kar tînin. Çimkî heta ku em kesên din nas nekin, em ê nas nekin em kî ne. Ev yek jî dema ku em nas bikin ka "em li dijî kê ne?" pêk tê..."*

---

[5] Dr. Wedah Zeytûn; el-Mûcem el-Siyasî; çapa yekem; Weşanxaneya Usame Lilneşir we-Tewzî: Urdun-Uman 2010; r 270

[6] Ebdulah Ocelan; Manfîstoya Şaristanya Demkratîk; bergê pêncem "Doza Kurd û Çareya Neteweya Demokratîk; Parastina Kurdên di nav pencên qirkirina çandî de"; çapa duyem 2014; wergera Zaxo Şiyar; çapxaneya Azadî; r 53

[7] Samuel Huntington; Hevrikiya Şaristaniyan- Jinûveçêkirina Sîstema Cîhanî; werger: Telet Eşayib; çapa duyem sala 1999; r 39

Her wiha lêgerîna li dijminekî yan jî afirandina wî, gaveke ber bi girêdana rikberiyê bi nasnameyê ve û sedema hebûnê ye. Tişa ku piranîya dewletên faşîst û rêjîmên şofînî û tiyokrat bingeh girt, ev bû. Dewlet û rêjîmên ku dibînin ku şer ew tişt e ku mirovan dixe netewe û yekîtiya niştimanî li hember dijminekî hevbeş bi hêz dike. Jixwe saziya olî û sermayedar, faşîst û olgarîşên mezin jî bi taybet, ber bi vê bijardeyê ve diçin.

Ji bo têgeha welat, piranîya ferhengên zimanê erebî wiha ew rave kiriye: "Welat: Cihê mayîn û rûniştina mirov e, heke lê ji dayîk bûbe yan na; endamê wî cihî ye"8. Di Ferhenga Felsefeyî9 (el-Mucem el-Felsefî) de wiha hatiye "Welat bi wateya xwe ya giştî cihê lêmanê ye... û bi wateya xwe ya taybet ew jîngeha giango ye ku hestên mirov yên neteweyî pî ve girêdayî ne. Tişta ku welêt ji netewe û dewletê cuda dike, karîgereke wejdanî yê taybet e, ew jî girêdana bi xakê re û pîrozdîtina wê ye; ji ber ku gorên kalan lê ne. "Têgîna dêniştiman heye ku ramangerê navneteweyî Ebdula Ocelan10 wiha şîrove kiriye: "...di warê civaknasiyê de têgîna dêniştiman, erdnîgarîya ku çandek li ser ava bûye, bazar li ser hatiye damezirandin, bîrewerîyeke dîrokî li ser saz bûye û di milê demografîk de bi dirêjahîya sedên salan lê jiyan bûye; amaje dike... çimkî welat ne tenê ew erda ku hilberîna heyberî ya jiyana civakî û çandî li ser pêk tê ye, lê belê welat ew landik an mala ku tê de giyan û dîroka wê ava dibe...". Diyar e ku danûstandina têgeha ewlekarîya niştimanî di navbera lêkoler û kesên xwedî stratejîk de, bi kûrbûna di wateya netewebûnê li ser hesabê netewetîyê re zêde bûye; bi taybet piştî zêdebûna dîtina alîgirîya welat di ser alîgirîya netewetîyê de. Dibe ku derketina pergala sosiyalîyê, ramanên çepgir û fedralîyan; roleke sereke di wê yekê de lîstîye. Çimkî pênasekirineke nûjen dibêjin ku netewebûn "Kombûneke ji kesên ku xwedî heman hişmendiyê ne"11.

---

8 Pênase û wateya peyva "Welat" di Ferhenfa el-Meanî el-Cami de- ferhenga erebî-erebî; lînk:
https://www.almaany.com/ar/dict/ar-ar/%D9%88%D8%B7%D9%86/

9 Cemîl Slîba; el-Mucem el-Felsefî; beşa duyem; el-Şerike el-Alemiye Lilkîtab; Beyrût 1994; r 580

10 Ebdulah Ocelan; Manfîstoya Şaristanya Demkratîk; bergê pêncem "Doza Kurd û Çareya Neteweya Demokratîk; Parastina Kurdên di nav pencên qirkirina çandî de"; çapa duyem 2014; wergera Zaxo Şiyar; çapxaneya Azadî; r 168

11 Heman jêder; r 50

Li gor xalên navborî, ewlekarîya neteweyî weke têgeheke rewanî tê dîtin ku girêdayî ewlehîya komek kes e ku bi hev re neteweyekê saz dikin û dibe ku di erdnîgarîyeke pev ve yan jevdûr kom bibin; li kêleka wan hin netewên din li derdorê ku ewlekarîya wan a taybet heye dijîn. Lê ewlekarîya niştimanî têgeheke girêdayî erdnîgarîya ramyarî ye û girêdayî ewlehîya komek kes an netewe yan jî netewebûnên ku li yek erdnîgarîya pev û ji milê ramyarî ve girêdayî hev in, her wiha têkiliyên di navbera wan de bi rêya sabareke ramyarî li gor girêbesteke civakî ku li ser li hev kirine çêbe; tên birêxisitin. Bi vî awayî wateya ewlekarîya niştimanî ji wateya ewlekarîya neteweyî berfirehtir tê dîtin. Arîşeya têgînan di wergerandina ramanên lêkolerên biango de ye. Çimkî di gelek wergerandinan de "National Security" bi wateya ewlekarîya neteweyî û di heman demê de bi wateya ewlekarîya niştimanî derketîye holê. Wergera "welatparêziyê" di zimanê ingilîzî de "Patriotism" e û wergera netewetîyê "Nationalism" e. Ev mijara nakokîyê li cem mirov wateya ewlekarîyê di navbera çanda wî û çanda lêkolerekî din de çêdike.

Di serdema nûjen de ewlekarîya neteweyî yekser bûye girêdayî ewlekarîya dewlet yan desthilatê ye, ne girêdayî ewlekarîya wan neteweyan e ku di wê dewletê de dijîn. Em vê yekê di ewlekarîya neteweyî ya piranîya pergalên zordar û tevgir û pergalên ku nijadeke destnîşankirî mezin dike de dibînin. Ferhenga Ramyarî(el-Mucem el-Siyasî)12 wiha dinvîse: "Ewlekarîya neteweyî; ew parastina dewletê ji hemû cureyên êrîşa derveyî, sîxûrî, rûxandin, acizkirin û bandorên dijber e". Dibe ku ewlekarîya neteweyî girêdayî ewlekarîya neteweyî ya komek dewletan be, weke doza Filistînî ku bûye gefekê li ewlekarîya neteweyî ya erebî ye; ango dewletek ewlekarîya neteweyî ya sabareke din, weke temamkera ewlekarîya xwe ya neteweyî dibîne.

Em dikarin ewlekarîya niştimanî wiha şîrove bikin: Karîna dabînkirin û peydakirina mercên pêwîst ên berdewamkirina birêvbirina xweser a karîgerên hêzê yên her sabarê ye, ew jî karîgerên weke erd, niştcih, dahat, dewlemendî, hêzên çekdar û çandê ne. Berdewamkirina desthilata razber û şênber ya girêbesta civakî, misogerkirina ewlekarîya mirovî, şiyana dabînkirina xwetêrkirinê di hemû waran de, derfeta vehewandina her kirîz

[12] Dr. Wedah Zeytûn; el-Mûcem el-Siyasî; çapa yekem; Weşanxaneya Usame Lilneşir we-Tewzî: Urdun-Uman 2010; r 46

an bobelateke ku dibe ku çêbibe yan çêbûye û çarekirina bandorên wê û peydakirina parastinê ji bo dubare nebe. Di heman demê de şiyana sekinandin yan neçarkirina dijmin yan aliyekî din ku nikaribin xalên navborî ji bo ziyankirina welat û hemwelatîyan yan ji bo piroje û rojevên taybet bi kar bîne. Pêdivîya pêkanîna ewlekarîya niştimanî bi hebûna desthilatên rewa heye ku hevtêkilîyê di navbera berjewendiyên hemwelatîyan û ramyarîya hundirîn û derveyî ya ferwerîyê hemaheng dike û rehendên ewlekarîya niştimanî geş dike. Divê pilan, piroje û çareyên geşepêdanî û stratejîk ji bo veberhênana derfetan û bihêzkirina dahatên hêzê û derbaskirina xalên lawazîyê ji bo pêkanîna karîgerên xweşguzariyê û rakirina sedemên tirsê yên nihayî û yên paşrojê, li cem wan desthilatan hebin. Li gor lêkolînekê[13] ku li vê mijarê kolaye, ewlekarîya niştimanî misogerîya serwerîya hundirîn û ramyarîyên hundirîn û derveyî ye. Girftariyeke çarnûsî ye ne girêdayî desthilata dewletê û mayîna wê yan kategorîyeke destnîşankirî ye û pêdivîya wê bi kesê ku wê fêm dike heye ji bo ku wê bi rê ve bibe û li gorî asta aramiya hundirîn û bipêşketinê.

Em dikarin şîrovekirineke din ji ewlekarîya neteweyî re raber bikin ku komeke pergal, raman, rêgez û ramyarîyan e ku mayîna civakê di ser asta dîstupiyayê[14] dabîn dike. Nermbûn û nedogmatîk sînorên dem û cih didin ewlekarîya niştimanî û dibe ku li gor berjewendî û pêşkîyan were guhertin. Ji ber ku rewşa ciyopolîtîkî ya her dewletekê li ser asta şiyana (li gor dahat, şiyan û wizeyên wê) wê ya bandorkirina li ser ramyarîya herêmî û navdewletî dimîne.

Bi giştî sazgêriyên serderêya bi ewlekarîya niştimanî û sazbûna wê li gor çawanîya girêbesta civakî yan îdeolojiya desthilatê dimîne. Bi vî awayî çawanîya jêderên tirsnakê yên ku welat û hêmanên wî armanc digirin, tên destnîşankirin.

Jêderên ku ewlekarîya niştimanî tevlîhev dikin:

Em dikarin rehendên niştimanî û binemayên wê di pêvajoya diyarkirina jêderan û pênasa wan de bigirin dest. Jêderên hundirîn û derveyîn yên

[13] Fehed Bin Mihemed el-Şeqha; el-Emin el-Wetenî: Tesewir Şamil; Navenda Lêkolînan li Zanîngeha Nayif ya Erebî ji bo Zanistên Ewlekariyê; çapa yekem; Riyad 2004

[14] Dîstupya (Dystopia) yan şarê gendel yan jî cihê nebaş. Tersî yûtiypiya ye. Tê wateya civakeke aşopî gendel û xêrnexwaz. Ku kaos, rûxandin, kuştin, çewisandin, xizanî û êş tê de heb. Ango cihê xêrê li cibakê nebe û mirov xwe ji mirovbûna xwe dişo.

tirsnakê hene ku dibe ewlekarîya niştimanî bixin bin gefan yan jî komeke astengî û pirsigirêkan li pêşberî wê derxin. Ya baş ew e ku rewşa neewlehîyê bi gefên leşkerî tenê neyê sînorkirin, lê belê hin tiştên din jî yên xwedî rewşeke aborî, civakî, teknîkî û hwd wan hene. Weke mînak tevî ku ewlekarîya niştimanîya Ewropî xwedî hêzeke leşkerî ya mezin e jî, ji tiştên ku bandoreke neyînî li ser dikin koçberbûn û tundrewîtî ne. Heya ku li ser asta cîhanê piroje û rojevên ramyarî yên ku dixwazin desteserîyê pêk bînin û çanda nehezkirin û zikreşiyê belav bikin hebin, ewlekarîya niştimanî dê di nav tirsnakê de bimîne. Loma ji bijardeyên ramyarî, civakî, çandî, zanistî, aborî, ragihandinî û leşkerî tê xwestin ku her tim di amadebaşiyê de bin û stratejîyên rûbirûbûnê bi pêş bixin. Pabendîya bi nasnameya niştimanî, peydakirina heyber û samanan, dadmendîya demokratîk, xwetêrkirina di hemû aliyan de û pilanên stratejîk ên xweparêzîyê ji bingeh û avakerên sereke yên ewlekarîya niştimanî ne. Ji aliyekî din ve hejmareke gef û rûbirûbûnên rasterast û nerasterast yên ku gefan li ewlekarîya niştimanî dixwin hene. Ev gef û rûbirûbûnên nerasterast bi gefên sîbranî yên elektronîk yên ku torên peywendîya elektronîk ên xwecihî armanc digire, tên nimandin. Ev gefên sîbralî di çarçoveya pêvajoyên hewildanên derbaskirina torên agahiyên kesayetî, diravgehî û ewlehî de dixebitin, ew jî bi mebesta çetekarî, komkirina agahiyan û fişarkirinê ye. Li gorî raporeke Koma Karê Tenduristîya Derûnî ku di sala 2013`an de hatiye weşandin15, sedemên pirsgirêkên derûnî yên ku %10 ji niştecihên cîhanê astengîyan ji ber dikişînin ev in: Rûbirûbûyên pirbûna niştecihan ku pê re pilankirina geşedana stratejîk jî lewaz e, qelsbûna binyada jêrzemînê û avakirina bêserûber, lewazîya beşên lêkolînên zanistî, her wiha karîna alavên ragihandinê yên xwecihî û dezgehên civakî û rajeyî li hemberî pêşketina rêbazên şerê taybet û derûnî, belavbûn û berdewamiya hin nexweşîyên derûnî û nehadarêya kesayetî di nav kesan de. Lê sedema herî metirsîdar ew e dogmaîyê di hestên şofînizm û radîkal de gur dike û mirovan ji sinc û nirxên sincî dûr dixe. Yan jî piştgirêya hêzine biango ji sergeheke îdyolojî

[15] Rapora Koma Karê Tendirustiya Derûnî 2013. Amadekar: Harî Dî Sîlva û Kiyara Samîlî. Nivîserî: Vîkram Batîl û Şîxar Saksîna:Tendirustiya derûnî jiyanê ber bi xweşiyê ve dibe, Piştgiriya civakan, Afirandin der barê tendirustiya derûnî de, Kongira cîhanî der barê Afirandin tendirustiya derûnî de, Saziya Qeterê, malper https://www.wish.org.qa/wp-content/uploads/2018/02/27425_WISH_Mental_Health_Report_Arabic_web.pdf

dike; çimkî bandorên neyînî yên dijberiyên navneteweyî, tîreyî û îdyolojî bandorê li ser welatîyên welatine din dikin ku ew welatî bi hempayên xwe re dilsoj in.

Hin ji gefên din jî ev in; koçkirina neyînî ji derveyî welêt û koçkirina berovajî; ango ya biyanîyan ber bi welêt ve; ji ber ku ev koçberî bi xwe re rûbirûyên ramyarî, aborî û ewlehî tîne. Her wiha hin ji wan gefan nekontrolkirina malgirtinan di hemû waran de ye, guherînên seqayê, qirêjî, bandorên neyînî yên cîhangêriyê û bobelatên jinişkan ve ne û bandorên kirîzên aborî, darayî û ramyarî li ser asta herêmî û navneteweyî ne.

Gef û rûbirûyên rasterast jî bi van xalan tên nimanidin; dema welêt nikaribe xwetêrkirinê di beşên cur bi cur de pêk bîne, ango heyber û samanên wî welatî kêm bin, derfetên kar kêm bin û xizanî belav be, hilandina niştimanî ya stratejîk ji heyberên lojistîk û kokan re kêm be16, hin sabarên din ên ku xwedî piroje ne xwezayî, radîkal, şofînizm û embralizim hebin û dixwazin welêt desteser bikin, hevsengîya hêzan qels bibe û pirojeyên hestiyar werin cîbicîkirin; bi taybet ew pirojeyên ku dibe sûdê bigihîne ewlekarîya niştimanî ya wî welatî lê ziyanê digihîne welatên din, her weke pirojeyên navokî, pirojeyên avakirina bendavan û pêşbirka xwebiçekkirinê. Her wiha hin ji van gefên rasterast ev in; sûc û tewanên pilankirî yên ku sînorên niştimanî derbas dikin, welat derbasî rewşine ku bi awayekî domdar kirîz û bobelat lê hene bibe, lewazîya karînên leşkerî yê saloxgerî, qelsiya birêveberêya demokratîk17 di danûstandina bi doz û

[16] Kok: ew tiştêb binirx in ku mirov bi hesanî dikare bike pere; jixwe pere bi xwe jî usûl in. Ev usûl pere, tiştên binirx, heyber, veberhênan, alav, zevî, siware, avahiyên bazirganî, mafê nivîsarî, weşandin, belge....dihewîne.

[17] Birêvebirin wergera peyva (Governance) ya îngilîzî ye. Ev têgeh tê wateya karîna her rêveberiyekê ku pêşketin û çakbûnê bi rêya bikaranîna rêbazên biker û guncav di hilberînê de pêk bîne. Pêwîstiya vê yekê bi bikaranîna durist ji zagon û biriyarên durist ûmentiqî re û pêkanîna hevsengiyê di navbera berjewendiyên taybet û giştî de û êopandina pêşveçûna kar û çalakiyan bi awayekî domdar…

Şeş rehendên birêvebirinê hene; dengdayîn û berpirsiyarî, hedariya siyasî û nemana tundiyê, bikêriya birêvebirinê, çakbûna rêxistinî, seerweriya zagonan û têkbirina gendeliyê. Hin nîşaneyên birêveberiya cîhanî hatin bipêşxistin da ku bi rêya xwesipartina li nişaneyên navneteweyî û beşdarbûna gelêrî… geşepêdan pêk were. Ev nîşane wisa ne; aştî, ewlehî, serweriya zagonan, mafê microvan, hevbeşî, geşepêdana domdar û geşepêdana mirovî. Dr. Nuha Derwîş. Birêveberiya demokratîk a desthilata dadweriya gştî. Dîroka weşanê; 30ê çiriya paşîn 2011. Malper
https://dr-nuhaal-darwish.blogspot.com/2011/11/blog-post_8829.html

pirsgirêkên cur bi cur re ku li ser asta hundirîn û derveyîn derdikevin û egera ajbûna hestên êlî, partîyî, olî, tîreyî û nijadperestî li ser hisabê despakî û nasnameya niştimanî.

Ya ku van gef û rûbirûbûyan bihêz dike, metirsiyên nerasterast in, her weke şerê taybet, hêza nerim[18]a nerênî li ser sabarên din û tundrewîtî(ji hêla kesên ku çanda kînê gur dikin), her wiha kirîz, bobelatên hundirîn, gendeliya darayî û karîgêrîyê, lewazîya dadmendîya demokratîk ya ku rê li ber sazîyên dewletê vedike ku di zordarî û gendelîyê de kûr bibin, bikaranîna ramyarî ya baweriyan, her weke ku di pergala îklîrosî[19] û kehnûtî de heye ku ew jî bi rêya xwe dogmaîyê û cudahîyên çînî di navbera niştecihên heman civakê de peyda dikin. Lê metirsiyên rasterast; dema hin dewlet dixwazin bi rêya şer an dagirkerîyê yan jî sizayan û bi rêya dorpêçkirina aborî, ramyarî û teknelojîyê welatekî din desteser bikin, tê nimandin.

Ewlekarîya niştimanî bi hin pilan, karîger û çalakiyên cur bi cur jî tê bandorkirin. Lê eger ev karîger û çalakî ji hêla hin hêzên xwecihî yên bibandor û zordar ve werin bikaranîn û bi awayekî neyînî bi pêş ve biçin heya ku bibine mîna alavên ku ziyanê digihînin pergala ewlekarîya niştimanî û heya ku bigihêje rewşekê ku jê re dibêjin desthilatdarîya Birayê Mezin. Nivîskarê îngilîzî Corc Oroyîl di pirtûka xwe de (1984)[20] ev yek anî zimên û amaje bi wê yekê kiriye ku hewldana dewletê ji bo ku bandorê li

[18] têgeha hêza nerim têgeheke hinekî nû ye ku ji hêla Pr. Cozêv Nayî ve di çarçoveya têkiliyên navneteweyî de hatiye lênihêrtin. Corc ew wisa pênase kiriye; ew hêz e ku mirovbi rêya wê dikare helwestan bi ser xwe de bikişîne, lê ne bi rêya zordarî, gefên leşkerî, fişara aborî, dana reşweyan û kirîna alîgiriyê bi pereyan weke stratejîkên emerîkî yên kilasîkî, lê belê gerek e bi rêya kişandina kesan û îqnakirina wan bi helwestên ku tu bê bawer î.

Cozêv S. Nayî. Hêza nerim rêbazê biserketina siyaseta navneteweyî yeEbîkan ya Weşanê çapa yekem 2007 r24.

Mebest ji hêza nerim a neyînî ji bo statoyekê, ew çand eku ji kokê ve dijberî çanda statoyeke din e ji aliyê exlaq û têkiliyên civakî ve, mînak; fîlmên holyod di kelek fîlmên xwe de wêneyekî nerast û gelekî mezinkirî ji çanda emerîkî re dide.

[19] Îklorîsî, bihaneyek e ku derfetê dide oldaran da ku destwerdanê di karê siyasî de bikin da ku wan baweriyên xwe bi rêya siyasetê derbas bikin. Îklorîs, ew bawrî ye ua ku dibêje oldar dikarin destwerdanê di karê siyasî de bikin. Dr. Wedah Zeytûn. Ferhenga Siyasî. Çapa yekem. Weşanxaneya Usama. Ordin- Uman 2010 r42.

[20] Corc Oroyîl. Romana 1984. Çapa yekem 2996. Wergera Enwer Şamî. Navenda Çanda Erebî. Mexrib.

ser hişmendîya gelêrî bike metirsiyek e, ew jî ku rastîyên erênî biguhere û hizrê bi van her sê hevokan girê bide (şer aştî ye, azadî koletî ye û nezanî hêzdarî ye). Ev yek hilweşîna têgehên erênî yên ku xwedî hêzeke rewanî ne tîne bîra me; her weke têgihên şoreş, azadî û demokratîk û hwd. Her wiha mîna hilweşîna wateya raperîna civakên Sûriyeyê ya li dijî zordarîyê. Ev hilweşîn bi rêya rengkirina vê raperînê bi rengê dogmaîya olî ya ku tûndîyê pîroz dibîne, pêk hat. Her wiha em vê yekê di hewldanên çewsandina raperîna dawî ya civakên Iraqî de jî dibînin. Tiştên ku hatin gotin didin diyarkirin ku pergala ewlekarîya niştimanî tune bûye, pê re regezên demokratîk jî winda bûne û bijardeyên civakî, ramyarî, aborî, çandî û leşkerî pabendîyê bi nasnameya niştimanî nakin. Di encamê de civak ber bi Dîstûbiyayê ve tê xwarê; ji ber ku ev yeke mîna şerekî derûnî ye ku ji hêla çînên civakê yên jorîn ve li dijberî çînên din pêk tê. Loma gerek e ewlekarîya niştimanî her tim di rajeya civak û welatîyên ku di heman welatî de dijîn de be. Ev yek dihêle ku ew bingeha sereke ya ewlekarîya mirovahî, pêk bîne.

Rehendên Ewlekarîya Niştimanî:

Pilana stratejîk a ewlekarîya niştimanî xwe despêre veberhênana heyberên welêt ên peydakirî, ew jî ji bo pêkanîna armancan bi rêya xwesipartina li minhac û rêbazên pêwîst û nirxandina wê bi awayekî guncav bi rewşan re da ku bi awayekî durist werin cibicîkirin. Ew jî bi rêya berçavgirtina rêjeya peydabûna heyberan û rûbirûbûyên heyî û çawanîya misogerkirin, birêxistinkirin û dadmenkirinê. Ewlekarîya niştimanî enerjiya jiyanê ji bo sêgoşeya hêzê ya di her staoyekê pêk tîne. Ev sêgoşe bi hêzên hişk, leşkerî û aborî, hêza nerim ya çand û exlaqî û têkiliyên derveyîn û reftarên desthilatdarê yên giştî, tê nimandin. Ev yek dihêle ku kesên din vê statoyê weke dijmin nebînin. Weke mînak, hêza hişk ya Siwêsira ne xurt e lê hêza wê ya nerim pir mezin e. Vê yekê hiştiye ku cîhan tev rêzdarê wê bin û hişt ku hevsengiyê di kêmbûna hêza xwe ya hişk de pêk bîne; ji lew re ewlekarîya wê ya niştimanî li ser astên bilind misoger e.

Ji bo diyarkerên ewlekarîya niştimanî, rehendên ewlekarîya niştimanî bi awayekî giştî xwe dispêrin rewşa cyopolîtîkî ya welatan ku ev rewş bi dahatên cyolojîk, xaknîgarî û pergalên wê yên aborî, ramyarî, leşkerî, civakî, çandî û xizmetguzarî tê sînordarkirin. Her wiha bi jêderên metirsiyê, gef û rûbirûyên rasterast û nerasteras ên hundirîn û derveyîn û yên

pêşerojê, pilanên geşepêdana pêşeroj û stratejîk, asta pêşveçûna teknelojîk û pergala perwerdeyê û rewşa ewlekarîya mirovahî, herêmî û navneteweyî û li gorî girêbesta civakî û niştimanî û asta pabendîyê jî tê nimandin. Gelek lêkolîn bi zimanên cihêreng li ser rehendên ewlekarîya niştimanî û pêkaheteyên wê rawstiyane, lê tev jî negihaştine têgîneine wekhev ango nêzî hev jî. Dibe ku ev yek li sedem û mercên ku rehendên ewlekarîya niştimanî diyar dikin û rewşa pilankirina wê ya stratejîk di her jîngeheke lêkolînê de vedigere. Her wiha ji ber ku rehendên ewlekarîya niştimanî enerjiya jiyanê ya rehendên ewlekarîya mirovahî ku berî niha hatine diyarkirin, pêk tîne, ev têgîn nabin wek hev.

Bi giştî em dikarin çar rehendên ewlekarîya niştimanî ku xwedî bandor in di warê têkiliyên derveyîn û hundirîn de diyar bikin. Her yek ji van rehendan bi çend hêman û karîgeran ve hatiye şaxdan û diyarkirin. Ji ber ku ewlekarîya niştimanî dixwaze rewş û karîgerên ku mirov dûrî rewşa dîstopiyayê bike û ji ber ku mirov di jiyanê de xwedî nirxekî mezin e, ewlekarîya mirovahî tewereya sereke tê de pêk tîne.

Mirov dikare rehendên ewlekarîya niştimanî bi çar rehendên tekûz û carinan têkelî hev kurt bike. Ev rehnd jî wisa ne; rehenda aborî, rehenda civakî, rehenda Tenduristî û rehenda berevaniyê. Pêwîstiya van her çar rehendan bi misogerî û bipêşxistina domdar, parastina wê ji rûbirûbûyîn, metirsî û gefan heye. Her wiha pêwîstiya wê bi bijardeyên niştimanî yên ku ji girêbesta civakî û niştimanî re dilsoz in heye. Bê guman gerek e nirxên exlaqî xwedî cihekî girîng in li ba vê bijardeyê û gerek e xwedî asteke hişmendiyê ya bilind bin21.

Rehenda aborî:

Peyva aborî (Economic) vedigere Eristo û tê wateya zanista regezên birêvebirina kar û barê malê22. Ev peyv ji du peyvên yûnanî hatiye dariştin; (Oikos) tê wateya malê û (Nomos) tê wateya destûr ango zagonê. Lê têgeha zanista aborêya ramyarîcara yekem ji hêla lêkolînerê ferensî Anton

[21] Hişmendî hêzeke derûniyê ye ku hemû endamên pêhisîmî dihewîne û ji bo bidestxistina zaniyariyan amade ye. Her wiha ew amadekariya tam e ji bo wergirtina zaniyarî û agahiyan bi rêya hizrandinê. Circanî. Ferhenga Pênasyan. Lêkolîner Mihemed Sedîq el- Menşawî. Weşanxaneya Fedîla. Qahire. Bê sala weşanê û hejmara çapê ye. R94.

[22] Dr. Ebdilhadî Elî Necar. Usûlên aborînasiyê. Çapa şeşem. Nivîsgeha Cela ya nû li Mensûre, Qahirayê. 1998-1999, r15.

Dî Monkirtiyan ve di sala 1615an de ji bo nimandina hunera birêvebirina diravên dewletê, hat bikaranîn. Her wiha lêkolînerê aborî yê mezin Adem Simîs di pirtûka xwe ya bi navê Samanên Neteweyan de di wateyeke nêzî vê wateyê de bi kar anî û têgiha wî ji aliyê daraştinê tê wateya hunera birêvebirina kar û barê dewletê23. Bi dehan pênase li ser aboriyê hatine nivîsandin, weke mînak di ferhenga têgehên aborî û civakî de pênaseyeke wisa hatiye24; aborî tê wateya bidesxistina mirov ji pêdiviyên xwe re bi baştirîn û arzantirîn nirx û dibîne ku aborî xwedî girîngiyeke ramyarî û civakî ye û ev aborî zanisteke ku hilberîn û geşepêdana samanan, kar, belavkirin û xerçkirinê lêkolîn dike. Aborêya şer jî heye; ev aborî girîngiyê dide peydakirina diravan ji bo kirîna çek û alavên leşkerî û dahat û tevahî enerjiyên welat ber bi berevaniya neteweyî ve dibe û hilberîna sivîlî vediguhêze hilberîna leşkerî û piştivaniya artêşê di berevaniya wê ya di ber welat de dike. Her wiha têgiha aborêya ramyarîjî heye. Ev aborî têkiliya di navbera ramyarî û aboriyê de û girîngiya destwerdana dewletê di aboriyê de dinimîne. Ramangerê navneteweyî Ebdela Ocealn di vê derbarê de wisa dibêje25:...Aborî weke pêvajoyeke peydakirina pêdiviyên madî yên pêwîst ji bo civakê...û nimandina sazûmanî û bingehîn ya pêwîst ji bo vê yekê... û kirîn û firotina pêdiviyên madî di bazarê de ye...Ebdela Ocelan dibîne ku jêdera peyva aborî, Zagona Komonîkirina Malbatê ye26.

Li gorî tiştên derbasbûyî, mirov dikare aboriyê wisa şîrove bike; ew çalakiyên hilberînî yê pergalatîk û pergala birêvebirina usûlên giştî ye ku dahateke madî ya binirx peyda dike. Ev dahat xizmeta geşepêdanê ji bo mirov, civak û sazîyên statoya heyî di her alî û her astê de dike. Her wiha pêdiviyên pêwîst ji bo berdewamiya jiyanê bi awayekî durist, peyda dik, hilandiyên lojistîk ên stratejîk ji heyberên xwarinê yên mîna tov û bizûran û ji blî wan peyda dike ku xwe di vê peydakirinê de dispêre samanan, her weke zevî, pîşesazî, bazirganî, av û jêderên enerjiyê yên mîna petrol, gaz û enerjiya xwenûker. Pêwîstiya van jêderan tevan bi geşepêdana domdar

---

23 Cemîl Selîba. Ferhenga Felsefî. Beşa duyem. Beşgeha cîhanî ya pirtûkan. Beyrût 1994, r110.

24 Dr. Îsmaîl Ebdilfetah Kafî. Ferehnga aborî û civakî (erebî Îngilîzî). weşanxaneya Pirtêkşn Erebî. R48

25 Ebdela Ocelan, Manifistoya Şaristaniya Demokratîk) parêznamye pêncemîn. Werger: Zaxo Şiyar. Çapa duyem 2014. Çapxaneya Azadî. R35

26 Heman jêdera borî. r 609.

heye. Her wiha pêwîstiya wan bi binyadeke jêrzemîn û jorzemîn a durist heye, her weke, torên pêwendî û gihandinê, regez, destûr û zagonên ku kar û barên mesrifî, darayî, gumrikî û bacî birêxistin dikin. Her wiha pêwîstiya wê bi van tiştan jî heye; mafên mulkiyeta taybet û hizrî, çavdêrêya Tenduristî û jinavbirina qirêjiyê. Em ji van tiştên ku li jor hatin diyarkirin tê digihêjin ku aborî li ser du tiştên sereke tê avakirin; peydakirina pêdiviyên dabara jiyana welatiyan û birêvebirina dahatên darayî û veberhênana wan di xizmetguzarî û pirojeyên civakî de. Îcar niştecih û diravên giştî ango diravên gencîneya saziya birêvebirina diravên giştî, ardûyên sereke yên enerjiya ku aboriyê di çarçoveya têkiliyên kirîn û firotinê de dilivîne ye. Çimkî ew rêjeyên hilberînê û asta nirxê karê niştimanî û encama giştî ya niştimanî diyar dike. Lê her û her xwetêrkirin di hemû aliyan de astengiya herî mezin li beramberî aborêya niştimanî pêk tine. Her wiha bandorên neyînî yên rojevên ramyarîyên navneteweî û malgirtinên bazarên cîhanî û rewşên herêmî û navneteweyî yên nehedar jî bandoreke neyînî li ser aboriyê dikin.

Dibe ku kêmbûna jêderên samanan li hin welatan bihêle ku ev dewlet xwe bispêrin jêderên kêm ango xwe pispêrin aliyekî ji aliyên din bêtir, weke mînak, dema çalakiyên pîşeyî xwedî bandoreke tevgerane bin, em ji aborêya giştî ya wî bajarî re dibêjin aborêya pîşeyî. Dema hilberîna pîşeyî beşa hilberîna niştimanî ya herî mezin li gorî ferhengên têgihên ramyarî, aborî û civakî27 pêk bîne, ev bajar bajarekî pîşeyî ye û aborêya pîşeyî piroje ango beşgehên pîşeyî desteser dike. Ev aborî berovajî aborêya ku çandinî yan jî sewalvanî… tê de serdest e.

Tevî pêşketina zanistên aborî û pêşkêşkirina bi sedan piroje, hê desthilat û civak nikarin xwe ji bin xeta xizaniyê derxin û pêdiviyên fîzyolojîk ên herî hêsan ji bo têrkirina miletê xwe peyda bikin. Eger em nerîneke bilez li nexşeya xaknîgarî ya cîhanê binerin, em ê bibînin ku gelek rûberên fereh ên ku mirov di wan de nînin an jî kêm in, hene. Beramberî wê hin cih hene ku bi mirovan dagirtî ne. Wisa dixuye ku koçberiyên mirovahiyê ku ji hezarê salan ve dest pêkiriye û heya roja me ya îro berdewam e ber bi navendên bajarî ve diçe ku ev navend ji hêla pergalên dewletî ve tên birêvebirin. Jixwe tê zanîn ku piranîya lêkolînên ku di warê zanistên xwezayî de

[27] Samî Zibiyan û hinên din. Ferhenga siyasî, aborî û civakî. Çapa yekem. 1990. Londin. Weşanxaneya Riyad Reyis. R 59.

dixebitin, didin diyarkirin ku samanên erdê yên li asiman, û li ser bejahî û di nav behrê de, eger baş werin bikaranîn, têra dabara mirovan bi hezarên salên dîtir dikin. Ji ber vê jî eger em bixwazin aboriyê bixin xizmeta jiyanê û wê ji tematî û hewldanên bidesxitina destkeftiyan a bêsînor rizgar bikin, pêwîst e aborî ji nû ve li gorî karîgerên navneteweyî û bi rêya aborêya komînal û eykyolojîk were birêxistinkirin. Gerek e ev yek li gorî pergaleke exlaqî ku dişibe karê şaneya mêşa hinguv were meşandin. Ev pergala ku em qalê dikin heman pergala aborî ye ku di serdema civaka xwezayî de dihat meşandin. Ramangerê navneteweyî Ebdela Ocelan ji alîgirê vê pergalê ye. Jixwe duxuye ku beşek ji hizrên wî yên ku li bakur û rojhilatê Sûriyeyê hatine meşandin, encamine erênî pêk anîne ku ev encam dikarin herêmê ji dorpêçkirina ku ji hêla hêzên xwecihî û herêmî ve li ser hatiye sepandin, xelas bikin.

Raman û erînên ramengerê navneteweyî Ebedela Ocelan li serbaoriyê de li dora pîşeya eykyolojîk û aborêya komînal digerin. Ocelan wan weke rizgarkerê ji desteserêya sermayedara cîhanî û ji hemû teşeyên bikaranîna malgirtinê dibîne. Di heman demê de wê weke rojerêya demokrasiyê li ser zeviya aboriyê dibîne. Her wiha ev aborêya komînal û eykolojîk teknelojîk, arzî û hedarêya gundewarî û bajarî jî ku eykolojîk û civaka demokratîk red nake, digire ser xwe. Di vê pergalê de û li gorî regeza Kar Azadî ye, hilandina sûdwergirtinê û komkirina diravan dadikeve sînorê xwe yê herî nizim. Hilberîna hemaheng bi eykolojîkê re, mirovan ji qrêjî û gendelîyê diparêze û jîngehê jî ji qirbûnê diparêze28. Aborêya komînal jî ku weke aborêya hevbeş û civakî ye, ji bo girtina rê li pêşiya bêkariyê û hilweşna civakî çareserî ye û zemîna madî ji bo wekhevî, azadî û demokratiyê pêk tîne. Eger ev pergal were rûniştandin, dibe ku qonaxa pergalkirina jiyana aborî û saziya wê weke fîdraliya yekîneyên aborêya komînal weke pergaleke aborî ya herêmî di herêmê de were destpêkirin. Ev yek jî bi rêya handana ked û hilberîna behreyî di çarçoveya eykolojîk û pêdiviyên pêşînede, dê bêkariyê nehêle. Her wiha aborêya ku ji malgirtinê hatibe paqijkirin û eykolojîka ku hemahengiyê bi xwezayê re dinimîne û teknîka ku dostê xweza û mirovan e, binyada sazûmanî ya demokratîkê û neteweya

[28] Eger hûn agahîne zêdetir bixwazin li pirtûka Ebdela Ocelan a der barê aboriyê de vegerin. Amadekar û pêşkêşvan Akademiya Ebdela Ocelan a zanistên civakî ku xwe dispêre nerînên Ebdela Ocelan der barê aboriyê de. Bê çap û sala weşanê ye.

demokratîk pêk tîne.her wiha Ocelan amaje pê dike ku koletiya kirêya karkeran a pir kêm û artêşa mezin a bêkaran berhemeke xwezayî ya sûdewrgirtina mezin a dewleta neteweyî û pîşeyî ye29.

Bi awayekî giştî û li gorî tiştên ku hatin gotin, ewlekarîya aborî girêdayî qasiya peydakirina dahat û teknîkan, karîna pilankirinê, hêzên mirovî û pêvajoyên hilberînê yên domdar e. Peydakirina rewşên ku hêza aborêya niştimanî misoger dike dikeve ser milê desthilatên niştimanî ku ev desthilat heyber û dahatan bi awayekî rêxistinkirî bi kar tîne, mafên avî û jîngehî yên welat diparêze, û pişgirêya geştiyariyê û pirojeyên nerimkêşkirinê, hilberînên niştimanî, hizir û pirojeyên avakirinê û lêkolînên aborî dike. Her wiha rûtenikiyê tekez dike, şerê malgirtin, gendelî û kirêya rên sûcên pilankirî dike30, teknelojîk û zanistên pêwîst tîne welat, pilanên pêwîst ji bo dan û standina bi bobelatên xwzayî û bobelatan re amade dike. Wisa dixuye ku bêaliya ramyarî li ser asta herêmî û navdewletî ji girîngtirîn karîgerên parastina aborêya niştimanî ye. Ev yek baş di tecrubeyên Singafora û Siwêsrayê de diyar in. Jixwe tê zanîn ku aborêya civakî û hevbeşî ango aborêya komînal û eykolojîk weke têgeheke berferehtir, birêveberêya xweser a aboriyê misoger dike, şaneyên durist ji bo pergala aborêya niştimanî misoger dike û di demên kirîzên aborî û ramyarî de piştgirêya wê dike; ku di dema van kirîzan de ji aliyekî ve bazarsarî û bêkarî belav dibe û ji aliyekî din ve nehedarêya hundirîn derdikeve holê. Dîsa girîngtirîn binemayên ewlekarîya niştimanî, pêkanîna xwetêrkirinê di hilberîna cihêreng û astên baş ên binyadên jêrzemîn û jorzemîn û birêvebirina van dahatan a durist de ye.

Rehenda civakî:

Civak bingeha netewyan in. Mirov nikare nîşayekê yan jî taybetmendiyeke tekane ji bo civakekê diyar bike, çimkî ev civak li gorî rêbazê jiyana xwe, çanda xwe, reftarên xwe û têkiliyên xwe belav û bişax dibe, mînak; civak li gorî pêrewiya xwe ya etnîkî yan jî çalakiyên xwe yên aborî, yan jî baweriyên xwe yên ramyarî û tîreyî tê cudakirin. Loma civakên

---

29 Eger agahiyên zêde bixwazin li Ebdela Ocelan, Manifistoya Şaristaniya Demokratîk vegerin. parêznamye pêncemîn. Werger: Zaxo Şiyar. Çapa duyem 2014. Çapxaneya Azadî.

30 Mebest ji sûcên rêxistinkirî, ew karên ne zagonî ne yên ku bi armanca bidestxistina saman û desteseriyê bi awayekî pilankirî pêk tên. Ev yek bi rêya şantac, şelandin, dizî, gendelî, reşkuştin, revandin, belavkirina tiştên qedexekirî, bazirganiya çekan, firotina mirovan...pêk tê.

kurdî, erebî, suriynî, rûsî…hene. Ji aliyekî din ve civakên çandinî, pîşeyî, sermayedarî…hene, û ji aliyekî din ve civakên deomkratîk, faşîzm, îslamî, xuristiango, şîî…hene. Ramengerê navneteweyî Ebdela Ocelan têgîna civaka neteweya demokratîk a ku mirovê xwedî Tenduristiyeke hişmendî û giango ava dike, pêşinyar kiriye31. Her wiha civakbûyîn yek ji mercên hebûna mirov a sereke ye. Asta têkiliyên mirov yên civakî hêza wî dinirxîne. Yek ji rêbazên herî kirêt ên lewazkirin û dûrxistina kesan, sepandina tenahîtiyê li serê ye32. Bi awayekî giştî rehenda civakî bi van tiştan tê sînordarkirin: karîna parastina civakê ji bêsinciyê û parstaina nirxên civakî, têkoşînkirna li dijî windakirina nasnameya niştimanî û sûc û tewanan, asta tecrubeyên serkeftî yên bijardeyên ramyarî, çandî û aborî ku aramî û geşepêdana hundirîn pêk tînin.

Rehenda civakî di rêxistina ewlekarîya niştimanî de xwe dispêre van her sê binemayên sereke:

Çawanîya girêbesta civakî ku bingeha sereke ya destûr û teşeyê pergala desthilata niştimanî pêk tîne.

Qasiya rêzdariyê di navbera çandên civakî yên niştecihên heman welatî de.

Qasiya pêgirêya bi nasnameya niştimanî ya ku asta nirxên sincî dinimîne; bi taybet ji aliyê asta têgihiştina gelêrî di netivîkirina çanda nehezkirinê de.

Loma rehenda civakî, yek ji girîngtirîn binemayên hêza nerim a her staoyekê ye. Ji aliyekî din ve têkiliyeke têgerînî li ser esasê kar û encama wî karî di navbera malbatê (weke biçûktirîn şaneya civakî) û desthilatê de ye. Mirov dikare qasiya peydabûna hedarî û kêfxweşiyê û biserketina desteyên ku li ser birêvebirina karûbarê welat disekinin û parastin ewlekarîya niştimanî dikin, weke pîvana şaristanî û hêzdarêya mejiyê civakî û têgihiştina komî bibîne33. Her wiha wê weke pîvana, bibîne. Îcar

---

[31] Ebdela Ocelan, Manifistoya Şaristaniya Demokratîk) parêznamye pêncemîn. Werger: Zaxo Şiyar. Çapa duyem 2014. Çapxaneya Azadî. R519

[32] Ebdela Ocelan. Berevaniya di ber gel de. Werger: Zaxo Şiyar. Çapa duyem 2005. Çapa yekem. Bêweşanvan.

[33] Demîrê komî yan jî bêhişîiya komî, têgiheke derûnasiyê ye ku ji hêla zaniyarê ferensî Îmêl Dorkayim ve hatiye afirandin (1858-1917) ev têgeh amaje bi helwest û baweriyên exlaqî yên hevbeş dike ku weke hêzeke yekkirina hundirîn a civakê pêk tîne...wîkîbîdiya. ferhenga azad.

pêdiviyeke domdar bi regezên demokratî û dadmendiyê heye. Her wiha pêdivî bi rêzgirtina taybetmendiyên civakên cihêreng di hemû aliyan de, bi taybet di têkiliyên ramyarî û aborî di navbera bijardeyên cihêreng û welatiyan de heye.

Ji astengî û metirsiyên ku rehenda civakî tûşî wan tê, malê ramyarî34, çanda nehezkirinê, gendelî û zordarêya desthilatê yan jî kesên berpirsiyar û yan jî yên ku di warê sûcên pilankirî de dixebitin û sedemkarên koçperiyê ne. Lê şerê derûnî ango yê taybet ku ji hêla hêzên derveyîn yan jî hêzên hundirîn ên ku dixwazin bighêjin desthilat û samanan ve pêk tên, ji mezintirîn gef û metirsiyên ku ewlekarîya niştimanî tûşî wan tê. Loma pêwîstiyeke mezin bi xurtkirina ewlekarîya hundirîn bi rêya rêxistineke ewlekarî û sivîlî û bi serpereştiya desteyên dadwerî û çavdêriyê heye; ku ev deste çavdêrêya rewşa Tenduristî, gendelî, sûcên rêxistinkirî û şerê taybet bike û şerê propokenda û weşanên nerast ên ramyarî, aborî û ji bilî wan bike û hin rêgezan ji bo danûstandina bi van propokendayan re dayîne û sizayan li xwediyê wê bibire da ku nema ev propoknda werin weşandin. Her wiha gerek e rehenda exlaqî di têkiliyên civakî de ku ev têkilî girêdayî nirxên civakî yên pak û payebilind in, xurt bike û şerê paşveçûna nirxên razberî bike, her weke paşveçûn û têkçûna destpakî, rastî, merdî, dadwerî, xêr, bexşandin û pejirandina kesên din. Her wiha pêşketina şaristanî, Pabendîya ferwera niştimanî ya exlaqî pêşberî welatîyên wê dinimîne. Ew jî bi rêya misogerkirina ajbûna welat û pêşketina wî ya giştî û mirovahî ku ev pêşketin girêdayî têgiha jiyana birûmet, mafên mirov ên madî û manewî û destwernedana di van mafan de pêk tê.

Ramyarîya hundirîn û diplomasî ya desthilat û bijardeyên cur bi cur di têkiliyên civakî de, dikarin bandoreke meizn li ser asta ewlekarîya niştimanî bikin. Pêwîstiya vê yekê bi baweriyeke niştimanî û ramyarîya bisinc heye. Jixwe em dikarin baweriyê wisa pênase bikin: Ew nirx û usûl in ku rewatiyê li reftarê microvan bar dikin. Her wiha em dikarin ramyarîê jî wisa pênase bikin: Ew çalakî û tevger in ku dixwazin pirsgirêk û dijberiyên ku di navbera mirov û komikan de di çarçoveya têkiliyên wan ên taybet û giştî de

---

[34] Pereyên ku li ser asta dewlet û hikûmetê ji bo guhertina biriyara siyasî tên dan da ku berwejewendiyên taybet werin bicihkirin.

derdikevin[35], çareser bikin. Dibe ku ev sedem be ya ku hişt hin bijardeyên ramyarîyan civakî û yan jî olî kesayta Bavê Giango ji bo neteweyê biafirînin û wî weke kesayeteke niştimanî pêşkêş bikin û çîrok û efsaneyên binirx li ser birêsin û aliyên wê yên nebaş veşêrin û wî weke rizgarkerê ku microvan ji pirsgirêkên wan rizgar dike û jiyana wan ber bi duristiyê ve dibe, pêşkêş bikin. Her wiha vî bavî her tim bi rêya peyker, wêne, bone û hizran bi bîr tînin. Em vê yekê di kesayeta Xandî li ba hindiyan û Atatork li ba tirkan dibînin û ji bilî wan bi sedan hene. Dibe ku ev yek carinan sedemeke herî mezin a zordarîyê be, bi taybet li ba dewletên neteweyî yan jî dewletên xwedî desthilateke syokratîk ango totalîtarîk. Jixwe tê zanîn ku jinavbirina jêderên tirsê li ba mirovan û misogerkirina ewlehîya wan, dihêle ku tu Pêdivîya wan ji bo parastina ewlekarîya civakî, bi Bavê Giango yê neteweyê nemîne. Em vê yekê li ba neteweyên ku demokratîk li wan heye dibînin ku ev netewe di têkiliyên xwe yên di navbera sazîyên desthilatê û welatiyan de û di navbera bijardeyên cihêreng (kesayetên olî, leşkerî, rewşanbîrî, ekademî, ramyarî, bazirganî, karker, cotkar…) de xwe naspêre tundiyê.

Rehenda Tenduristî:

Dema mirov peyva Tenduristî bi bîr tîne, dibe ku rewşa byolojîk û derûnî were hişê mirov. Hejmarek lêkolînên ku xwe spartiye vê yekê weke rehenda sereke ya ewlekarîya niştimanî hene. Lê hinan dewleta osmanî di demên hilweşîna wê de bi sansavê zilamê nexweş bi nav kir. Tenduristî yek ji binemayên geşepêdana mirovî ya sereke ye[36] û selametî bi wateya xwe ya gelemperî navoka vê rehendê pêk tîne û têkiliyeke wê ya xurt bi tevahî binema û rehendên ewlekarîya niştimanî re heye. Loma pêwîst e rehenda Tenduristî tevahî aliyên ku girêdana wan bi ewlekarîya niştimanî re heye di nav de ewlekarîya mirovahî jî bihewîne. Gerek e ev ewlekarî rast û dirust be ji ber ew jêdera ewlehî û geşbûnê ye. Bê gunam nexweşî, nerehetî, pirsgirêk...rewşeke berovajî Tenduristî û ewlehîyê pêk tînin. Li kêleka Tenduristîya laşî û derûnî ya mirovan, Tenduristîya hizrî ya civakê û Tenduristîya perwerdeyê ya nifşên ciwan, Tenduristîya giango û jîngehî,

---

[35] Dr. Fehed Mihemed Şeqiha. Ewlekariya niştumanî. Dîtineke giştî. Çapa yekem. Zanîngeha Nayîf a zanistên ewlehî. Riyad 2004. R 71-99.

[36] Mebest bi geşepêdana mirovî, pêşketin û behreyên mirovan û karîna wan e ku bi rêya wan dikare bighêje asteke bilind a hilberîna cihêreng...

çandî û hwd hene. Her wiha gelek kirîz û bobelatên ku bandoreke neyînî li ewlekarîya niştimanî dikin hene. Li kêleka wan jî gelek nexweşî û pirsgirêkên ramyarî, civakî, zordarî, desthilata giştgirî, tirsandin, tundî, tundrewî, çanda nehezkirinê, nepabendbûna bi regezên ewlehîya giştî û ji bilî wan hene. Her wiha em dikarin qirêjiyê, dîmenên nexweşik, binyada jevketî, kêmbûna rûberên şîn û kêmbûna avê weke nexweşîyên jîngehê bibînin. Hin ji nexweşîyên hizrî û perwerdehîyê jî ev in biranşên perwerdeyê yên kevnare û kêmagahî û yên ku ji hizra zanistî û pilankirî dûr...ji nexweşîyên aborî jî gendelî, malgirtin, windabûna desthilata dilawer, sûcên pilankirî, lewazîya hilberîna xwecihî û ji bilî wan in. Bê guman sedemkar û handerên van nexweşî û arîşeyan hene. Ev nexweşî li hin jîngehên guncav zêde dibin. Mirov dikare wan jîngehan weke malzaroka pîşeyî ya ku dixwaze bighêje desthilat û samanan yan jî wan garantî bike, bi nav bike; her wkî dibistan, peymangeh, perestgeh, kargeh, partî, alavên ragihandinê, malperên civakî û ji bilî wan. Her wiha jîngehên xizan, malbat, civak û komkinên derdîlkbûyî jî dihewîne. Ev tişt û piroje û rojevên dewletên ku dixwazin welat desteser bikin, ji girîngtirîn astengiyên ku rehenda Tenduristî di rêxistina ewlekarîya niştimanî de tûşî wan tê.

Pêwîstiyeke pir mezin bi peydakirina sedemkar û jêderên Tenduristiyê di her alî de heye. Bi taybet di warê malzorokên pîşeyî û xurtkirina çavdêrêya niştimanî bi rêya danîna zagon û rêbazên guncav li ser wan, bi awayekî ku ev zagon parastina regezên demokrasiyê bikin, geşepêdan, aştî û pêşketinê pêk bînin. Pir girîng e ku hin rêbazên perwerdeyê yên ku afirandin û pirojeyên avaker ên ku çandên niştimanî geş dikin werin meşandin. Her wiha gerek e dadwerî û wekhevî di erk û mafan de werin pêkanîn, li ser çanda nehezkirinê were sizakirin, zagonên parastina jîngeh û jiyana kovî û pirojeyên aborî yên cihêreng werin danîn. Gerek e pîvanên çavdêriyê li ser sedemkarên nexweşîyên laşî, derûnî û sinirî werin sepandin û lêkolînên zanistî werin geşkirin…wisa dixuye ku birêvebirina dilawer di warê binyada jêrzemîn û jorezmîn, exlaq, avahi û navendên bernameyên haydarêya Tenduristî û civakî de, bi roleke sereke di pêkanîna vê yekê de dilîze. Dawî jî rehenda Tenduristî alîgirê sereke yê rehendên civakî, aborî û berevanî ye û jêdera sereke ya geşkirina bixwebawerî û dîmografîka welatan, rizgarkirina welatiyan ji aliyê laşî û hizrî ve ji tirs, nehedarî û dudiliyê ye. Her wiha maf û rehetiya mirov a fîzyolojîk misoger dike, hestên

rêzgirtina aliyê din (kes, sazîyên desthilatî, mirovahî û çandî û beşgehên taybet) ji wî re xurt dike. Pêwîstiyeke mezin bi parastina hest û çanda mirov, berxwedana li hemberî arzûyên bijanî yên ku mirov dixe mîna lawiran, heye.

Ji aliyekî din ve rehenda Tenduristî bi têgîna xwe ya bijîşkî, rehendeke stratejîk di pergala ewlekarîya niştimanî de pêk tîne; bi taybet di rawestîna li hemberî bobelatên cur bi cur de; çimkî di dema belavbûna bobelatekê de erkê rehenda parastin û berevaniyê hildigire ser xwe. Bobelata covid19 ku bi navê coronayê tê naskirin, nimûneyeke astengiyê ya herî mezin li pêşberî ewlekarîya niştimanî ya tevahî dewletan di nav de dewletên xwedî hêza aborî, leşkerî û teknolojîk, pêk tîne. Cîhan ji destpêka sala 2020an ve ji ber vê vîrûsê Tenduristîya dikêşe. Vê vîrûsê karîbû zû belav bibe û tevgera jiyanê û çerxeya aborî ya gelek welatan rawestîne. Hiljimartin didin diyarkirin ku zêdeyî milyar kesî ketine bin biryara qedexekirina derketinê. Her wiha bi hezaran kes jiyana xwe ji dest da û nêzî melyon kesî bi vê vîrûsê ketiye. Jixwe her diçe rêjeya van hiljimartinan zêdetir dibe. Ji bo ku ev vîrûs werin fêmkirin û reftarên wan werin naskirin, pêwîstî bi xwediyê psporiyê heye. Baldariyeke cîhanî li ser vê vîrûsê heye û bi sedan teqîgeh û navendên lêkolînan ku vê vîrûsê lêkolîn dikin hene. Her wiha ev vîrûs xwedî girîngiyeke taybet e ji aliyê leşkerî ve; çimkî weke çekeke kujer di hevsengiyên tirsê li beramberî dijminan tê dîtin. Ev çek weke beşekî ji cebelxaneya bi navê çekên biyolojîk e. Sîlaha biyolojîk di her dewleteke ku dijminatiya dewleteke din dike de heye, lê pêwîst e dermanê wê jî li ba vê dewletê hebe, çimkî eger nebe dê ziyanê bighêje jêdera wê jî. Wisa dixuye ku ev vîrûs dê gelek guhertinên ramyarî, aborî, civakî û çandî li ser asta cîhanê bîne. Ango dê qonaxeke nû dest pê bike û gel ji nû ve werin kontrolkirin. Ya ku ameje bi vê yekê dike, jinûlîstekirina ejinde û pirojeyên navdewletî bi awayekî ku dikarin bandora vê vîrûsê di xizmeta ramyarîyên xwe yên girêdayî têkiliyên navneteweyî de bi kar bînin. Ev yek ji guhertinên ku li ser asta navneteweyî, herêmî û xwecihî piştî derketina Daiş 2014, bûyerên 11ê êlonê 2001, hilweşîna Yekîtiya Sovyetî 1991, şerê Cîhanê yê Duyem û hwd derketin, diyar e. Dema ku mirov dan û standina dewlet û civakan bi vê vîrûsê re dişopîne, tê xuyakirin ku hin statoyên xwecihî û navdewletî vê vîrûsê di stratejîka mijûlkirina ku bi rêya wê gel tê kontrolkirin û enerjiya dijminan tê qelskirin de bi kar tînin. Dibe ku ev yek sedema

sereke be ya ku dihêle gelek kes li ser babeta komployê ya li servê vîrûsê de tekez bikin. Ji diyardeyên herî xuya yên ku bi belavbûna vê vîrûsê re derketin ev in:

Vê vîrûsê bi rêya sekinandina karê beşgeh, kargeh û saziyan û bi rêya qedexekirina derketinê, karîbû aborêya hejmarek dewletên ku aborêya cîhanî desteser kiribûn, rawestîne. Di heman demê de tevgera bazarên cîhanî jî rawestand; çimkî tevgera kirînê ber bi heyberên xwarin û Tenduristiyê ve çû. Ev jî dibe ku bi xwe re birçîbûn û bobelatên civakî bîne.

Deverên olî yek ji navendên belavbûna vîrûsê bi awayekî dramatîkî bûn; mînak raporên nûçeyên cîhanî didin diyarkirin ku navendên olî yên îslamî, xiristiango û cihûyî bûn sedema belavbûna vîrûsê bi awayekî bilez di Îran, Îsraîl, Ferensa û ji bilî wan de. Vê jî hişt ku desthilat li hewîrdora cîhanê berê xwe bidin girtina perestgehan û rê li ber çalakiyên olî bigirin. Di encamê de niha bawerêya bi zanistê li ser hisabê olê zêdetir bûye.

Ev bobelat li ser hisabê doz û pirsgirêkên din li ser asta bû ya herî girîng. Malperên civakî û alavên ragihandinê bi nûçeyên vê vîrûsê û hiljimartinên wê dagirtî ne.

Gelek nerîn derketin holê. Ev nerîn didin diyarkirin ku dibetiya bikaranîna rêxistinên terorîst ji vê vîrûsê re weke çekekê li dijî sivîlan pêkan e; bi taybet ji hêla kesên ku bi nasnavê Gurên Bitek tên naskirin ve. Ev yek jî sîlaheke nû di bin navê Davkên Vîrûsî de derdixe holê.

Li kêleka mirovên asayî, gelek berpirsiyar li dewletên cur bi cur bi vê vîrûsê ketin di nav wan de serokên dewletan, wezîr, berlemanter, evser û ji bilî wan jî hebûn; hinan ji wan jiyana xwe ji dest da û hinên din jî di cihên gerantînîkinê de li ber xwe didin.

Vîrûsa coronayê bû mîna alavekê ji bo rawestandina raperînên gelêrî li dijî ramyarîyên zordar, paşverû û binkeftî. Her wiha kerneval û festîvalên ku li ser sata cîhanî navdar in hatin rawestandin.

Her wiha bi hezaran dîmenên din hene. Bandorên neyînî yên ku bi vê vîrûsê re hatin, rêjeya girîngiya bipêşxistina rehenda Tenduristiyê ji bo parastina ewlekarîya niştimanî diyar dike.

Rehenda Berevaniyê:

Yek ji metirsîdartir çalakiyên ku dixwazin welatekî desteser bikin an jî dagir bikin, rojevên ku hişmendî û Tenduristîya kes, welat û civakê kilît dike ye. Ev yek dihêle ku mirov li pey hizir û xwestekine sînordar bimeşe.

Cewhera armanca van ejindeyan ew e ku mirov bixin jîndarekî zombî[37] û xwedî hizreke çelexwar û ne li gorî çanda wî û dihêle ev kes bi dilgermî li pey xwesekên mazoxî yên ku bandoreke neyînî li nirx û çanda civaka wî dikin, here. Ev yek gotineke kesayeteke şofînizm tine bîra ma ku dibêje (kurdê baş, kurdê mirî ye). Di encamê de ev ejinde dixwazin statoya ku mirov tê de dijî lewaz bikin û binemaya karîna berxwedanê li beramberî gef, astengî û metirsiyên cur bi cur ên hundirîn û derveyîn lewaz û qels bikin. Jixwe encama vê yekê ew e ku mirov di nav çandeke din de were pişaftin û gencîneyeke şaristanî ku vedigere hezarên salan were jibîrkirin. Li gorî vê yekê, xweparastin li tewereya sereke ya rehenda berevaniyê û hemû aliyên wê pêk tine; çimkî rehenda berevaniyê ne tenê di çarçoveya karê leşkerî de ye, lê belê pilankirina stratejîk ya demdirêj, pilanên xweparastinê yên cihêreng ji bo geşepêdana rehenda aborî, civakî û Tenduristî jî dihewîne. Hin ji beş û aliyên ku rehenda berevaniyê wan dihewîne, ev in:

Berevaniya sivîlî ya ku li hemberî bobelat, kirîz û bobelatan radiweste û sedemkar û bandorên wê çareser dike

Berevaniya leşkerî, ya ku hevsengîya tiresê pêk tîne, hêza berevaniyê ya pêwîst çi hewayî, çi bejahî û çi jî sîbranî be bi awayekî ku bi cihê welat ê xaknîgarî, karînên wî û metirsiyên ku tûşî tê guncav be, peyda dike. Weke mînak em dibînin ku rehenda leşkerî di ewlekarîya Îsraîlê de xwe dispêre rehenda berevaniyê û çar meydanên rûbirûbê datîne pêşberî çavên xwe[38]; (Saybir ango esmana eleketronîk, derya, esiman, binerd. Ewlekarîya wê li dor berhelistin, haydankarî, berevanî û têkiliyên stratejîk bi hêzên derveyîn ên dost re dizivire. Her wiha hewil dide ku nehêle kûrahiya stratejîk eniya hundirîn bibe meydana şerê navnedî. Ji aliyekî din ve dûrxistina sazîyên leşkerî û dezgehên saloxgerî ji desthilata ramyarî, dê ewlekarîya niştimanî xurt bike. Di demanên aştiyê de gerek e zagona rewşên awarte werin rawestandin da ku ev dezge û sazîyên leşkerî nebin çîneke dagirker û desthilatdar û regezên demokratiyê biçewisîne.

[37] Zombî, ew termê biliv e yê ku bi bandora rêbazên sihrê ji hêla hin sahiran ve dilive yan jî şaşiyek di mejî de çêbûye. Lê ev têgeh bêtir ji kesê ne li ser hişê xwe re tê gotin. Koka vê peyvê vedigere çanda gelêrî ya afrîqî ya kevin, bi taybet di nav civakên Neycir, Konxo û başûrê Efrîîqayê. Ev têgeh jêdera afirandina gelek fîlim dîstopiyayan bû...

[38] Şaûl Şayî û Elîks Mîntis. Têgeheke sererastkirî ji ewlekariya neteweyî ya îsraîlî re. Pêkhate, enî û diyarker. Werger ji Îbrî Selîm Selame. Weşan Saziya Lêkolînên Filestînî.

Ewlekarîya agahiyan a ku li beramberî şerê taybet û propogendayan, çalakiyên sîxuriyê û çalakiyên sûcên pilankirî radiweste. Di heman demê de gefên derveyîn û têkiliyên navneteweyî û herêmî yên ku dibe bi awayekî dramatîkî bi pêş bikevin û gefan li ser ewlekarîya niştimanî bixwe, dişopîne. Her wiha mafê mulkiyetê, agahiyên giştî, kesayetî û taybet û nirxên exlaqî diparêze û mirov jî ji êrîşên giango, îdyolojîk û çandî yûn qirêj, çewsîner û xapînok diparêze.

Ewlekarîya çavdêriyê ya ku hevgirtina niştimanî diparêze û pêşveçûna rehendên aborî, civakî û Tenduristî bi awayekî baş dişopîne. Pêwîst e ewlekarîya çavdêriyê xwe bispêre rastî û zelalî, peyrewîya nasnameya niştimanî û pabnediya bi girêbesta civakî ya niştimanî. Her wiha gerek e rê li ber her tiştên ku ol, aborî, zanî, perwerde, ragihandin, rêxistin, çand, desteyên zagonsaz, dadwerî û cîbicîkar ji bo xizmeta kesayetî yan jî hêzine ramyarîyên hundirîn yan jî derveyîn bi kar tîne, bigire. Her wiha parastina kesan ji malgirtiyên ragihandin û agahiyan dikeve ser milê ewlekarîya çavdêriyê. Di heman demê de gerek e bêkariyê kêm bike, mirovan ji qirêjî û kêmbûna şînatiyê û qirêjiya hewayî, bobelat û nexweşiyan biparêze.

Eger bijarde, berpirsiyar û kesên ku di warê rêxistina ewlekarîya niştimanî de kar dikin nikaribin wê sererast bikin, aloziyên netirsîdar dê derkevin û dibe ku bibin bobelat. Ev jî dê bihêle niştecih bi awayekî hestîrî li rizgarkerekî bigerin û ev jî dê derfetê bide hest û xwesetekên nexweş û feşartî. Di encamê de deng dê bilind bibin, hevtewankirin were belavkirin û dibe ku her yek li gorî xwestek xwe, nerînên xwe ji bo birêvebirina welat û civakê bisepîne û ew kesên ku em dikarin navê şaneyên veşartî li wan bikin ku pirsgirêkên wan ên îdyolojîk bi ramyarî tea hukûmetê re heye û kesên sûckar, dijminên exlaqan, kesayetên nexweşîyên derûnî bi wan re hene û sîxurên hêzên dijmin bibin alavên hilweşandina welat. ji aliyekî din ve komikên olî û yên ku hatine îdyolojîkirin berê kesayeta rizgarker li ba wan heye. Her wiha hin dê alîkariyê ji hêzên derveyîn bixwazin. Ev tev jî dê bihêlin welat li hemberî du bijarteyan bimîne; şerên navxweyî yan jî êrîşa derveyîn. Ya ku dê bêtir vî şerî gur bike, jihevketina girêbesta civakî û xwesipartina li tundiyê ji dêvela diplomasiyê. Eger ev alî xwe bispêrin tundiyê dibe ku aliyê gelek rêbazên tirsandinê li cem hebin bi ser bikeve. Di encamê de hevsengîya xêr û şerê, ewlehî û tirsê tevlîhev bibe. Loma berpirsiyariyeke mezin dikeve ser milê bijardeyên niştimanî yûn ku bi karê

sererastkirikna niştimanî radibin, da ku ku welat ber bi şerekî navxweyî ve neçe. Loma di warê xweparastinê de, parastina nirxên exlaqî, niştimanî, maf, azadî û jinavbirina her tiştê ku gefan li rehendên ewlekarîya niştimanî dixwin, ji girîngtirîn binemayên rehenda berevaniyê ne û carinan misogerîya sereke ji bo berdewamiya jiyana welat, pêk tîne.

Ramangerê navneteweyî Ebdela Ocelan wisa dibîne:

‘’jixwe eger xweparastina xurt nebe, cûreyekî wisa nerm weke mirov û statoyeke wisa li ser metirsiyan vekirî weke civaka wî, dê nikaribe hebûna xwe demeke dirêj biparêze. Berevanî li cem mirovan bi qasî ku civakî ye, ew qasî byolojî ye jî. Berevaniya byolojîk ji hêla xerîzeyên xweparastinê yên ku li ba her jîndarekî hene, kar dike. Lê di berevaniya civakî de her kes di wê civakê yan jî komikê de xwe bi awayekî hevbeş diparêzin. Li gorî derfetên xweparastinê guhertin bi awayekî domdar di hejmara komikê û teşeyên birêxistina wê de çêdibe. Di encamê de berevanî peywireke esîl e di civakê de û tu caran civak bê wê nikare berdewam bike...’’

(Ebdela Ocelan, Manifistoya Şaristaniya Demokratîk) parêznamye pêncemîn. Werger: Zaxo Şiyar. Çapa duyem 2014. Çapxaneya Azadî. R. 538)

Pêwîstiya aliyên sereke yên ku rehenda berevaniyê wan dihewîne, bi komek dest, sazî û dezgehên karîgerî heye ku di wan de rastî di agahî û nûçeyên girêdayî ewlekarîya niştimanî de hebe. Di heman demê de pabendî zagon û birêya ran be ku ev zagon û biryar li gorî bendên girêbesta civakî û destûra niştimanî bin û ji hêla desteyên zagonsaz, dadwerî û cîbicîkar derketibin. Ji van deste, sazî û dezgehan, desteyên girêdayî danûstandina bi rewşên awarte re ku danûstandinê bi bobelatên xwezayî û bobelatan re dike û encam û bandorên wê çareser dike. Her wiha navendên riwanî, hiljimartin û rapirsînan, navendên lêkolînên zanistî, civakî, aborî, ramyarî, ewlekarî, leşkerî û hwd, tîmên Tenduristî, hewarhatinê, nexweşxane, tîmên çekszkirina avahiyên rajeyî û jêrzemînê, tîmên paqijkirinê, dezgehên şopandina asta perwerdeyê, heyberên xwarinê, hilberîn û avahiyên Tenduristî, laşî, derûnî, sinirî û ji bilî wan, alavên ragihandinê. Her wiha navendên ewlekarîya agahiyên saloxgerên niştimanî, dezgehên ewlekarîya sûckarî, ewlekarîya çûn û hatinê, û ewlekarîya sînoran jî hene. Ji bilî wan bi hezaran dezgeh û sazî hene. Gerek e ve dezgeh û sazî xwe pispêrin setratejîkên berevaniya rewa û dûrî

hemû rojevên ku gefan li ewlekarîya niştimanî yan jî ewlekarîya hin gelên dost an jî bê alî dixwin be. Her wiha gerek e rehenda berevaniyê keda ku di warê xurtkirina berevaniyê li hemberî aliyên hizirî yên ku bandorê li hedarêya welat dikin,hilweşînê bi ser de tînin û bandorê li ewlehîya wê ya şaristanî dikin, berpirsiyar be. Ango gerek e parastina çandî û şaristanî pêk bîne; çimkî di serdema nûjen de şaristaniya welat, çanda wê û pirojeyên wê ji bo stratejîka pirojeyên desteserî û dagirkeriyê re bûne armanc. Her weiha gerek e pêdiviyên niştimanî yên stratejîk yên welat peyda bike, her weke peydakirina pîşeya stratejîk a leşkerî, teknelojîka agahiyan û alavên xizmetguzarêya giştî. Her wiha gerek e piştgirêya navendên lêkolînan yên cihêreng bike.

Mirov dikare bêtir xwe di têgiha ewlekarîya niştimanî de kûr bike lê astengiya mezin di pêkanîna piratîkî û mekanîzmeyên ku ji bo pêşveçûna pergala ewlekarîya niştimanî ya baş de ye. Ji bo vê yekê pêwîstî bi vîn û birêvebirineke tekûz û baş heye. Dibe ku desteyên zagonsaz û dadwerî berpirsiyarêya çeksazkirina ewlekarîya niştimanî bigirin ser milê xwe lê pêwîstî bi komîteyek an jî desteyeke hilbijartî heye ku serpereştiya pergala ewlekarîya niştimanî bike. Mirov dikare navê wê desteyê -weke mînak- bike Encumana ewlekarîya niştimanî. Mirov dikare desthilatên wê jî bike mîna desthilatên dadgeha destûrî ya bilind. Ev deste dikare bi van karan rabe; mekanîzmeyên şopandin, çavdêrî û berpirsiyariyê dayne, stratejîyên guncav piştî lêkolînkirin û analîzkirina jêderên gef, metirsî û Tenduristîya, pêşinyar bike, nerînan li serpirojeyên rêkeftin û hevpeymanên girêdayî ewlekarîya niştimanî de berî biryardanê, bide. Jixwe ji bo ku ev deste yan jî komîte karibe bi vî erkî rabe, gerek e xwedî pisporî be û desthilata wê ya manewî hebe da ku karibe şopandin, çavdêrî û berpirsiyariyê bike û karibe stratejiyan li serkarê desteyên zagonsaz, dadwerî û cîbicîkar de bide.